# ÎLHAMÎ SÎDAR

# TEHMA XWELIYÊ

# ROMAN

Kesên li ser riya xwe radiwestin em in
Kesên perdan li hember xwe radikin em in
***Hafizê Şîrazî***

I

Min xwe ji kabuseke tarî çawa xilas kir?
Kabuseke di gewriya min de wekî gurmisteki rûniştî, her diçe rehên min ziwa dike, laşê min ditevizîne, xwîn ji damarên min vedikêşîne…
Bes dilopên sar di qelîştekên devê min de, ji xwe re çi rê ditin û min çawa tehma xwê tehmijand?
Wek şûşeyeke di xûmexûma pêlan de diçeliqe, asê me.
Kê ev kirasê dojehî li min kir?
Kê ez avetim ser rûyê vê erdê, li ser dilê Kabîl çikandim?
Kîjan kevirî hildim, çavên kûjer xwe didin der.
Wateya matmayîna min a ku nola daristaneke tarî li ser min diqelibe çi ye gelo?
Xwedêyo, ezê careke din bikaribim li xewnên xwe yên aram vegerim?
Ev giraniya ku wekî tariyeke bê binî li ser singê min rûniştiye, wê kengê dest ji min vekêşe?
Xwedêyo!
Ev kambaxa rûhê min ku veguhesiye dojehekê, li benda çi ye?
Kefareta çi bi min dide kişandin?
Ewqas êşên giran, ewqas hilweşîn û rûxîn…
Off, ev çi pilepil e di ber xwe re dikim?
Ev rêwîtiya dijwar a ber bi çiyayên Kurdistanê ve hildikişe, bi hovîtiya sirûştî û xwezahiya xwe dibe ku min ji hiş biribe?

Ev du roj bûn ku em ji Çemê Ferêt derbas bûbûn. Di navbera Meyafarqîn û Hezo, di rêyeke asê de rêwîtiya me berdewam dikir. Rêzeçiyayên ku her diçû rêwîtiya me dijwartir dikir û ber bi rojhilat ve berfireh û belav dibû, di navbera Osmanî û Safewiyan de wekî sûrheke xwezahî teşe girtibû. Ev der, welatê Kurdan bû û bi rastî jî tebîeteke wê ya pir dijwar hebû.
Rêwîtiya ku bi coş û kelecaneke mezin destpê kiribû, her diçû vediguhêziya ber bi rêya ezebê ve. Bi tevahî deh roj bûn ku em ji Konstantîniyeyê derketibûn. Wisa dixûya ku wê sermaya kambax, ji her gavê bêtir zora me bibira. Di gelek cihan de lat

û zinarên asê, tevî kendalên kûr ên xofdar, bi me wisa dida hîskirin ku bobelatek tim li pey şopa me ye.
Min tu caran bîra vê yekê nedibir ku ezê rojekê bi tebîeteke wisa hov re rû bi rû bimama.

Dibe ku macerayeke wisa bi xeter, ji bo esîlzadeyekî wekî min ku hijdeh salên temenê xwe di nav dewşek û nivînên nerm û çarşefên hevrîşimî de derbas kiribe, wek dinîtiyek be. Bi rastî min bixwe jî nizanibû ku ev rê ber bi ku ve diçe, çi li bendî min e, gelo wê hêviyên min bi ser biketana an wê têk biçûna? Li dewsa koçkeke li qeraxa deryaya lacîwerdî û bexçeyên bihuştî, rûhê xwe bi arezûyan têrtije kirin de, ber bi valahiyeke nependî ve çûyin, di bîreke Ûsivî de werbûn çi tiştekî ecêb e!
Ev ji sirgunkirina xwe yên xewnên şêrin û di pençe kabûsekê de perpitîn, di remla kîjan remilvanî de vuzuh dibîne?
Nizanim, nizanim…
Û tevî nezanînên min, tariya ku ez qefaltime her diçe tîrtir dibe.
Jiyan di asahiya xwe de diherike, her tişt di rêya xwe re diçe, her tevger xwe dubare dike. Ji derve, ez ez im, ez bixwe me, lê ji hûndir ve, bagera ku min di hinavê xwe de digindirîne, di nav toz û dûmanekê de min difetisîne.

Xwedêyo çiqas çivîk mirine!

Kabusên min ên di nav mij û xumamekî de xwe didan der, her şev bi hişyariyekê, di guhên min de dikir qêrin, "Ez tu me, ez tu me!" Ev dubarekirin gava di giyana min de olan dida û pêde pêde min ber bi şêtiyekê ve kaş dikir, êdî tu rê ji min re ne dihişt û min nema debar dikir. Ponijînên ku di mejiyê min de li ser hev siwar dibûn, mecbûr diman ku di şikefteke teng de ji xwe re rêyekê hilbijêrin.
Çawa ku rûhê min rewşa tê de ye red bike, xwezaya kakilê giyana min jî, wekî ne aidê rûhê min be, weke biyanî…

Di navbera min û malbata min, xizmên min, dostên min û di derdora min de, her diçû diwarekî sitûr bilind dibû; di jiyana min de her tişt, her tişt kiras vediguhert û dest û piyên min girêdayî… Kendala ku min xwe hişk pê ve girtibû, her diçû min ber bi kûrahiya xwe ve dikişand û min ji her tiştî dûr dixist. Tiştekî diyar bû, êdî ez biyaniyek bûm, ji hawirdorê xwe re biyanî, ji gerdûnê re biyanî, ji xwe re biyanî…

Rojek ji rojên bi vî rengî tevlihev ê di wê bexçeyê bihûştî de, di nav belgên payîza çilmisî de, bi dileki aram ber bi cihaneke helbestane ve diçûm de, nêzhevaleki bavê min, nedîm û rêhevalê meclisên cenabê Sultan Selim Xan, Mewlana El Hekim İdrîsê Bedlisî, bi xuşina cizmên xwe yên di nav belgan de olan dida, li hember min xuya kir. Çi got û çi bi min kir û min çawa rûhê xwe yê nazik radestî peyvên wî kir, nizanim. Tiştê dizanim, ev rêya ezabê ku li ber min vebibû, bi wan peyvan pêk hatibû; nexwe tu qewet nikaribû min ji Konstantiniyeyê bilebitanda. Tiştên wisa xweş digot, wisa xweş li hev diani…

Qala şêxê xwe dikir, qala fezîletên wî, hikmetên wî; qala bedewî û şêrîniya av û hewaya Bedlisê…
Bi vî awayî rêyek li ber min vedibû.

Dibe ku ji bo min a pêwîst ev bû, her wekî tê gotin, di tebdîlê hewayê de keramet hebû. Bi destûra malbata xwe, di demekê kurt de bi tekûzî amade bûbûm. Di nav kembera min de nameya cenabê Îdrîsê Bedlîsî, ligel maiyeta xwe, bi rêya ku min wasilê menzîlê bike ketibûm.

Her tişt berê salekê qewimî. Ciwanekî ter û taze bûm, rih û simbêlên min teze xwê didan.  Di medresa herî bijarte de, mamosteyên serkefti, hevalên jîr û zîrek, kirasên bedew û lihevhatî, di sifra min de çêjên dewlemend, rûhê min geş û dilê min şa… Jiyaneke têra xwe bi kêf û coş...

Belê, her tişt berê salekê qewimî. Mirina kurê mamosteyê min, tesireke mezin li min kiribû. Em şagirtên Xoce Mewlana Celaleddîn bi bihistina vê mirina bêwext re, gelek xemgîn bûbûn, gelek li ber mamosteyê xwe ketibûn. Me ji xwe ji xwe re digot, gelo canê însanekî, ji ber êşeke wisa giran çawa dikare debar bike, me digot û me heyfa xwe pê dianî. Piştî demeke kurt, em li hev civiyan û ji bo sersaxiyê bi rê ketin; em nêzî malê bûn ku dengê nalenalan bi erşê ala diket; dayika reben kiras li xwe diçirand, gilî û gazinên xwe li bayê felekê dikir, tu teselî rûhê wê ya tevlihev aş nedikir.

Dîmenên ku di nav aloziya gazin û hewaran de derdiket holê, bi tu awayî nedihat sêwirandin. Dayika reben ji girinê çavkaniya rondikan miçiqandibû, lê tevî vê yekê mamosteyê me yê qedirbilind çawa tevbigere baş e? Ji xwe ê ku me jê dipa di nav giri û nalînan de, di nav ax û fîxanan de ji hiş çûbe… Lê teww… Qene dilopên rondikan jî ji çavan nedihat xwarê, dev ji dilopên rondikan berdin, hema tu şopên xemgîniyê jî, di rûyê wî de nedihat xûyakirin; em li hember vê dîmenê matmayî man. Hişê me tênedigihîşt, diviya wateyekê vê hebûya.

Di vê matmayînê de, me li dor mamosteyê xwe çok veda û jê pirsî, “Qisûreki me hebe bibexşîne û ji kerema xwe rêyek nîşanî me bide.” Me got, “Me cenabê te, wekî rêberê xwe, wekî parêzgerê xwe didît, me hêviya xwe tim bi te ve girê dida; me digot roja em bimirin, wê yekî ku li pey me bigirî hebe, ew jî mamosteyê me ye, roja mehşerê yekî ku li me bê şefaetê hebe, ew jî mamosteyê me ye, lê mixabin di vê rewşa hanê de cenabê te em di matmayîneke ecêb û seyr de hiştin; em qet tênagihîjin ku di rojeke wiha de ne dilopek hêsir û ne jî şopeke xemgîniyê… Ji bo Xwedê, tê vê rewşê çawa şîrove bikî? Ne tu bûyî ku tim qala dara di dilan de hatiye çikandin dikir, ne ew kulilk bûn ku ji wê darê dipişkivîn, cenabê te bi me dida bêhnkirin. Çawa dibe ku îro ji bo kurê xwe yê tekane, herkes feryad û fîxanê bike û tu wisa bêdeng bimînî, ji bo Xwedê, aqilê me tênagihîje, ji kerema xwe vê yekê ji me re rave bike.

Dîyar bû ku mamoste ji van gazincan pir aciz bibû, kesereke kûr kişand û awirên xwe yeko yeko li ser me gerand, bi bişirîneke xemgîn; “Hûn bi rastî jî bi mirinê, bi

merhametê têdigîhêjin gelo?" got û awirên xwe ber bi valahiyekê ve ajot, bi bişirîneke tehl ji xwe çû, kedereke kûr di rûyê wî de xwe da der, "Hûn min yekî wekî ku merhemeta wî tuneye, şefqeta wî tuneye dizanin, yekî wekî dilkevir dizanin, çi heyf!" got û berdewam kir, "Nexwe wisa? Nexwe hûn jî, rondikên çavan ji bo dilsotinê, ji bo merhemetê wek delîlekê dibînin, çi heyf, çi heyf!"

Ev gotinên wî, wek şiqaman di rûyê me de diteqiyan û me di ber xwe re dikir pilepil, me dixwest erd biqelişiya û em tê re biçûna xwarê. "Vêga baş li min guhdarî bikin, baş guhdarî bikin ku belki tiştên ez bibêjim derbarê raza jiyanê de di mêjiyê we de çirûskek vede, belkî derbarê heqiqetê de, di rûhê we de deriyek vebe:"
"Mehbûb divê mirî, divê zindî, ji ber çavê dil tu caran winda nabe, wekî ku çend canê mirov de sir hebe, di navbera me de jî rêyeki ku kes nizanibe he ye. Ji we kiri ew ji min dûr e, na, na! Ew qet ji min ne dûr e, berevajî vê demek tenê tune ye ku ez wî nebinim, ew tim li ber çavê min e, canê min, rûhê min tim ligel wî ye. Vêga kurê min ê xoşevîst ku tim li ber çavê min be, ezê çawa rondikan ji çavan bibarînim, çawa wek jinan rûyê xwe veçirînim. Belê ew vêga çû qata ecelê, lê her bi min re ye, ligel min e. Vê baş bizanibin, girî ji elemê tê, ji veqetînê tê, lê belê ez bi kurê xwe re yek beden im, yek can im, herkes wî di xewna xwe de dibîne, lê ez eşkere wî li dora xwe dibînim.
Bi her peyveki wî, ezber kirinên min ên der barê jiyanê de, wek darên pûç hildiweşiyan.

Ji min kirî min sirra jiyanê kifş kiribû, lê vê gavê baş têgihiştim ku di nav gerdûna tê de dijiyam bes ne dilopek jî bûm. Divê ez bibûma dilopek, şûn de min goşt û hestî bigirta, bikemiliyama û hêdî hêdî ber bi zanistiyê ve biçûma. Û bi vê lezê di nav pirtûkan de winda bûm, bi hewldanên awarte li dûv heqiqetê ketim. Mixabin min tu şopên zanistiyê bi dest nexistin û tu çirûskên ronahiyê bi destê min neketin ku xwe ji tariyê xilas bikim.
Dû re ew kabusên ku xewnên min derdest kirin…
Êdî pêngaveke min di vê alemê de, pêngaveke min jî di alema xeybê de, her perçeyekî min ber bi aliyekî ve belav bûbûn.
Diviya perçeyên xwe yên belavbûyî berhev bikim.
Diviya bi kakilên xwe, xwe ji nû ve ava bikim.

## II

Gava bi xilmaşiyekê ji konê xwe derketim û çavê min bi ronahiyeke qels ket, li xwe werqilîm û hêdî hêdî bi ser xwe ve hatim. Sermayeke dijwar hebû, tevî kincên min ên hirî hema mabû ku biricifim. Piştî demekê me dest bi haziriyê kir ku em rêwîtiya xwe bidomînin, lê tam di wê kêliyê dei li dor qempê aloziyek derket. Ji nişka ve xofek avête dilê min, lewra hêja li Konstantiniyeyê çavê me bi çîrokên ji ber eşqiyayên Kurdên rêya rêwiyan diqefêlin û wan dişelînin re ewqas tirsandibûn ku, min di dilê xwe de got, teqez ev ew eşqiya ne û bi ser me de girtin. Di wê navê de bi bayê bezê ji konê derketim. Qelebalixeke ji jin û mêran pêkhatî li dor qempê civiyabûn, min baş

raçav kir ku ev ne eşqiya, lê gundiyê ji rêzê ne, tiştê xwarinê difirotin. Me ji wan şîr, hingiv û fistiqên li Kurdistanê pir çêdibûn sitandin. Ev gundiyên reben ên belengaz ku li gundê dora van çiyayan dijiyan, Xwedê dizane di vê serma û seqemê de çend saet çavdêriya karwaneki dikirin ku ji bo çend qiruşan bi dest bixin, bi çi zehmetî didan rê, di çend saetan de dihatin van deran û piştî firotina çend tiştan dîsa lêdixistin û ber bi mala xwe ve diçûn!
Me pirsa eşqiyayan ji wan kir, gotin xurafe ye, bazirganê Ereb û Faris ji tirsa canên xwe, ji ber xwe van çîrokan afirandine.
Sultan Selim Xan rêvebirina Kurdistanê dabû destê mîr û began. Bi vî awayî dixwest li hember Safewiyan piştevaniya Kurdan bidest bixe, ji xwe imparatoriya me ya mezin her diçû ber bi rojava ve berfireh dibû, tevî vê Şah İsmail jî li Rojhilat hêza xwe xurt dikir û her diçû ji bo imparatoriyê dibû xetereyek. Ji ber vê, sultanê me zehf qedrê Kurdan digirt; ji xwe cenabê Îdrisê Bedlîsî jî loma şêwirmendê wî yê herî taybet bû, di siyaseta xwe de roleke giring dabûyê, bi saya wî di navbera imparotorî û mîr û begên Kurdan de tekiliyên xurt hatibûn avakirin. Herçî sultanê me bû, bi alîkariya Kurdan, hêj beri du salan di şerê Çaldiranê de van deran ji Qizilbaşan paqij kiribû, di şerê mezin de Şah Îsmaîl, artêşa xwe ya mezin dabû dû xwe û ber bi Tebrizê ve vekişiyabû. Ew şahê şûr simbêlê wî nedibirî, tevî panzdeh-bîst hezar leşkerên xwe, berê xwe bi reverev dabû Berguzinê. Ligel vê têkçûna giran, dîsa jî tesîreke xwe ya mezin li ser Qizilbaşan hebû, ne tenê di nav Îranê de, di nav imparatoriya me de jî aligirên **wî** gelek zêde bûn. Lewma di demeke maqûl de bi hêsanî dikaribû arteşeke mezin berhev bike. Sultanê me, vê yekê ji çavan dûr nedixist. Dibe ku piştî demekê berê xwe bida ber bi rojava ve, wê çaxê gerek li pişt xwe ewle bûya, lewma pêwîstiya wî bi Kurdan hebû.
Dem wek hebên xîze-saetê diherikî, lê rêya ku me her gavekî wê bi hezar zehmetî diajot, rê nedida ku em bes gavekî jî bi hêsani biavêjin. Hate em nêzîkî Bedlîsê bibûna kêm-zêde wê rojekî me yê din di nav van lat û zinaran de bibihûriya. Rêya niha em jê derbas dibûn, ji aliyekî bi robarekî kûr û ji aliyeki ve jî bi çiyayekî bilind hatibû dorpêçkirin. Di hinek cihan de, rê bi zinarên qirase re wisa hatibû asêkirin ku hema dima em û hêstirên xwe bi kendalê kûr ve bigindirin. Li hin cihan gihaştina menzîlê êdî wek serabekê bi me dihat; bi rastî di wan deman de min pir bêriya Konstantiniyeyê, nav nivînên xwe yên germ dikir. Vêga berfa ku wek tebeqeyeke tenik direjî dida xwe, li dûrahiyê kom bi kom rêz dibû, nola cinawirekî devê xwe vekiribe û li hêviya daqurtandina me be dixwiya.
Nizanim, lê bi vî teşeyî sêwirandina sipiyê êş dide!
Ez hêja jî heyirî diminim ku, ew sipiyê xweşik û dilbijok çawa xwe wisa bi rengê mirinê dida der.
Tavilê zivistan li vir sermaya xwe bi rengeki hovane li ber me raxistibû; berf li vir wekî felaketekê bû, mixabin tu teselî di sipiyê de tunebû, berevajî sipî xofeke mezin dida…
Roj gelek kurt bûbûn, tarî hêdî hêdî diket erdê. Diviya bêtir nebe dereng cihek ji bo qempê bihata hilbijartin, piştî demekê, me cihekî guncav peyda kir û konê xwe li wir girê da. Cihê ku me hilbijartibû nêzîkî gundekî bû, lewma cihekî ewle bû. Lê bi şevê re, ba û bahozeke wisa dijwar destpê kir ku, benê ku konê me pê hatibû girêdan, ji ber şida bagerê sist dibû, bayekî wisa sar hundir dagir dikir ku êdî tu tişt me ji

sermayê nediparast. Betaniya ku me xwe pê hişk rapêçabû, bi kêrî tu tiştî nedihat. Xwedêyo çi bobelatek bû, berf û pûk lezê dabû xwe, wisa wisa me fêm dikir ku divê yekser em xwe biavêjin bextê gundiyan, diviya gundî me li mala xwe bihewînin, nexwe emê tevde ji sermayê biqerisiyana. Xwedêgiravî gundî me wekî mêvanê Xwedê qebûl kirin û hewandin. Mala ku me serê xwe xistibûyê de jin û mêr kom û kuflet tev ji bo xizmeta me bikin, diqilqilîn, ji bo me agir gur dikirin, heta ji destê wan dihat mêvanperweriyeke baş nîşan didan.

Dotira rojê şeveqê zû em bi rê ketin, me çiyayekî mişt bi berfê rapêçayî derbas kir, tu tişt wekî ku me hêvî dikir nediçû; wisa dixwiya ku emê gelek biewiqiyana, êdî her gav wekî êşkenceyekî dihat, her gav baweriya me qelstir dikir. Berf heta çokê dihat û heta Bedlisê wê wisa bidomiya, ev rewşa hanê xofê dixiste dilê me. Helbuki mesafeyeke pir hindik mabû, lê rêya bi rojan me li pey xwe hiştibû, hêviya me ewqas şikestibû ku, êdî tu baweriya ku em bi silametî bigihêjine Bedlisê bi me re nemabû, tevî vê tu taqeta me ji nemabû. Diviya cîhek hebûya ku me xwe biavêtayê. Di vê navberê de me di berfa heta dihate çokê de, bi hezar zehmet û meşeqqetî rê distand. Demek şûn de dûmaneke tenik ber bi çavê me ket, Xwedêyo em pê çi kêfxweş bûbûn! Piştre pêl bi pêl… Me hema lezê da xwe û di demeke kurt de em gihîştin gund. Gundeki nêzî çar sed malan bû, komek gundî em pêşwazî kirin, di nav wan de yekî bi diruvê xwe yê xirpanî û bi temenê xwe yê navsere, ji halê me fêm kir û hat gihîşt hewara me. Got, ez dikarim we bibim qesra Esma Xatûnê, li qesrê wekî mêvanekî Xwedê, ê baş li we xwedî derkevin. Şûn de em hîn bûn ku, Esma Xatûn xwediyê vî gundî û ê şeş gundên din e. Me pêşniyara vî camêrî bi dilxweşî pejirand, piştre em li pey ketin û ber bi qesrê ve çûn. Li dergeha mezin kehyayê qesrê, pêşwaziya me kir û ji bo agahî bide xwediyên qesrê destûr ji me xwest. Em demek li bendê man, zehf neçû kehya bi telaşekê hat û em derbasî qesrê kirin. Xwedêyo, ev der bi rastî jî wekî serayekê dixwiya, çi mezin û çi bi ihtîşam! Xwediyên malê li hember me pir nazik tevgeriyan. Tiştên li ser mêwanperweriya Kurdan de hatibû gotin di vê rêwitiyê de xwe pir caran nîşanî me dabû. Birayê Esma Xatûnê, pêşwaziya me li ser dirêncekan kir û piştre em derbasî jorê kirin. Qesr ji du tebeqeyan pêk dihat, oda mêvanan li qata jorê bû. Mêrê Esma Xatûnê ji bo peywirekê bi cîh bîne çûbû Diyarbekirê, hizura Biyikli Mehmet Paşa. Xwediyên malê em gelek xweş ezimandin û şûn de jî wan em derbasî odeya mevanan kirin. Piştî demekê ku me westa xwe danî, vê carê jî, ji bo xwarinê bangî me kirin. Sifreyeke dewlemend ji bo me hatibû amadekirin: Nanê mezin û sipî ê têr pijandî bi tehmeke resen, keşalok, menestre û xwarinên goşt û wekî din… Du re wan em derbasî odeyeke mezin kirin: Xaliçeyên hevrişîmî çavê mirovan diqemişandin; li kêleka pacan diwanên bi newresimên hevrîşimî raxistî, li erdê dewşekên rengareng û balgifên neqişkirî odê ji çar alî ve rapêçabûn. Her tişt çiqas bi fesal û çiqas lihevhatî bû! Li dîwaran xaliçeyên hevrîşimî bi desenên xwe yên resen balê dikişandin, lewheyên çînî bi xêzên zêrin neqişkirî, bi navê Xwedê û Muhemmed hatibûn kolandin, postên nava wan bi kayê hatibû tijekirin diyar bû ku xenimeta nêçirekê bûn; di nivê odê de menqeleke qerase bi firehiya xwe nêzî çar, bi dirêjahiya xwe jî heşt bihûst dixwiya, heta zik bi pizotên agirê sor dagirkirî… Wisa xwiya dikir ku, zivistan qet berê xwe nedabû vê derê. Bi

rastî tiştên li wê qesrê me ditin,  gotegota ku, Kurd pir mereqdarê şecaet û ihtişamê ne, dida peyîtandin.

Evdal Begê birayê Esma Xatûnê camêrekî mevanperwer û însanekî xweşsohbet bû, lewma ji dilê min nehat ku nasnama xwe jê veşerim, ji xwe çawa min behsa cenabê Mewlana Îdrîsê Bedlîsî û qala nameya wî kir, çirûsk ji çavên wî pengizîn. Vê yekê jî nîşanî min dabû ku li welatê Kurdan qedrê Îdrîsê Bedlîsî gelek dihate girtin.
Ode bi pêlên ji menqelê perde perde radibû, dagir bûbû û em li ber germahiyeke xweş sist bûbûn, mest bûbûn; çaya ji semawera  li ser menqelê dikeliya dihat ber me, hinava me germ dikir. Me ji aliyekî ve çaya xwe dadiqurtand, ji aliyê din ve jî sihbeta xwe geş dikir. Ji xwe Evdal Begê ku navê Îdrîsê Bedlîsî bihistibû, carek nedixwest dev ji min berde û ez rebenê xwede jî, ji westabûnê hema mabû biketama û di xew re biçûma, lê çi ji destê min dihat!
“Gelo nedimê Sultan Selim Xan, cenabê Îdrîsê Bedlîsî di çi halî de ye, sihheta wî baş e inşellah? “
Carna bi Tirkî diaxivîm pê re, carna jî bi Erebî, lê wî di cih de li Farisî vedigerand, nizanim ji ber çi, lê herhal di meclisa xwe de ji bilî Kurdî, tenê bi Farisî diaxivîn.
“Cenabê Îdrîsê Bedlîsî bi amadekirina tezkireyeke derbarê tarixê al-i Osman re mijûl e. Ji xwe wekî hûn jî dizanin Hezret berê jî, ji bo hikûmdarê Aqqoyiniyan katibtî kiribû, di vî wari de gelek xwedî tecrube ye. Piştî ku intisabê serayê kir, ji bo pesindanê siltan, zimanê xwe serbest berda û ji bo wê qesîdeyên giranbiha rêz kir, niha jî li ser jînenîgeriya heşt padişahên Osmaniyan de pirtûkeke bi nave ‘Heşt Behişt‘ amade dike.”
“Hezret ji bo Kurdan xizmeteke baş kir, heke ne ew mîr û begên me ji bo piştevaniya Sultan Selim Xan qane bikira, Xwedê dizane vê gavê di bin desthiladariya Qizilbaşan de emê di çi rewşeke dijwar de bûna!”
Gava Evdal Beg van nêrinên xwe bilêv dikir, di peyva “Qizilbaş”de tingîniyeke hişk xwe dida der. Di texmina min de ev yek ji rikeberiya di navbera sinnî û şiayan de didomiya pêk dihat. Dibe ku ji ber rika Sefewiyan be jî. Şah Îsmaîlê ku li hember Kurdan qet dirist tevnegeriyabû, dibe ku sedema vê rikê bûya, Xwedê dizane!
Off, Xwedêyo! Ev çi tiştê tewşo mewşo, çi tiştê serêşi ne! Ji bo Xwedê, Evdal Beg demek berê gotinên xwe xilas bikira û ez jî, ji xwe re bi xeweka şêrin biketama…
“Aha li vira Ustacluluyê bênamûs, li hemû Kurdan xwîn dida vereşandin, min digot û hişyar dikir, li van Qizilbaşan ewle nebin, lê kê bi ya min dikir, ew mezinên me yên guhê xwe nedidan min, ji xwe hûn dizanin çi bi serê wan hat.”
Ji aliyeki ve xeweka giran di laşe min de digeriya, lê ji aliyê din jî tiştê Evdal Beg digot bala min kişandibû.
“Çi bû, çi bi serê kê hat?”
Evdal Beg ji nargila xwe hilmeke kûr kişand û ajot: “Ax! Berê çend salek bû, Şah wekî her car ji bo zivistana xwe derbas bike çûbû Xoyê û navê wî daim be hikûmdarê me Şerefxan, Mirê Hisnikêf Melik Xalil, Mirê Cizira Botan Şah Eli Beg, Mîr Dawidê Xîzanî, Eli Begê Sasonî û çend hevalên wan ku bi tevahî hêjmara wan digihîşt yazdehan, derketin hizura wî, wan ew bi hirmet silav kirin û sedeqetê xwe nîşanî wî dan; lê îstîxbarata wî bênamusê Ustaclulu beri wan gihaştibû şah. Wî bênamûsî di rapora xwe de digot ku; “Tu ewlehî bi van Kurdan nabe, heke şahê me wan derdest

bike û biavêje zindanê, miqabilê vê yekê ewê jî, li Kurdistanê cihê ku heta îro tu şahê Îranê nikaribû bidest bixista û tevî mifta axa Kurdistanê radestî cenabê wî bikira. Her wiha şah bi vî bê oxirê xapiya û ji bilî Şah Mihemedê Şîrwanî û Eli Begê Sasonî, ew mirê ku hatibûn seredana wî, hemûyan dertest kir û avête zindanê. Herçî Ustaclulu Mihemed Paşa bû bi vê yekê ya xwe biribû ser, lê nizanibû ku bi vê xayintiya xwe, gora şahê xwe jî bi destê xwe kolabû. Xulasa, li ser vê yekê şah ferman da ku her mîrek radestî fermandareki Qizilbaş bibe; bi vê yekê jî hikûmdarê me li Tebrizê dîl digirin û teslîmê Xan Musulî dikin, peywira dagirkirina welatê wî jî didine Çapan Sultan. Bedlis, welatê bav û kalan gava ji alî Çapan Sultan ve tê dagirkirin….”
Bi rastî jî tiştê ku Evdal Beg qal dikir pir balkêş bû, min jê pirsi:
“Çawa bû, wan wisa bi hêsanî welatê we bi dest xist?”
“Naa!” got Evdal Beg, “Bi hêsanî dibe qet, helbet heta ji destê me hat, me li ber xwe da; lê Çapan Sultanê Ustaclulî bi artêşeke mezin dora Bedlîsê girtibû, bi serfermandariya Mîr Îbrahîmê birayê hikûmdarê me, me tam du salan li ber xwe da, lê dawiya dawî, Mîr Îbrahîm li ber hêzên Qizilbaşan bêtaqet ma, ji kelhê derket û xwe avête alî Sêrtê, em jî bi hêzên xwe vekişiyan Çiyayê Modka”
Û min dîsa debar nekir û pirsî:
“Gelo Mir Şerefxan bi çi awayî ji destê Şah İsmail xilas bû?”
Evdal Beg bi bişirineke watedar li min nihêrî û bersivand: “Ser çava, madem tu dixwazi…. Piştî ixbarkirina Ustaclulu, mîrê Kurdan li Xoyê dertest kirin û avêtine zindanan, Xwedê mezin e zehf tê de naçe ku agahiyeke nexêr digihije Şah. Li gor agahiyê, Sultan Özbek Xan bi artêşeke pir mezin ji Çemê Ceyhunê derbas dikir û ber bi alî welate wî ve dihat, li ser vê yekê xofekê mezin davêje dilê wî, di heman demê de biryar dide ku ji bilî Şerefxan û mîrê Hisnikêfê Melik Xalil, ew mîrê ku avetibû zindanan, serbest berde. Bi vî rengî poşmaniya xwe tîne zimên, lêborina xwe dixwaze û tevî serbest berdide. Piştî van qewimînan di nav Rojkiyan de li tevahiya welatê Kurdistanê de, ji hêla welatperwerî û xêrxwaziya miletê xwe de du mêrxasên herî bijarte Derwêş Mehmudê Keleşêrî û Mihemed Axayê Kelhokî derdikevin holê û ji bo xilaskirina Xan dest bi xebatê dikin. Ev her du egidên mezin ewil wek ku herin Iraqê Acem li nav karwanê şah de cîh digirin, wisa wisa xwe nêzikî hikûmdarê me dikin û bi hinceta birina nan û xwarinê seredana wî bikin, xwe digihînin konê Tirkmenan. Piştî ku ew vê fersendê bi dest dixin bi hêsani xwe digihînin Xan. Rojek gava qefla şah digihije Gola Çalê, Mihemed Axa û Derwêş Mehmud vê wekî fersendeki baş bi kar tînin û bi du sê hespên zînkirî dikevin nav artêşa şah, piştre Mihemed Miraxurê Pertafiyê ku xwe xistibû dirûve derwêşekî, bi hêsani xwe digihine Xan û bi vî awayî her du egid kirasê Mihemed Miraxurê Pertafî li mîr dikin û yê mire me jî lê dikin û wî li cihê mirê me radizînin, dû re jî bi lezalez mîr li hespekî zînkiri siwar dikin û ligel çend siwariyên din rasterast rêya Kurdistanê digirin.”

.

III

Ew rêwîtiya ezabê ku, ji bo bedena min a nazenin, hêdî hêdî vediguheste êşkenceyeki, wek imtihaneke ji pira siratê derbasbûyîn be dixwiya. Hemû bedena min dest û lingên min, hişê min, demek berê diviyan pirsa van êşan ji min bikin. Asoyeke nû li ber min vedibû.
Jiyaneke nû.
Her tişt heman wateyî dihundirand.
Çiyayên bi bûkaniya sipî xemilandî!
Robarên ji quntara çiyayan diherikîn jêre.
Robar, robar, robar…
Li geliyeki kûr de, bi hestên bêdawîbûnê ji xwe çûme.
Dergehên ku vedibin dinyayê li ku derê ne?
Xwedêyo, kê ez avetim vê çalê?
Ev tenhayî, ev bêpêjnî, ev bê dawîtî…
Li ku derê me ez?
Li ku derê?
Her tişt nependî ye; dinyayeke cuda, dinyayeke dûr; ji derveyî xwe re qefalti!
Di her gavekî de alemeke uxrevî.
Di her gavkî de efsaneyek!
Bedlîs!
Bajarê şêx u meşayîxan, bajarê ewliyayan…
Bajarê bi medresan, bi ziyaretan, bi tirban rapêçayî.
Bajarê bi raz û sêhran tevnandî.
Ev der li ser rûyê dinyayê wek bajarekî veşartî, bi av û hewaya xwe, bi nependiya xwe, bi cudahiya xwe min di sêhra xwe de ramedandî.
Ev çi sêhr e?
Ev çi bajar e?
Min pirsî.
Û kalekî rind ez bersivandim.
“Li gor rîwayetê Îskenderê Zilqerneyn ji vegera Babilê derbasî Anatoliyê dibe û ji qeraxa Şattulerebê dere, her wekî ji alimên dor xwe dixwaze ku ava ji her hêli ve diherikin û tevli vê robarê dibin bila bikolin. Li ser vê yekê ev alim ava Bedlisê heta ku tevli Dicleyê dibe dişopînin; li vir kevirê ceribandinê davêjin avê û dibînin ku ev av, ava herî sivik û herî bi fêde ye, ji bo hezmê jî yê herî bikêrhatî ye. Şûn de bi şopandinê digihejine Robarê Kusur û Ribatê, li vir jî ava Kusur û Ribatê didin ber hev û dibînin ku ava Kusurê bêtir sivik û bi tehm e, lewma vê carê jî mecraya Kusurê dişopînin û heta digihêjin ser kaniya ava mucizewî. Ew serkaniya ku alim xwe gihandinê li ciheke ewqas nuwaze bûye ku, Îskender bi xwe jî lê heyran dimine. Cihek wisa xweş, wisa xweş, ew çiyayên robarên Bedlisê tev jê dizên; hêşînahî, gihayên zumrûdî, girên bi sosin û beybûn û reyhanan, her cure bi kulilkan xemilandî! Îskender hema di cîh de biryar dide ku li wir kelheyekê bide çêkirin, ji bo vê yekê ji fermandarê xwe Bedlîs wezîfedar dikê. Jê dixwaze bila kelheyeke wisa qehîm çêke ku tu kes nikaribe zeft bike, heta ew bixwe jî, ji bo destxistina wê hewes bike, bila nikaribe kelhê zeft bike. Dû re Îskender şahiyan li dar dixe: Sazbend û mutrib tingîniya amurên xwe bi asimanan ve dixînin, piyaleyên şeraban li ser destên zivîn ên saqiyên rûheyvan de seyare dike, çirûskên ji nexmeyên xanendeyan diavêje,

li erşê alan olan dide, tingîniyên muzikê fesal bi fesal rûhê mirovan dagir dike, her wiha coş û şahî bê hed çend rojek didome, lê dawiyê roja rêwîtiyê tê. Îskender radibe xatir ji fermandarê xwe dixwaze. Bedlîs li gor fermana qralê xwe dû fersah li dûri ava Kusur û Ribatê dest bi avakirina kelhê dike. Di dawiyê de kelheyeke pir bi ihtîşam derdixe holê. Piştî navberekê, Îskender ji fetha Îranê vedigere tê dora kelhê, lê çi bibine, fermandar Bedlîs deriyên kelhê li ser ruyê wî digire û dest bi amadehiyên şer dike! Ji bo Bedlîs kelhê teslîmî wî bike Îskender her rêyi diceribine, lê Bedlîs bi tu awayî kelheyê teslîm nake. Îskender bi vê helwesta fermandarê xwe mit û mat dimine û bê çare şûn de vedigere. Piştî ji kelhê dûr dikeve û bi qasî rojeki rê diçe, fermandar Bedlis tevî bi mifte û kilîdê kelhê digihêjê û xwe diavêje lingê wî da ku wî efû bike; stûye xwe li ber ditewîne û dibêje, qralê min, min tenê xwest ku wezifa xwe bi cîh bînim, nexwe mebesta min ne bêîtaeti bû, efendiyê me gava fermana çêkirina kelhê dabû, ji min xwestibû ku, bila kelheyeke wisa saxlem be ku tu qral û tu fermandarê ceberut nikaribe bidest bixe. Ez jî, ji bo ispatkirina vê wisa şaş tevgeriyam. Li sêr vê Îskender navê kelhê, hukumdariya herêmê û revêbirina wan deran tev bi rêya wesayetê didiyê."

Ji bo têbigihijim ev Bedlis, ew Bedlisê di efsaneyan de dihate vegotin e, diviya berfa ha ji erdê rabûya û bihara hêşin ji binê erdê zil bida. Gava ew çax hat, min rastiya efsanê bi serê çavê xwe dit, bedewiya wê, şêriniya wê. Gava jiyan bi tevahiya sethê xwe ji bin berfê derket; di geliyekî kûr î di navê de robarê kewserê diherikîn, mehelê li hawirdoran belavbûyi, xaniyên ji axê bi bexçeyên xwe yên bihuştî di zemîna gelî de cîh girtine, xan û hemam, kemberên ji kevirên şehkiri hatine çêkirin; mizgeft, medrese û kuliyeyên mirateya Selçuqiyan; aşên li qêraxa robaran hatine çekirin; imaletxaneyên qumaşên rengîn î pembuyî, xaliyên sipehî û sextiyanê reş, bedesten û sûkên girtî… Ji xeyni du sê mehên zivistana bi berf û pûk, tim zindî û bi coş bû.

Di navbera Adirbêcan û Diyarbekir û Ermenistan û Harranê de ji bo gerokên çi ji rojhilat ji ali Tirkistan, Hindistan, Xorasanê tên û ji Îranê derbas dibin; çi ji rojava bi rêya Cidde û Bi Zencibarê tên û diçin, navend û rawestgehekî giring bû. Lê di vê demsala kambax de pir tenha bû; nexasim gava piştî mehekê bi tevahiya xwe bi sipiyeke kefendirûv bihata nixumandin û rêya ku xwe bi bajêr ve girê didan bihata girtin, kûçe û kolanên bajêr wê veguheziyana goristaneke ku tenê in û cin tê de gogê dileyîstin.

Vê gavê li vî bajarê biyanî, bi tena serê xwe bûm.

Min wî kalê rind careke din nedit, wek xeyalek ji nişka ve winda bûbû.

Ne şaş bim hêj sê rojên min temam bûbû, piştî wê rêwîtiya erjeng hêja jî tam bi ser xwe ve nehatibûm, şev bû, piştî şîvê min qedeha şerabê hêdî hêdî dibir devê xwe, di wê navê de rêwiyeke pir xerîb bala min kişand: Ji Hindistanê dabû rê, riya Îranê şopandibû; Bedlis, Mêrdin, Amed û ji wir jî wê derbasî Çiyayê Sincarê bibûya. Simbêlên wî yên boq tevli riyên wî yên gewr bûbû, bi tevahiya dirûvê xwe pejmurdehiyek jê difûriya. Pir esrarengiz dixwiya, min xwest xwe nêziki wî bikim, lê mehdê wî pir nexweş dixwiya, lewma min dev jê berda; lê dû re ev helwesta wî bêtir bala min kişand û min xwest demek berê xwe bigihînimê. Ev yek wekî daxwazekê nahête zeftkirin di rûhê min de xwe da der. Roja din em li xwarê dîsa rasti hev hatin, min silav dayê, silava min vegerand. Piştî xwarinê bê teklîf çûm li masa wî rûniştim, ewil bi awirên pirsiyar li min nihêrt, piştre wekî ku bêje, xêr e gelo, çavê xwe li ser

min gerand. Ji rewşa wî wisa xwiya dikir ku, dê li hember min ketûm tevbigeriya, lê min carek xistibu serê xwe, bi çi awayî bûya minê kilîda devê wî vekira. Demek şûn de ji min pirsi: “Wisa xwiya dike ku halê te pir xweş e.”
“Dibe” min got, “Destura te hebe bo te xwarinekê bêjim.”
“ Tu bi dilê xwe yî, ez vê pêşniyara te ya comerd nikarim şûnde vegerînim.”
Li ser vê, min ji bo me xwarin û vexwarin sipariş kir. Demek şûnde daxwazên me hatin û me sifra xwe bi afiyet paqij kir. Heta ji destê min dihat li devê wî geriyam, lê qene yek peyvek be ji devê wî derneket. Piştî demekê çawa bû nizanim tiştekî nepayî qewimî, ji nişka ve li min nihert û “Kerem bike!” got, “Mirazê te ji min çi ye gelo?” Qet ne li benda tiştekî wisa bûm “Ê çi mirazê min hebe?”
“Dê here lo!” got, “Ji te kiri min mebesta te fêm nekir.”
“Belê, dibêm qey tu mafdari.” min got.
“Êêê, nexwe li hêviya çiyî, kerem bike guhê min li te ye. Na na ka tu bisekine, ji xwe pirsa te diyar e, lê rica dikim tu tiştî nepirse. Ji xwe di esasê xwe de bi biyaniyan re axaftin ne adetê min e, lê tu wekî ciwanekî dilpak xwiya dikî, bi min wisa tê ku tu zirar ji te nagihije mirovan. Ka ez bêjim ji te re, ji ku derê têm û bi ku derê ve diçim..”
“Fermo, guhê min li te ye!”
“Ez ji Hindistanê têm, ji welatê Parsiyan.”
“Çi, te got çi, Parsî, ji bo Xwedê ev ji ku derket vêga, Parsiya çi, Parsî kî ne, heta îro min qet civakeke wiha nebihîstiye.”
“Aram be, min ji te re got, aram be. Me bi hev nekiribû ku, pirs tune ye, ezê bêjim û tu yê ji guhdar bi.”
“Bibore.”
“Bêhna xwe fireh bike vêga, ezê bêjim, bes tu bêhna xwe fireh bike, me li hev kir?”
“Belê, fermo!”
“Vêga Parsî kî ne ne kî ne dev ji van berde, ez qala tiştekî din ji te re bikim. Ev qewmê ha, berî demeke dûr mecbûr man ku welatê bav û kalan terk bikin. Lewra ji bo bikaribin baweriya xwe li gor dilê xwe bijîn li Îranê tu derfet ji wan re nemabû; li ser vê yekê bêgav man ku bar bikin û koçî Hindistanê bikin; lewra Hindistan ji bo bawerî û olan wek bihuştek bû, her bawerî û her ol dikaribû li ser axa Hindê şîn bibûya. Em şêniyên Şingal û Cebel Sincarê, ji berê ve ji şêx û pîrên xwe efsaneyên Parsiyan dibihîst. Li gor wan ola me û baweriya Parsiyan bi heman kokê ve girêdayi bû; ji wan çaxan ve ev tişt pir bala min dikişand û min ji xwe ji xwe re digot, ezê rojêk li vê bikolim çi dibe bila bibe ezê rojek herim cîhên Parsî lê dijîn û ezê hîn bibim ka esl û feslê vê meselê çi ye. Bi salan bi vê xeyalê rabûm û rûniştim, çiqas sal di nav re derbas bûn jî, min qet hêviya xwe nebirî û dawiya dawî wa weke tu jî dibînî, gihaştim mirazê xwe.”
“Qet ne be, ji vê serdana xwe te tu tişt bi dest xist?” min pirsi, “Tiştên ku te meraq dikir ji te re diyar bûn gelo, tu çi hîn bûyî?”
“Gelek tişt hîn bûm, nizanim şert û mercên iqlimê li ser însanan çi veguhestîn pêk tînin, lê dibêjim qey ji ali qewmiyetê ve têkiliyek di navbera Êzidî û Parsiyan de tune ye. Lê ji vê jî baş serwext bûm ku tiştên şêx û pîrên me ji me re qal dikirin ne tu efsane bûn, rastî bixwe bûn, belê ji hîn cudahiyên biçûk pê ve ol û baweriyên me teqez ji heman kokî dihatin, ji eynî kaniyê zabûn. Tiştê heri giring, wan jî ronahî

pîroz dikirin û wekî me ew dihebandin, diperisîn, ligel vê wekî me bi sedeqet giredayî kevneşopên Zerdeştiyê bûn."
"Bibore, li ser Zerdeştiyê têra xwe agahiyên min tunene."
"Belê" got, "Parsiyên Zerdeştî û em Êzidi teqez ji heman kaniyê zabûn. Vêga em werin ser pirsa te, bi rastî ew medrese û muderrisên bilind heke heta îro li ser vê olê, te serwext nekiribin, ez evdalê Xwedê dikarim çi bikim, tenê bi kurtasî dikarim bêjim ku ola Zerdeştî, ji enerjiya di şerê navbera Hirmiz û di Ehrimen de diqewime derdikeve holê pêk tê; bi gotinek din şerê di navbera qencî u xirabiyê de, ew şerê jê, ji yekê, du perçeyên dijberî hev derdikeve û ew şerê di navbera her du şeqê dijber de tim xwe dubare dike, ev jiyana îro jê dizê."
"Bibore lê mêjiyê min bêtir tevlihev bû."
"Ka li dor xwe binêre hinek, li însanan, li do, li îro, li sibê, tiştê ku tim xwe dubare dike, li jiyana ku ji ber lingê te diherike û diçe, ew şerê bê dawî yê di navbera însanan de diqewime, ew şerê bê wate yê desthilatiyê, qet nebe ew tu tişt nabêjin ji te re gelo? Ji xwe ji xwe re min got, "A, ji te re pirseka din a giring , hineke din tarîtî." Bes min baş fêm kir li vê jiyanê hêj ewqas tişt hene ku bi nependiyên xwe, ji min gelek dûr in, divê min rêberek hebûya, rêberek min ji taritiye xilas bikira; hêzek, nependiyên jiyanê bi tevahî ji min re eşkere bikira, ez fêr bikirama, ne yekî wekî li hember min ê reben, yekî bi ilm û zanîna xwe derya… Lewra ev kêmasiyên min bûn, nezanîn, lewma min wê kêliye xwest demek berê xwe bavêjime dergehê şêx, şêxe ku cenabê Îdrîsê Bedlîsî min ber bi dergehê wî ve şandibû, ka kerameta wî çibû gelo, bi rastî jî wekî ji min re hatibû gotin, bikaribûya min jê vê bîra ku tê de wer bûbûm, xilas bikira. Ez di hûndire xwe de wisa kûr diçûm û ew Êzidiyên reben di ber xwe de digot, Zerdeştî wiha ye û wiha ye.
Piştî demekê em rabûn, ji ber tesira şerabê giraniyek di serê min de çêbibû, bi sergêjiyekê derketim oda xwe, rasterast li cîhê xwe niviyam û mam. Ew şev dîsa vê carê kabûsekî biyanî li ser balgifa min pal da û destê xwe ji pêsira min venekir: Hêkekî qerase di valahiyeke bê dawî de hilawestî, wek zelzeleyek pê hatibe di cîhê xwe de dihejiya û wisa wisa bi teqîneke nedîtî dileriziya, şûn de ji hev şeq dibû, pêk ve du girseyên qirase ber bi jor ve vedikişiyan, her diçû ew du girse ji hev vediqetiyan û yek her ber bi ronahiyê ve yek jî ber bi taritiyê ve diçû. Kêliyeke din, girseyek ronahî ku çavan diqemişîne û girseyek ji reş î tari û çavan kor dike, esmana bi tevahî dagir dikir, her du girseyên her diçû bi dirûvê xwe li mehlûqên ecêp vediguhestin, wek du çiyayên li hev diqelibin di ser singa min de rûdiniştin, zehf tê de nediçû vê carê ew her du girse bi vekişinekê nediyar, bi tezyiqeke şid ji hev vediqetiyan, her yek bi aliyeki ve dipekiya û zikê wanê nola balonekî nepixî vediçirî û ji yeki dil û mêjî û pişik û rûh, ji yê din ji çav û poz û dest û ling û hwd wek baraneki dibariya; yekser ji aliyekî ve asoya rojhilat û ji aliyekî ve jî asoya rojava bi lebatên bêhejmar ve dihatin dagirtin, şûn de wek gîrdabekî vekêşîner ber bi dev û pozê min û guhe min ve vedikişiyan, şûn de şûn de zikê min diwerimî, diwerimî û asimana tev dadigirt, teqîneki kerrîner pêk dianî û bi vê yekê re ji zikê min, her lebatên ku bedeneki de bi goşt û hestî bibûn bi milyonan mehlûq dipijiqî…
Xwedêyo, bê çi bû ew, ew ecebê ha?
Min hêj têra dilê xwe westa xwe dananibû, min dixwest rojeki din vehêsim, lê roja din ez mecbûr mam ku xanê biterikînim, lewra agahiya hatina min gihîştibû guhê

Xan Şeref. Xan wê rojê ji bo hevditinê çend serleşker şandibû pey min, diviya miheqqeq îcabeta vê dawetê bikim, di heman demê de ev dihat wê wateyê ku demek berê bi xelatên buha derkevim hizurê. Li ser vê min haziriya xwe kir û di nezareta wan serleşkerên Kurd re bi rêya kelhê ketim. Seraya xan li kelhê bû; dimenên nuwaze, ji bajarê Bedlisê û ji kelha wî ya di nav hevrişîmeke sipî de bejn dida, tesîreke xwe yê gelek cuda hebû. Ew kelheya efsanevî ya ku di navbera Kusur û Ribatê de ji çavkaniyê du fersah durahiyê de, yek ji yê din bi qasî gulle avetina topeke dûr, li ser du çiyayan ve hatibû avakirin. Dîsa li ser banê çiyayekî ku ji van her du çiyayan heman pivanî dûr, di quntara geliyeke di navbera ava Bedlîs û Robarê Komusê ve çik daqul bûbû de, ji xwe re qadeke ewlehî peyda kiribû û li serî bilind dibû. Ev kelheyên bi diwaren xwe yên bilind, li ser zinarên asê hatibû avakirin, bi burcên xwe yên balkêş wek quleyen Babilê asimana feth kiribû, bi serayên xwe yên ji alî hêzeki xurt ve dihat parastin, bi rastî jî wek di efsanê de dihate gotin, vê derê wekî ciheke fethkirina wî qet nepêkan e nîşan dida. Me pêlavekî hilberinê yê taybet, ku Kurd jê re digotin lekan kiribû lingê xwe. Gava em bi van pêlavên fireh û di şiklê çemberekî de dimeşiyan, lingê me di berfê de ne diçû, lê dîsa jî hevrazeki wisa çik û asê li hember me bû ku, tevî rêya li her serê kêliyê fetla dida xwe jî, me ancax bi hezar zehmetî dikaribû biajota. Di esasê xwe de ji bo vê rêyê hespên baş diviya, lê ev imtiyaz tenê ji bo xan û kehyayê wî derbasdar bû. Piştî meşekî zor û zehmet, pê de pê de me xwe gihande kelhê. Di diwara dergehê mezin de li ser kevirekî, tilismek bi navê “tilismê deri” û motifek di şiklê însanekî ku di destê wî de marek hatibû neqişandin. Sedema vê yekê, ji xirabiyê marên ku demên berê li bajar û kelhê muselleti Beldîsê bûbûn parastin bû. Kelha ku hema bêje ji nîvî zêdetir seraya Xan bi tena serê xwe dagir kiribû, sê sed malên din jî dihewand; li hinek xwarê, kelheyek din hebû, tê de jî bi deriyên xwe yên hesin sûkek, bedestenek, çend bazar û sê sed malên din…
Gava em ketin serayê, ewil ji hewliyeke mezin derbas bûn, piştre yeke din û yeke din û di dawiye de em gihaştin saloneke mezin. Taliyê em li hizura xan bûn; li ser textê xwe yê biriqandî de bi heybet û ihtişam rûniştibû, ji xwe ewle, bo nêziki wî bim deste xwe bi giranî kil kir, bi weqareki mezin tevgeriya, esaleta xwe bi her awayî raxist ber çavan. Ji ber ku ez jî, ji malbateke esilzade dihatim, bi qaideyên protoqolê baş dizanibûm, bi meşeki giran nezik bûm. Piştî çend gaveki din li hember wî rawestiyam û bi rêzdarî li ber tewiyam, çûme destê wî û hêdîka paş ve vekişîyam. Nexasim bi pêşkêşkirina xelatên min, bişirinek xweş li ser rûyê wî peyda bû. Duzineyek cakêtê qedife û seten, ewqas jî cakêtên Şamî, cakêtên ji her cure qumaşên hirî û hevrîşîm, xaliyeki mezin kêfa xan bi cîh ani bû. Şaşikê xan, sipî î mezin bi yaquteke girs xemilandibû, li serî qeftaneki kesk î xweşik bi tayên zêr neqişandî, gelek xweş lê dihat, bi heybet xwiya dikir. Temenê wî nêzi sî salî nîşan dida, min qet yekî wiha ciwan nedipa, nizanim çawa, lê di wê kêliyê de anekdoteke Evdal Begê li ser Xan vegotibû hate bira min: Şah İsmail gava biryara serbestberdana mîrên zindankirî dide, diçe seredana wan û vê pirsê ji wan dike: Serokê we, yan mezinê we kî ye gelo? Li ser vê tev bi yek devî, serok û mezinê me yên rêzdar Mîr Şerefxan û Melik Xelîl in, bersiv didin, ji xwe ji ber vê sedemê, şah mîrên din tev serbest berdide, lê tenê van her duyan li zindanê digire, dibu ku ev her du di dahatuyê de ji bo wî bibûyana xetereyek.

Şerefxan ne mîreki ji rêzê bû, her tevgerekî wî şopên serokatiyê û mezinantiyê dihewand. Demek şûn de li min vegeriya û sedema serdana min pirsî. Min dengê xwe nekir û hema hêdîka nameya Îdrîsê Bedlîsî ji kembera xwe derxist û pêşkêşî canabê wî kir, gava mora li ser nameyê dit heyirî ma, kêliyek bi baldarî li min mêze kir, piştre gava dest bi xwendina nameyê kir, di ber xwendina xwe re serê kêliye awirê xwe li ser min gerand. Piştî xwendina xwe qedand, bi giranî ji cihê xwe rabû û nêzi min bû, bi bişirinekê, "Tu bi xêr hati mevanê min ê aziz û xoşewîst, her du çavê min tu bi xer hatî." got û bi germahî ez hembêz kirim. Bi rastî wan rojên li serayê mevanê xan bûm, nêzikahî û eleqeyeki wisa germ nîşanî min da ku, ez qet ji bîr nakim û îro jî wî bi minet bi bîr tînim.
Piştî demekê, mabeyinkerê xwe anî hizurê û ferman daye; "Ji vî mevanê min ê xoşewîst re daîreyeki wisa layiqî mirzadeyan raxînin ku bila nêziki min be ku çi gav bixwazim bikaribim pê re sihbetên xweş bikim. Bi vê fermana xan re, derhal ji min re di wê seraya sê sed hucre, xezine û bi çilxaneyên xwe, bi rezên xwe yên navdar û sê sed û şest hucreyên xwe yên Enderûn û birûn de daireyeke layiqî qiralan hate amadekirin. Oda min a rûniştinê bi reng û teyisîna xwe û neqişên balkêş bi dewşek, balgif û bi xaliyan raxistî bû. Xulamê di xizmeta min de bû, agirê menqelê tim geş digirt û her xwestekê min di heman kêliye de bi cîh diani.
Nav û dengê wî daim be, cenabê Şerefxan, hêj di mêvantiya min a şeva ewil de ji bo min mecliseke xwarin û vexwarin û şadiyê danî. Di vê meclisê de saqiyên çîmdirêj î zîvîn bi hinarikên xwe yên gulreng û di nav kirasên dilbijokî de wek reqqaseyekî bi fesal bi piyaleyên destan de erz û endam dikirin. Hunermendên dengxweş, bi awazên xwe yên şêrin, mutribên dengzîz bi hunerên xwe yên serkeftî dest bi jenandina amurên muzikê kirin. Piştre hîn bûbûm ku ew muzîka balkêş ku bi fesaleki teybet rûhê mirovan dialêsiya, terzekî Kurdî bû û bi navê "yoson" dihate nasîn ku bi qaideyên Faris, bi rêbazên Ereb û bi usûlên Ecem dihat bikaranîn. Di vê şahiyê de coşeke mezin li ser meclisa me konê xwe vegirtibû, herkes bi têra dilê xwe şa bû. Herkes bi têra dilê xwe dixwar, vedixwar û ji şahiya vê şeva teybet para xwe werdigirt.
Dema ez li serayê dimam, ciwaniya min û rûhtenikiya min wisa tesirek baş li ser xan kiribû ku her dixwest bi min re sihbet bike. Muhebetek, nezikahiyek ji dil nîşanî min dida û digot, tu venegere Konstantiniyeyê, li vir, li seraya min bi cih bibe, aha ji te re nanxaneyek û boyaxaneyek, her yek çar qiruş yewmiya xwe heye, ligel van ezê zeametê jî bidim te, cariyeyan bistinîm, te bizewicînim, bikim xwedî mal, bes tu neçe, li cem min bimîne. Her wiha min vê eleqeya wî, "Xwedê çawa qismet kiribe…" dibersivand, lê agirê di hinavê min de demek berê li vemirînê digeriya. Diviya min xwe bavêta dergeha şêx, nexwe jiyana min, wê her dojeha xwe biafiranda.
Şerefxan giringiyeke mezin dida ilm û hunerê. Di seraya xwe de tim alim û zanyar û hunermend dihewandin. Dema ez li wir bûm tevî mêvanên din sê mevanê wî yên bi nav û deng hebûn, her sê jî bi xebatên xwe yên pîroz li welatên rojhilat xwedî giringiyeke taybet bûn: Feridunê Nişabûrî, El Tunusî û Ebu Hamîdê Xoresanî. Ji van Nişabûrî şairekî mezin î ehlê tesewwifê bû. Piştî girtina medresa herî mezin a cihanê "Beytu'l-Hikme" û di bin tesîra siyasetvana de bêhêz ketina xilafetê, li Bexdayê, demên zêrîn a berê, careki din bi hêsanî nikaribûya bidest bixista de, gelek bi helbestên xwe yên sofiyane û bi nêrinên xwe yên cuda di demeke kin de ji alîgirê

xwe civateke girse çekiribû. Lê mixabin pir diyar bû ku di demeke nêz de hêzên batil ên ji ber baweriya xwe ya xurufîtiye çermê Nesimiyê şaîr bi zindîtî gurandibûn û Hellacê Mensur jî, ji ber ramyariya xwe ya "Ene'l-Heq" li Bexdayê kuştibûn, ji vê rewşê haydar bûn, dikirin xumexum û dixwestin bi awayekî jê xilas bibin. Herçî Nişabûrî bû ne li benda şehîdbûnekî bê wext bû, lewra hêj xebatên xwe yên pîroz temam nekiribû û tevî vê ji bo mesnewiya xwe ya mezin, ku nîvê umrê xwe dabûyê hêj neqedandibû. Demek şûn de bi telqîna dostên xwe biryar dide ku bi dizîka ji Bexdaye derkeve. Ji xwe bi arikariya heval û hogirên xwe bi hêsanî ji Bexdayê derdikeve û berê xwe rasterast ber bi Bedlisê ve dide. Zatê muhterem ji wê rojê ve li serayê, mêvanê Mir Şerefxan e.
Mir Şerefxanê ku ji bo her cure ramyariyê xwedi xweşbîniyek bû, li dora xwe bi bîr û baweriyên xwe yên cuda gelek kes civandibû, ligel vê ji her nêrinên mêvanên xwe sûde werdigirt û vê jî, ji bo xwe dewlemendiyek didît. Di nav mêvanên xwe de tevî ku di nav nêrin û baweriya wan de cudahiyên mezin hebe jî, bi teybetî giringî dida Feridunê Nişaburî, El Tunusî û Ebu Hamîdê Xoresanî. Nema ku di navbera hizirîna El Tunusî û Ebu Hamîd de dijraberiyekî berbiçav hebû. Wisa ku Ebu Hamîd bizanibûya ê bi bêhedî neyê ithamkirin, yek deqeyek nedisekinî û dijraberî xwe wek Aristalisê dabû şopa wî bi kafirtiyê sucdar bikira. Ji bo qibla Mislimantiyê wekî berê dîsa ber bi zanistiyên Yewnaniyên kafir ve nekeve, ji bo silameta zagona şerietê, diviya wisa tevbigeriya, lewma di rexneyên xwe de wisa dijwar û bêpivan bû. Wekî dihat zanîn Ebu Hamid angaşt dikir ku, di Mislimantiye de cihê felsefeyê tuneye. Ligel her tiştî, ji ber zanistiyên xwe yên der barê İslamê de, li hemû cihanê kesayetiyekî muteber û otoriteyekî mezin dihat destnîşan kirin. Bi min wisa dihat ku li Bedlîsê jî, ji ê din bêtir dihat hebandin. Ev şexsiyetê mezin, Ebu Hamîdê ku ji ber fikrên xwe yên ji xweşbîniyê dûr, ji alî ehlê tesewwifê ve nedihat hezkirin, car carna pêşniyarên ji ehlê serayê ve ji guncav dihat dîtin li xan dikir û di kiryarên xwe de li gor pîvanên İslamê rastî û şaşîtî destnîşan dikir. Li gor dîtina Ebu Hamid, her dîtinên felsefî di dawiya dawî de wê ber bi kufrê ve biçûya, ji ber vê rêya tesewwifê ji xapandineke ku Xwedayê Teala ji kirase xwe yê asimanî dike û ber bi cismaniyekî ve dibe pê ve ne tu tiştek bû Rêya heq yek bû, ji xwe ew jî bi Qûrana Pîroz hatibû destnîşankirin, lewma hewldanên derveyî çarçoveya Qûrana Pîroz pûç û nafile bû, bi çi mebestî be bila bibe derketina vê sinore li gor pîvanên İslamê qedexe bû. Ebu Hamîdê xwe di nav çarçoveyeke wisa zagonî de heps kiribû, bi xisletê xwe jî yekî pir sar bû, hema bêje lihevhatina wî bi xwe bi xwe re jî zehmet bû. Bi zanîna xwe têr û tije bû, ilm û îrfanê wî wek deryayek bû, lê çi heyf ku yekî wisa di kûrahiya ilmê xwe de sedefên pir bi nirx dihewand û li hember fikrên dijraberê xwe bê tehemmiliyeke bê hed nîşan dida…
Ebu Hamîd xwe çiqas bi xetên tuj sinor kiribe, berevajiyê wî El Tunusî jî sinorên xwe ewqas berfireh kiribû û bi ya rastî xwe ji sinoran azad kiribû. Li gor vî zanyarê mezin bo têgihiştina gerdûnê, bo eyankirina tekamula razên dinyayê ku li hev aninekê nuwaze ya Xwedayê mezin pê ve ne tu tişt e. Diviya alema madî û alema manewî ji hev bihata veqetandin. Heke nehata veqetandin û bi hev ve giredayî bimaya; ne di ilmê beşerî û ne jî di ilmê madî de ji bo pêşketina dinyayê tu pêşveçûn pêkan nebûya û însan ji ilmê tu sûde wernegirtiba. Li gor wê diviya yê Sezar ji Sezar re, yê Xwedê jî ji Xwedê re. Tiştê elametê hilhatina rojê bû, belki jî avabûna xwe bi xwe bû jî?

Lêkolina tiştekî wisa ji bo tekamula mirovahiyê giring û bi fêde, çira wek tevlibûna karê Xwedê bihata ditin. Diviya her bûyer ne bi tena serê xwe, lê girêdayî pivanên perspektifa tarixê, civakê û iqtisadê bihata şîrovekirin, ancax bi vî awayî mirov dikaribû wan bûyeran binirxanda. Tarix ne tenê menşeyê mileta û xanedana bikole û tekamula wan di neynikekê de nîşan bide, yan jî robarekî ku hema wisa di mecraya xwe de biherike here ye. Berî her tiştî ev yek li ser bingeha tekamula mirovahiyê de tiştên nifşan û gelan derbasî hev kirîne de bihata sazkirin, bi van veguhestinan de mirovahî gihaştiyê kîjan astî, li ser vê bihata avakirin. Ancax tehlilkirinekê bi vî terhî dibe sedem ku mirov bikaribe tesirek erênî li seyra tarixê bike. Divê mirov li ser hemî buneweran bi vî terhî û bi balkeşî hûr be. Bi teybetî li ser tekamula zindiya bisekine, zindîyên ku di heyama herî ewil de ji heywantiyê, ber bi mirovahîtiyê ve çawa kemiliye. Wekî kemilîna hemû zindîyan dişibiya hev, ê ku wan ji hev vediqetand jî ne hilbijêrî bû, di demeke dirêj de tesîra veguherin û veguhestîna xwezayê li ser xuliqandinan tevî de pêk nehat, ligel vê ne tenê zindî, bunewerên din jî ji vê veguherîn û veguhestinê para xwe nestandin û her tişt di herikîna tarîxê de bi vê tesira xwezayî guhêrinên seyr pêk ne ani? Û Xwedêyo, qala çi qewimînên seyr dikir! Gava min guhê xwe didayê, diwarên qirase di hinavê min de hildiweşiyan. Ji xwe, ji baweriyên xwe û ji bîr û boçûnên xwe diketim gumanan.Tiştê pir wêrekane bûn, yekî ji rêzê van tiştan bigota teqez ê bi kufrê bihata tawanbarkirin, ihtimaleke mezin jî, ê çermê wî bihata gurandin. Ji xwe lewma Ebu Hamid jî, nimêja ku El Tunusî dikir betal û karê wî jî rasterast wekî tevlibûna karê Xwedayê teala didit; vê angaşta xwe jî, wisa ne bi pistepist, lê bi dengekî bilind eşkere dikir. Ji xwe li serayê keseki ku rexneyê xwe ji Ebu Hamit negirti be tunebû.
Feridunê Nişabûrî ku min di nav van her sêyan de yê heri nêzi xwe didit bû, di halê xwe de, yekî gelek dilnizm, ekserî bi mesnewiyên xwe ve mijûl dibû, hema bêje hişê xwe tev dabû ser vê. Ji ber nêrinên xwe yên tesewwifî wî jî, para xwe ji rexneyên tund ên Ebu Hamîd distand, lê herçî Nişabûrî bû ji vî ali ve bi têra xwe hebû. Tu car li bin rexneyan nedima û bersiva xwe bi şêweyeke zirav, sergiran û pir tenik dida. Nişabûrî tim bi eleqeyeke germ nêziki min bûbû. Tevî meyldariya xwe ya tesewwifê û helbestê, ji çîrokan jî gelek hez dikir. Çend fersend bidita, ji min re çîrokan digot, dixwest ku ji qisseyan hisse derxim. Hema li kijan meclisê ku ew tê de bû qala bûyereke bihata kirin, teqez çîrokeke wî hebû. Me baş li hev dikir, gava pirsek di mêjiyê min de xwe dida der, piştî şêxê xwe min ewil serî lê dida. Wisa dixwiya ku xwe bi tevahî dabû mesnewiya xwe ya mezin, tim pê mijul bû, bê navber dinivîsand.

## IV

Xan Çawa bi maiyeta xwe re dabû rê û hatibû dergeha şêx! Cara ewil ev yek bi min pir ecêb hatibû, lê şûn de hin bibûm ku ne tenê Îdrîsê Bedlîsi û Xan, hema li xaka Kurdistanê ki navê Şêx Ebu Reyhanê Kurdî bibihîsta, ji ber radibû piya. Li vî welatî hema kî hebe ji bo wî rêzeki mezin digirt, hirmeteke mezin nîşan dida.

Şêx nediçû seraya xan, lewra xan nedixwest şêxê xwe bîne heta piyê xwe; heçî xan bû çiqas bi edaleta xwe û bi fezileta xwe nav dabe jî, seray ne ciheke ku ji zilm û fêlan şûştî bû. Xan, wê çawa şêxê xwe bi hikmeta xwe û bi zanatiya xwe bi safîtiya beden û giyana xwe, bi pîr û pakiya dilê xwe bikişkişanda qesrê? Qesra ku bi mekana xwe rûhên pak ber bi qirejiyê ve diajot. Xan bi vî awayî qet nikaribû rûmeta şêxê xwe bi erdê re bike yek, rûhê wî yê pak ewqas biçûk bixe? Na teqez tiştekî wisa wê nebûbûya. Ji xwe hikmeta şêxîtiya Ebu Reyhan li vir derdikêt holê: ew nediçû piyê hikûmdaran, lê hikûmdaran dianî piyê xwe.
Bi rasti, ji ber ku xan heta dergeha şêx, refeqetî min kiribû, qedrê min jî pê re pir zêde bûbû. Bi qasî saetekê şêx û Xan vekişiyane odeyekê û li wir hevditinek pêk anin, piştre xan duayên xêrê ji şêx xwest û li seraya xwe vegeriya.
Niha dawiya dawî şêxê ku bi qala hikmeta xwe min ji Konstantiniyeyê heta van deran kişandibû, li hember min bû. Dema pêşî, ji min kirî rasthatineke li çiyayê Tûrê ku devê Musa ji hev şexitandibû bi min hat, bi sergêjiyekê hejiyam, dû re sivikahiyek rûhê min dagir kir. Şêx li ber rehla xwe rûniştibû li ser rahlê pirtûkeke dev vekirî hebû, ne tenê wekî şêxeki pîroz, lê bêtir wekî feylosofekî mezin dixwiya. Kêliyek rûyên xwe yên pîroz î sipî ku çavê min qemişandibûn mist da û şûn de awirê xwe li ser min çikand. Di wê kêliyê de çokê min sist bûn, ricfeke sar li ser pişta min xwe da der, ji xwe ji xwe re min got, ez ha ketim û ha ketim, demek wisa mit û mat mam. Piştre nizanim çawa bû li xwe werqilîm û pê re hay bûm ku, ji bo nêzî wî bibim îşareti min dike, hema ew dem bi vê işaretê re, ji zincirên ku ez hişk girê dabûm vala bûm û bi pêngavên sivik ber bi alî wî ve meşiyam. Min hew dit ku di wê kêliyê de rasterast çûme daqûli destê wî bûme û radimûsim. Bi şefqet serê min mist da û dûayê xêrê ji min re kir, şûn de çû li ser postê xwe runişt û ji min jî xwest werim li kêleka wî runêm.
"Dêmek Îdrîs te şiyand!"
"Belê, şêxê min"
"Û te jî bi ya wî kir û heta van deran hatî, ewqas rêyên dûr û dirêj, bi rastî jî tiştekî pir seyr e!"
"Belê ezbenî." min hema şêx di ber xwe de dibersivand û qet serê xwe ji ber xwe ranedikir.
"Belê baweriya te bi Îdrîs hat, lê baweriya Îdrîs bi çi hat ku te şiyande heta van deran?"
Bi vê pirsê nepayî yekser ez ricifîm û di nav perpitinekî de hew min bi dilê zarokekî saf li rûyê şêx nihert. Wek dîwarek bû, tu qeliştek peyda nedibû ku wateyeki herî piçûk xwe tê de bide der."Ça.. çawa ezbenî?" min got, wekî li biruskekê qelibî bim, bi min hat û peyvên pêwîst tev di gewriya min de asê man, "Min fêm nekir."
Bi rasti jî min çi dizanibû ku ê wê demê min ji imtihanekê derbas bike.
"Di ilmê rûh de berî ku noqi deryayê bibî, ji bo derbasbûna robarekî tu çi dibêjî gelo?" ji min pirsi.
"Li hember hezret nikarim bêjim ku bikaribim qasî dilopek av jî derbas bikim." Lê dîsa jî cenabê we çi divê dikare bipirse, amade me."
"Ka em biceribînin gelo."
"Hûn çawa dixwazin bila wisa be ezbenî."

"Nexwe ezê pirsek ji te bikim." got, her peyv ji devê wî wisa bi fesal û wisa bi pîvan derdiket ku, însanê herî ji rêzê jî nikaribû xwe ji tesira wî xilas bikira .
"Fermo, kerem bikin!"
"Nexwe ka bêje ji min re, gelo nefs bêtir dişibe kijan heywanî"
Bi rastî, ji yekî pê ve tu bersiva min tune bû û nizanim gelo ew jî bersiva ku şêx lê digeriyabû bû, yan na. "Dibe ku şaş bim, lê ev heywan wekî hêştirme dixwiye ji min re."
Li ser vê yekê şêx bi awirên baldar demek li min mêze kir û bi vê meyzandinê têgihiştim ku derbarê min de qeneetekî baş pê re çêbibû.
"Çira hêştirme?"
"Lewra ku ev heywan gava ku bifire dibeje nikarim, ji ber ku ez hêştir im dibêje, lê gava tu bixwazi barek lê bikî vê carê ji, bi min nabe dibeje, ji ber ku ez balindeyek im."
Bi vê bersiva min re, ji nedîve bişîrînek li rûyê şêx venişt, "Min baş dizanibû ji xwe." got, "Îdrîs yeki bê idraq naşeyne cem min."
Bi van gotinên wî ez gelek şanaz bûbûm.
"Nexwe divê gerek tu vê jî baş bizanibî," dirêji da axaftina xwe, "Gava tu ji bo wezifeya xwe ya bendetiyê bînî cih, bangi nefsê biki, ê tiraliyê bike; lê gava pêdiviya te ji bo gunehkirinê pê çê be, ê bi lezgînî xwe bigihine te. Ev heywanê ku di hinava me de bi cîh bûyê xwe bi şehwetê xurt dike, însanê kamil qet guhê xwe nade vî heywanî, berê xwe jê dike, tu car xwe teslîmê daxwazên wî nake, bi ya min, ê baş ewe ku mirov vî heywanî li zindana xwe heps bike, ew çi bêjê mirov berevajiyê wî bike. Ji bo li ber heqiqetê tewandina stuyê wî heywanî, ji birçîmayin û tîmayinê pê ve tu rê tuneye. Rêya rast ew e ku mirov wekî hêştirekî barê xwe hilgire û bikeve rê, ne wekî hêştirmeyê ji barhilgirtinê bireve."
Piştî çend dersên wiha, feraseta wî ez ecebmayî hiştim, bi rasti jî baş têgihiştibûm ku ji bo çi ewqas rêz û hirmet ji bo wî têt girtin. Ji bo şîrovekirina xewneki xwe çawa lêdabû çûbû Hindistanê, min ev yek ji devê xelkê bihistibû, ji kevnegirtiyê dûr disekinî, xwe ji rêya ilmê tu car dûr nedixist, hedê xwe baş dizanibû, di tevgerên xwe de ne wekî Ebu Hamîd asoteng û ne ji wek El Tunusî bê hed û bê sinor bû. Herçî li Bedlisa warê şêx û meşayix û ewliyayan de gelek dergeh û medrese hebûn û deriyê exlebi wan bi tirsa dojehê vedibû, li wan deran rûh û dilê miridan bi dara tirsê perwerde dibû, lê tekka şêx berevajiyê wan, mektebeke mişt bi roniya evînê diçirûsiya bixwe bû. Wî wekî xoceyên din pasevaniya tirsê nedikir; di navbera zana û ramyarê İslamê de tu ferq û mêylî nedikir, tevî wek alimên zanayê mezin, Hallacê Mensurê Ene'l-Heq diparast, Nesîmî yê ku di rêça Xurufîtî ye de diçû jî, wek stêrkeke geş a Endulusî hembêz dikir, xwe bes bi sofîtiyê ku bi koka xwe digihaşt Eflatunê Yewnanî ve nedigirt û tu caran bi çavkoriyekê, xwe bi alimên wek perdeyeke reş dabûne ber bi ronahîtiya Abbasiyan ve girê nedida. Car carna jî pesnê kesên wekî Farabî, El Kindî, Îbn-î Sîna û Îbnû'r-Ruştê ku xwe bi mekteba Aristalisê alemê madî û manewî ji hev veqetandibûn dida. Her diçû bi kûrahiya wî bêtir dihesiyam, deryayeke bê sinor bû, sedefên herî hêja di kûrahiyên xwe de dihewand, bi hêsanî dikarim bibêjim ku di rizgarbûna rûhê min de para herî mezin ê şêxê min bû, ev yek wek rojê eyan û beyan bû.

Rojek derbarê sebrê de, “Sebr tehl û berhemê wê şêrin e.” digot, “Heke tu bixwazî bigihêjî mirazê xwe bi sebr be, ma tu nabînî simyagerê ku bo sifrê veguhezîne zêr çiqas zêrê zer tevli xaka reş dike. Ji bendemayînê nekerixe; ji bîr neke ku hespê Ereb bi bayê bezê diçe, lê zû diweste, hêştir bi xwe hêdî û bi giranî dimeşe, lê di rêyeke dûr û direj de hîç naweste.”
Rojeke din derbarê axaftinê de, “Di cihê xwe de divê biaxivî û di cihê xwe de hiş bibî.” digot, “Tu bixwazi bibî yekî maqul, divê peyvên xwe bipîvî, bi mêzînî û wisa bibêjî, gava ku gotinek ji devê te derket, divê tu baş bihesibinî ew gotin bi ku ve diçe, lewra qet nabe ku ava ji kaniyekê diherike careke din şûn de vekişe. Dema ku tu mecbûr mayî yekî ji yê din bineqînî, hişbûnê hilbijêre, pêwîst bike zimanê xwe di devê xwe de biqufiline, te divê gotinên te bila la’lê Bedexşan bin, çi pere; lewra ku pir axaftin dilê mirov ziwa dike, kaniyên ji hinavê mirovan dizên dimiçiqîne. Heke wekî xisleteki li sukûtê xwedi derkevî tê xirqeya silamete li xwe biki.”
Û her wisa berdewam dikir.
Û her di mirşîdiya şêxê xwe de sivik dibûm, sivik dibûm û her wiha bi asimanan ve hildikişiyam.

V

Aliyeke min hêj jî bi jiyînên kevin diêşiya. Min çiqas hewl bida, bo xwe ji xwestekên laş dûr bixînim û çiqas zirx û mertalan bikim ku xwe ji êrişên nefsa xwe biparêzim, dîsa ji car carna li hember arezuyên xwe têk diçûm û ji vê qelsitiya xwe nema debara min dima. Encama ji vê derdiket ew bû ku; hêj rêyeke dûr û dirêj li pêşiya min e. Xwedêyo ev rêya min dabû ber xwe çiqas zehmet bû, hêdî hêdî pê dihesiyam. Têdigihiştim ku rastiya bi şilfutazîtiya xwe li hember min disekinî canê min bixwe bû. Lewma diviya berî her tiştî ez canê xwe têk bibim, nexwe tu serkeftin ji bo min tuneye. Xwedêyo, laşê min, canê min, dijminê min ê heri mezin bû û heta min wê têk nebira kakilê minê di qaşilê xwe de veşartî, nedihata bidestxistin!
Ji aliyekê ve jî min didît ku di jiyana min de gelek tişt veguheriye, rêyeke wisa nû li ber min vebûye ku êdî ez bixwazim jî qet veger jê nine, wisa dixwiya ku ev rê heta ronahiyê bi dest bixim, ê min ber bi xwe ve vekişîne. Qibla min ber bi ku ve bû; dilê min, rûhê min û mêjiyê min di kijan robarî de bihata şuştin? Tiştê seyr ev yek meraq û heyecana min tim zindî digirt.
Her tişt di rêya xwe de diçû, her tişt li gor dilê min lihev dihat. Li tekkê fêr dibûm, pak dibûm, diketim tefkîrê, li serayê bi mihebet û bi dostaniya xan dilebikîm, di nav alim û zana û helbestvanan de ji bexça hikmetê ji her fêkiyê ditehmijîm. Ta ku rojek rasthatinek, jiyana min dîsa wekî berê ber bi tevliheviyekê ve ajot.
Şefeqek…

Şefeqek wekî her demî, li ser rêya min ji bo bedena min a ji aliyekî ve xwe ji nefsa laş safî dikir û ji aliyekî ve jî hêj ji pençа arezûyan de bi ricfekê diqilqili, xefikekî çawa hatibû vedan…
Min ê ji ku bizanibûya ew şefeq, ji jor cotek çavên reş, ê bi awirên mest, dilê min ê jar di nav singa min de bi gurpegurp bida lêxistin û ê ji xwe re bikira zebûn.


**Îlhamî Sîdar**
**TEHMA XWELIYÊ**
**Roman**

Wekî her car wê rojê jî, ber bi tekiya şêxe xwe ve diçûm, her wisa bû ji xwe, heftiyê çend car ji bo perwerdehiyê diçûm ocaxa şêx. Dîsa wekî her car di ber xwe de bi xilmaşî dimeşiyam. Heta bigihaştama menzilê, bes li xwe vedikişiyam, lê ew roj çi bû û çawa bû ku li xwe miqate nebûm, teslîmê wî dengê bûm? Ew dengê ku ji kûrahiyekê dihat, belê dibê qey tiştek ji hundir li min eyan bûbû û bêyî vîna xwe awirên min ber bi jor ve rapelikîn û rastî cotek çavên xezalî hatin. Ji xwe, ji vê bû yekser bi efsunê ketim, hema di wê demê de du nêrinên bengîn wek du bagerên li hev dişikên û di dilan de birûskan vedidan… Nizanim ew dem çawa bi min wekî umrekî sax hatibû, ew her du çavên reş ji pencera jor daqulî min bûbûn, wekî ez dîl girtibim. Piştî demeke pir kurt li xwe hişyar bûm, ew pencera ku awirê min lê hilawestî mabûn vikîvala bû; ne tu in û cin, ne tu pêjn…Xwedêyo çawa bûbû, ew çav yekser bi ku ve winda bûbûn? Na na, di nivê rojê de ne pêkan bû ku ez xeyal bibînim; berê kêliyek ji pencera jorê xoriyek bi her du çavên xwe yên xezalî li min dibişirî. Ma ne ew werîsê bengîniyê bû ku xwediyê wan çavan bi dilê min ve weşandibû û ka niha çawa wek serabekê ji ber çavê min bar kiribû û çûbû? Gelo rastî jî dibe ku xeyalek be, dibe ku ew kêlî ez ne li ser hişê xwe bim; hema di wê kêliyê de bi van pirsan nemabû min hiş bavêta. Û mêjiyê minê di nav aloziyekî de digevizî debar nekir û xwest xwe ji vê nav toz û dumanê xilas bike. Bi vê re lingên min di cih de bi ya efendiyê xwe kir û ber bi rêya xwe ve çû. Çû lê ew rûperî kêliyek be jî ji ber çavê min dûr nediket. Xwedêyo ezê dîn bibûyama, ezê çawa ji vê xewnê hişyar bibûma, axirî piştî demekê hêdî hêdî bi ser xwe ve dihatim û pirsên dijwar di mêjiyê min de olan didan: Çawa dibe tu li pencera yekî biyanî dinêrî,  ka Xwedê dizane ewê ku te dilê xwe bijandiyê kê ye û ne kê ye, bes êdî serê xwe bi vê diêşini, na teqez xeyalek bû te dit û divê teqez tu xwe ji vê xeyalê xilas biki; nebî nebî careke dîn jî, ji ber pencera xelkê derbas bibî û li penceran binêrî…
Ya ilahî, ya sitar!
Demên berê min qet bîr nedibir ku ev yek, ê min ber bi macerayeke di rûhê min de birînen kûr vekin ve vebikêşe. Çawa be min li mekteba şêxe xwe rûhê xwe perwerde dikir; her diçû ji daxwazen laş dûr diketim, qêy ev çavên xezalî ê çiqas bikaribûna li min misellet bibûna? Na min tu ihtimal nedida tiştekî wisa min têk bibe; lê her tişt bi lezbûneke nedîtî diqewimî. Êdî gava ku ji serayê derdiketim û ber bi rêya tekiyê ve diçûm, gavên min derveyi vîna min, min ber bi wê pencerê ve dikişand û her ew cot çavên reş tim li bendî min bûn û pê re pê re ber bi qedera ku li bendî min bû ve vedikişiyam. Êdî baweriya min ji min dûr dima, hêviya min her têk diçû û min dilê xwe û rûhê xwe tevî teslîmê wan çavan dikir. Ewqas rastî wan çavan dihatim ku hew min didit ji çar alî ve bi wan çavan hatime dorpêçkirin. Ez bi ku ve biçûma ew ji wek siyekê didan du min; êdî ez baş lê hay bûbûm ku ji bo wan çavan dikaribûm ji her tiştî, ji xwe, hetta ji rûhê xwe jî vekişiyama. Ewqas rê, ewqas perwerdehî, ewqas ders û taliyê ber bi tunebûnekê ve çûyin… Ev tiştekî çawa bû, piştî ewqas zanin û tecrubeyan, xwe ji her tiştî didim alî û ber bi rêya nefsa xwe ve diçim, teslîmê laşê xwe dibim.
Xwestekên laş, min têk dibin…
Tevî her tiştî, rojên ewil heta ji destê min hat bi giraniyekê tevgeriyam. Çend rojek ne ji ber wî xaniyê derbas bûm û ne jî min bi bîr ani ku careki din bi wan çavan bikevim, lê ew wek siyek ji dû min nediqetiyan. Lê zehf neçû êdî qewetek derveyî îrada min

her roj û her roj min bêtir ber bi wê pencerê ve kişand, wekî ku xewnên şevan de her du lingen mirov di nav tenekeyên betonan de hatibe asê kirin, lewma jî nikaribe ji cihe xwe bilive, ez jî dawiya dawi vegeriyam xala mitleq û di cihê ku lê asê mabûm de, nikaribûm gavek jî xwe bi paş ve bidim. Di nava naçariyekê de, dilê xwe yê di xefika cotek çavan de diperpitî nikaribûm xilas bikim
Wek kehrûbayê ku kayê bi ali xwe ve vedikêşe, ew cotê çavan jî, dilê minê naçar ber bi xwe ve vedikişand û hêzên min ez terikandibûm, min nikaribû li ber xwe bidaya, her diçû wekî naçarên ku di aloziya hestên xwe de rêya xwe şaş dikin, ez jî wisa ji xwe dur diketim. Nizanibûm li ku rawestiyama, di nav pêlên medceziran de diçûm û dihatim.
Baskên pergalê min her diçû ji derziye xwe dûr diket û hêzên dernavend, min ji qibla xwe ber bi dûrahiyan ve dipekand, her diçû ji xwe dûr diketim, êdî ji ber tiyitiya laşê xwe yê di beyabanekî bêdawî de tu debara min nedima.
Eza min tim dipirsî, "Gelo gava mirov laş red bike pê re xwe jî înkar nake?"
Gava min ev pirs ji şêxê xwe dikir, çavên wî bi awirên beloq arasteyî min dibûn.
"Beden çavkaniyên herî mezin a êş û kederan e." digot û didomand, "Anasirê bingehîn wate ye, sûret pûç dibe dirize, herçî heqiqet e, di rûhê laş de veşartî ye, di dilê buneweriyê de ye. Divê mirov rêyek bibine, qeliştekek û ber bi wê rêyê ve here. Ew mirovê qels ku bi zewqên ji alî beden hatiyê wedkirin ve xapiya be, dişibe wan darên bi bayeki sivik re dirûxe. Ew cewherê ku em bixwe ne, di hinava me de heps kiriye, ê baş em bigihêjine wî û deriyê hicra wî bişkênin û wî azad bikin, em laşê xwe yê ber bi heywaniyê ve diçe ancax wisa dikarin rizgar bikin, kengê me rûhê xwe ji heywanê ku ew dîl girtiye xilas kir, kengê me ew ji hemû kirêtiyan şuşt, ancax wê çaxê em dikarin ber bi rêya rastiyê ve bimeşin; wê çaxê rêya ku derkeve pêşiya me rêya heqiqetê ye. Tu car ji bîr neke ku, bedena me ya fanî wê rojek wek dareke pûçbûyî bikeve erdê, tevli axê bibe û birize, ji vê tu xilasbûn tuneye."
Û mirîdekî din pirsî, "Gelo ku bedena me wek a Xizir Eleyhîsselam nemir bûya?"
Em mirîd tev, li dor şêx bi rengekî nivxelek rûniştibûn û li gel guhê me, rûh û dilê me jî lê guhdar bû.
"Di cîhana ji kevirê ku pûç dibe bigire" got û bi nêrinekê dilovan li ruyê me nihêrt, "Heta hesinê ku dihele û di xwezayê de çi hebe ku hebûna wan hatiye peyitandin, tev bi mirinê re rûbirû bimine de imtiyaza nemirtiye bi para kî dikeve gelo? Lê em bêjin bila wekî te be, Xwedayê Teala nemirtî kir nesibê yekî, em bêjin ew kes jî tu yi, yan tu, yan jî tu… Vê gavê bêjin ji min re; însanên ku tim ber bi pirsgirêkên tevlihev de diçe, di aloziya gerdûnê de çend dikare debar bike û kî dikare bêje ku di jiyaneke wisa de berê mirovahiyê wê tim ber bi tarîtiyê ve nekeve, êşkenceyeke bê dawî wê xwe bi pê ve negire? Di dinyayeke wisa de aloziyên çi mezin wê biqewimin, gelo hûn hîç tînin bîra xwe. Bi vê cihana pîr ku tu nependiyeke wê nemaye, her tiştî fêrî me kiriye re serkirin ewqas dijwar ajotibe, gelo jiyaneke bi tevahiya xwe tari wê çi bextewarî bikaribe pêşkeşi me bike? Carek bifikirin ka; di rêya ku Xwedê nîşan daye de hûn dizewicin, zar û zêçên we çedibin, piştre neviyên we û nevîçîçirkên we… Û ev silsile bi sed salan wisa xelek bi xelek berfireh dibe û hûn bi wan tu miraz nakin, tev dor bi dor dimirin û bedena wan tevli xaka reş dibe, bi demê re çiqas hezkiriyê we hebe tev yeko yeko diçe û li ser windakirina wan dem û dewran dibore, her diçe bîreweriya wan jî ji we dûr dibe, şopên wan ji holê radibe û her hûn, her hûn bi tena

serê xwe bîreki tevlihev, ji dengan, ji dîmenan, ji şopan pêkhati her diçe tije dibe, tije dibe û heta dev! Piştre tu tişt lê zêde nabe çi hebe der diçe û rê tim ber bi tenhayiyê ve ye, tenhayiyeke dojehî, êdî rûhê we ji ber êş û eleman wek bêjingekî quloqulo bûye, dengê we digihêje erşê ala, dibe ku darê tûba bi şaxên xwe yên berevajî bi ser we ve hilweşe, xumaquşê ku siya xwe li ser we kiriye ji zû de lêxistiye û çûye, hûn dixwazin bimirin lê çi fêde bi dest nakeve, hûn nemir in; lê miqabilê vê hûn êdî ne tu kes in, ne bîra we tu bîr e, ne hişê we tu hiş, mexluqekî nedîtî ne êdî hûn. Û ber de ber de hûnê bêjin evê jî here, evê jî derbas be, lê qet dibe? Û hûnê bêjin çawa be birîn qaşil digire, lê naa, bê xwediyo ev ne çerm e, piştre xelek dîsa dest bi a xwe bike, çerxên xwe dîsa bizivirîne û hûn mirovê nemir her dem û her gav bi mirinên hezkiriyan re rûbirû biminin, û dê kesek nemîne ku hûn bixwazin xwe pê ve girê bidin. Xwedêyo êdî tehemil namîne, erê tê nexwazî ji kesî hez biki, tê ji her kesî xwe dûr bixî, lewra tu însan î, tu însanê nemir û mehkumê jiyaneke nalet a bê dawî yî… Û şêxê min li ser vê pirsê çiqas dirêj kir Xwedêyo! Her peyveke wî tariyeke bêtir tîr li ber min vedikir. Nêziki êvarê bi ser giraniyekê vegeriyam serayê û li daîra xwe demek dirêj li ser dewşekê xwe niviyam û fikirîm, piştre bû şev û min heman pirsî ji Nişabûrî kir, ez li bendê bûm ku tariya şêx li ber min vekiribû bila ew veçirîne, bila bersiveke li gor dilê min bide. Ji aliyê din ve min dixwest hin bibim zana û şaîr di pirsan de, hikmeta xwe bi çi rengî der dibin, hîn bibim ka çi cudahî di navbera şîrovekirina şaîr û zanyaran de heye. Ji xwe çawa min ev pirs lê kir dîsa wekî her caran ji tûrê xwe çîrokek derxist, ji xwe ji bo her pirsî çîrokeke wî tim amade bû.
“Li min baş guhdar be nexwe, di vê babetê de çîrokek bêjim ji te re.” got, bi tinginiyeke nerm “Çîroka qaqnusa bextreş bibêjim ji te re.”
“Fermo, kerem bikin.” min got.
“Ev qaqnusa bedew û her wiha ecêb li Hindistanê dijî, cih û warê wê ew der e. Ev qaqnusa rebenê Xwedê manendeke ya wê li ser axa dinyayê nedaye, nikleki wê yê bi hêz heye dişibe amura neyê, sed qul tê de heye, ji her qulê awazeke cuda, ji her qulê nexmeyeke cuda derdikeve, dengê wê ewqas xweş e ewqas xweş e ku gava ew diçîve çukên din tev ji hiş diçin û lê guhdarî dikin. Ev balindeya ecêb bi umrê xwe hezar sal dijî, bi mirina xwe baş dizane û gava dema hatina mirina wê tê, diçe qal û qirşa berhev dike, komek jê pêk tine, şûn de jî diçe li ser wê komê rûdine û bi hezar cure nexmeyi dest bi feryad û fixanê dike, di xwezayê de tu ajal namine ku, ji vê awazê bi kul û kederan nekeve; dibê qêy ev awaz ne ji qulên niklê wê lê ji qulên rûhê wê derdikevin, ewqas bi êş û ewqas bi elem e. Şûnde digirî, digirî, digirî, pê re wek peleke bi şikestina payize ketibe dilerize, ji vê rewşa wê ya kambax ajalên li dor kom bûne saw digirin, ew ajalên ji bo temaşekirinê dora qaqnusa bi kula mirina xwe ketiye rapeçane, bi vî halê wî yê naçar kezep li xwe disotînin û ji elemê diqehirin. Belê roja ecela qaqnûs rojeke gelek ecêb e. Awazeke ewqas awarte ber bi asimanan ve berz dike ku bûnewereki ji vê awazê nekeve xeman namine û balindeyê reben gava fêm dike ku ecel pir nêz e baskê xwe diçirpîne diçirpîne, wisa bi tûndî diçirpîne ku ewil çirûsk jê dipekin, piştre agirek bilind dibe ji baskê wî pêl bi pêl, heta ew agir digihêje komên qirş û qalan her tişt ber bi şewatê ve diçe, taliyê qaqnûsa reben û her tiştê din pê re dibe xwelî û di ber de jî, ji nav wî xweliyê çêliyekê qaqnûsê serî nîşan dide.”
Ez mit û mat li çîrokê guhdar bûm.

Di wê navê de Nişabûri bêhneke kûr sitand û li min vegeriya, “Dizanim vêga çi di serê te de dibore; tiştekî wiha ji bo tu buneweri gengaz e gelo, ki dikare bimire û piştî mirine, xwe ji xweliyê xwe biafirine, careki din û careki din her wiha ji xwe bizê, lê ka were vê yekê carek jî ji qaqnusa reben bipirse…”
Bi rasti çîroka qaqnusê ji gotinên şêxê min bêtir tesîr li min kiribû, ew şev bi qelemê xwe yê qamiş runiştim ser kaxizê.

DARA HİKMETÊ

Nivîstin
Ber bi mirinê ve
Tim nivîstin
Her mirinê de heman avzêm
Heman kul

Meşîn
Ber bi tirtilekê ve
Ber bi şaxekê ve
Û vegerîn
Car din
Car din vegerîn

Kiras heman kiras

Hey qaqnusê ji xwe dizê
Têgihiştim bi qêrina te
Têgihiştim raza te
Ax, dara hikmetê
Tu li ku yî
Bêje min
Tu li ku yî

VI

Min dixwest li bin siya biyekê bi lorina bayê xeyalên uxrevî diafrîne, hebûn û tunebûnê li gel çi anasirên di hebûna min de cîh girtiye, kûrahiyeke bê binî de veşêrim, bi axê re ber hewa bikim.
Bêhêz ketibûm, ji ber mija asoyê min dagirtibû, min a pêşiya xwe nedidit; çi li bendî min bû, bayê felekê min bi çi dojêhê ve biavêta, Xwedêyo a li pêşiya min çi bû?
Heqiqeta ku bi giraniya xwe siqleteke mezin li min kiribû, bi qasî gavavêtinekê jî rê nedida, êdî barê li min hatibû kirin, nema dihat hilgirtin.

Li ba şêxê xwe aram bûm, di bin tîrêjên ronahiya wî de rûhê min dihat şûştin, pêl bi pêl sivikahiyê ve diketim; lê ji aliyê din gava bi xwe re rû bi rû dimam, ji bo labirenteke cinan ku mêjiyê min ber bi tevliheviyekê ve dibir de xwe winda nekim, min bi tevahiya hêza xwe hewl dida ku, ji xwe derkevim.
Xwedêyo, wisa dixwiya ku, ez li qêraxa şêtbûnê de diçûm û dihatim.
Wekî şevên dawî, dîsa bi gelek pirsan tevlihev, nav cîhan de digevizîm, gava li min bû şefeq ji daîra xwe derketim, derbasî diwanê bûm, li kunca odeyeke hewliya navîn a qesrê dinihêrt de ber bi pencerê ve vekişîm, li temaşeyî ronahiya zîvîn ketim, li bêpêjniya jiyanê guhdar bûm û ber xwe de her çûm…
Ev oda ku aramî dida min, ji çavan dûr bû. İhtameleke mezin berî min hatibû kişfkirin, çi dibe? Niha sitargeha min bû. Ev mekanê nuwaze çiqas cîheke biyanî bixwiye ji, min weke dildarekî bi xwe ve girê dida, ez bi tevahiya rûhê xwe aîdê vê derê bûm, ev der hêlîna rûhê min bû, bi tim zelaliya xwe rûhê min dida der. Cîheki têra xwe tekûz ! Li vir tu pêwîstî nin bû, di hinek refên li diwaran hatibû sazkirin de min du sê diwanan bicîh kiribû, diwana Ahmed Paşa, Necatî, Qazi Burhaneddîn û wekî din, gava min fersenda xwe didît, ji wan şairan qesîde, xezel û tuyuxan dixwendin.
Wê sibê xan sifra min a taştê bi şahiyeke ziyafete xemilandibû, ev ji bo min ne tiştekî derasayî bû. Di sîniyeke zivîn de, li sehnikên fexfûrî de tov, rûn, hinguv, penirê helandî; kaseyek şorbeya emberî, kaseyek şerbeta uşle; xas û sipi, gulpembe minak qursikên tebeq tebeq hatibûn rêzkirin… Piştî taştê serekxerem, ji deriyê xeremê bi boxçeyekî eswab derket hat.
“Xanê min, siltan û efendiyê min silavên xwe yên germ û van kincan ji bo we şandin, tika kir ku hûn van kincan li xwe bikin.”
Eleqeyê xan nîşanî min dida ji hezkirineke ji dil dihat, ev yek ji peyvên wî, ji helwestên wî bi hêsani xwiya dikir.Ev rêya ku min dabû ber xwe, wî bi xwe digot rêya ronahiyê, pê re heyraniyek çêkiribû. Gelo çi bû min ber bi îmtîhaneke wiha ve dikişand? Kurê wî welieht Şemseddin rojek bi rewşekî wisa re rûbirû bimaya wê çawa tevbigeriyaya, wêrektiyê ku min nîşandabû ewê jî bikaribûya nîşan bida?
Ew roj piştî nîvro xan şande pey min. Kincên cenabê xan şandibû li ser min derketim hizurê; eswabên min ecibandin û ji bin çavan beşişî.
“Min xwest pirtûkxana xwe nîşanî te bidim.”
“Ezê pir bextewar bim ezbenî.”
“Em derbas bibin nexwe.”
Gava ez û xan ji qorîdoran derbas dibûn dilê min di bin qefesa singa min de gurpegurp dikir! Gava pirtûkxane mewzubehs dibû hucreyên nivtarî, bêpêjn û teng ku dişibiyan mehzenên mişt bi bêhna kufiki û şîrêzê de mane dihat bira min, lê gava em derbasî pirtûkxana mezin a xan bûn bîr û boçûnên min ên derbarê pirtûkxaneyan de yekser serobino bibû. Lewra, dimenê li hember min çavê min, di mit û matiyekê de qemişandibû. Ev der ne wekî pirtûkxaneyek, lê bêtir wekî diwanxaneyeke qesrê dida xwiya kirin. Ev dimen, berê hatina min a Beldisê, agahiyên derbarê Kurdan de berevajî kiribû. Ev pirtûkxana ku bi tim dewlemendiya xwe teqez ne karê çiyayiyan bû, piştî ruxîn û hilweşinên Moxolan li welatê rojhilatiyan de pirtûkxaneyeke wisa min qet nedipa. Ev dewlemendiya li hember min bi eqçeyên Osmanî bihata pivandin çend xezine dikir! Bes ev bi tena serê xwe li welatê Kurdan de hezkirin û rêzdariya ji

bo xan dihat nîşandayin xweş rave dikir. Refên bi ihtîmameke mezin hatibûne rêzkirin, ji dara berûyan hatibûn çêkirin; germahî û ronahiya mekanê wisa bi pîvan hatibû weznandin ku, wereq û hibr tu zerar jê nedîtin. Întîzama pirtûkxanê, rêzkirina refan, simetriyek miezzem dihundirand; li ber vê dimenê wekî kerr û lalan heyirî mabûm. Ew serkuttabê ku berpirsiyariyê vê dere dikir, çi kesekî bextewar bû!
Pirtûkên heri hêja bi muntezem, bi îhtimameke mezin hatibûn tesnifkirin: Mînak ku hûn li pirtûka Ûstad Galinos a bi nav Tercemeya Tibê bigeriyana derbasi li hêla rastê beşa weşanên Yewnanî dibûn û ji wir jî bi ali beşên botanik, simya, ajalnasî, sterknasî û tibê ve diçûn, ev dera ku exleb bi berhemên Hipoqrat û Galînos ve hatibû dagirkirin de çi berhemên derbare tibê de hebûya bi hêsanî peyda dibû. We bixwesta Qanuna Îbn-î Sîna peydakira li hêla çepê beşa zimanê Farisî; na we bixwesta Diwana Ebu Nuwas bi dest bixin diviya hûn li beşa weşanên zimanê Erebî biniherin. Nema ku xizmetkarên arikariya serkuttab dikirin, we kijan berhemi bixwesta ji bo bi cîhanina daxwaza we tim amade bûn. Pirtûkên bi îtîna û kedeke mezin hatibûne cildkirin, bi bêhnên xwe yên teybet û xwezayî bi tameke zengarî di gewriya we de dizeliqiya.
Demek bi xilmaşi tevli rûhê salona afyonkirî bûbûm ku ji nişka ve bi dengê xan ser xwe ve hatim, wek ji xewnekê hişyar bibim bi min hat, pirtûka destê xwe destnîşan kir, bi çermê maroken hatibû cildkirin.
“Ev berhema nemir ya Baba Tahirê Uryan e.” got û zêde kir, “Bi Lorî hatiye nivîsandin. Li gel ku Lor birayê me yê şîrhelal in jî, Acem lê xwedî derdikevin û destpêkirina edebiyata xwe pê ve girê didin, bi ya wan Baba Tahir ne Kurd e lê Acem e. Helbet angaşteke şaş e ev, lewra zimanê Lorî çiqas nêzîkî Kurdî be ewqas jî dûrî Farisî ye”
Tiştên min ji helwestên xan derdixist ew bû ku Kurd bi baweriyeke xurt giredayî qewmê xwe bûn. Min helbestên Baba Tahirê Uryan, li Konstantiyeyê ji wergerên wî yên Osmanî xwendibû, nizanim lê şaîr wek helbestvanekî Acem di bira min de mabû. Xan ji pirtûka destê xwe çend çarînek xwendibû, nexasim yek ji wan hêja jî di guhê min de bi tingîniyeke hewrîşimî olan dide:

Gula ku min bi destê xwe çandiye
Û bi rondikên çavên xwe av daye
Ma ev li dergehê xwedê rewa ye
Gula min be, lê bêhn bêhna ên din be

Tu car ji bîr nakim, gava xan vê çarînê dixwend beşişînekî mexrûr di ruyê wî de xwe dida der. Bi texmina min wê demê gula Baba Tahirê di dilê xwe de dişiband welatê xwe, bêhna wî jî dişiband xenîmeteke ku di nav Tirk û Aceman de nedihate parve kirin, nizanim bi min wisa dihat, lewma min li ber vê helwesta wî, xwe li nezaniyê dani.
Bi rastî ji pirtûkxaneyekî gelek balkêş bû, ji kaxizên Bexda û Çînê bigire heta parşumen û papirusên cure cure, tev jî bi nizameke niwaze hatibûn tesnifkirin. Pirtûkên di refên xwe de bi intizam hatibûn rêzkirin, ewqas zehf bûn ku, bihêjmartinê xilas nedibûn. Wê demê ji dilê min derbas bû ku rojek werim heta êvarê hemûyan yeko yeko bi deste xwe bipelînim. Ewqas pirtûkên bi Yewnanî, Îbranî,

Erebî, Farisî, bi zimanê Suryanî hatine nivîsandin; wergerên heri bi nirx; pirtûkên ilmê simyayê, stêrknasî, ajalnasî, hewanasî, erdnigarî, mentiq, tarîx, helbest, pexşan…Tiştê ku hûn li pirtûkxaneyekê bigerin, teqez di nav van refên paqij de wê peyda bibûya. Çawa bûbû ku pirtûkxaneyekî wiha ji destê Timurleng xilas bûbû!
Gava min ev pirs ji xan kir wî ev cewab da min:
"Wekî tu ji dîzanî Timurleng piştî fethkirina Bexda, Cizir, Musil, Tikrît, Mêrdîn û Amedê, berê xwe da Girên Aladaxê, ji wir ber bi Deşta Muşê ve meşiya" got, bêhneke kûr kişand, du re dirêji da, "Wê çaxê bapirê min Heci Şeref difikire, diponije ku ne ew, lê tu hêz nikare li ber artêşa vî segbabî bisekine; ê baş meşandina siyaseteke biaqil e.
Û li ser vê biryar dide ku Bedlîs, Xelat, Muş û wilayeten din teslîmî wî bike, bi vê biryarê diçe mifta van kelehan û deveran pêşkeşi Timur dike. Ligel van hespên Ereb ê esil, hespên lezgin, du segên cins î brak cure, pênc baz, duzineyek caketên seten û qedîfe, di heman hêjmarî de cakêtên Şamî, xaliyekî bi firehî û mezinahiya xwe ku ancax deh xulam bi hev re bikaribin hilgirin, xelatên pir bi zor dest diketin bi xwe re dibe. Timurleng bi vê pêşwazîkirinê pir kêfxweş dibe û îltifatan lê dike, pê re jî namîne, rêveberiya devera Bedlisê û cihên wekî Pasin, Evînk û Menazgirê jî dixe destê wî; wî bi kincên zêr û bi micewheran neqişkirî xelat dike, rutbeyen bilind didê. Lê mixabin heman Timur ji derveyî Bedlisê, welatê Kurdan ji serî heta binî dirûxîne, kevir li ser keviran nahêle, mala Kurdan tevde mîrat dike. Ew qesas her çiqas bapirê min bi van tiştnan xelat kiribe jî, li ber çavê min bes zalimek e. Ji xwe ne tenê dijminê Kurdan lê dijminê mirovahîtiyê ye jî. Ew û bêbavê Hulagu, çend welatê Kurdan wêran û talan kirin, li her du dinyayê de destê Kurdan ê li pêsira wan be."
Min Xanê xweşbîn tu car ewqas behnteng nedîtibû.
Beri ku em ji pirtûkxanê derkevin, xan Bostan û Gulistana Sadi û Muqeddîma Îbn-î Xaldun direji min kir, "Divê tu van xezineyan miheqqeq bixwîni."
Bi rasti min Sadî baş nas dikir, nexasim mamosteyê me li Konstantiniyeyê ji mesnewiyên wî gelek minakan dida. Min çend car dil kir ku mesnewiyên wî bixwînim lê mixabin ji xeynî çend beşeki pê ve biser neketim. Ya seyr, berhemeke bi navê Muqeddime û zanyareki bi nave Îbn-î Xaldun heta wê rojê min qet nebihistibû, şûn de ezê hîn bûbûma ku ev berhem bala gerokên rojavayî gelek kişandiye, lê ji dorhêlên medreseyên İslamî  ve bi dilnexweşiyekî eşkere hatiye pêşwazîkirin, lewma jî wek qedexeyeke nixumandî li ser vê berhemê hatiye pêkanin û li tu derê qala wê nehatiye kirin. Sedema vê yekê ji li gor riwayetan naveroka wê bû. Dihat îdîakirin ku ev pirtûk li ser afirandina însan û xwezayê de tiştên derveyi hedis û fiqhê dihundirand.

Gava em derketin diwanxaneyê, pirsa mêjiyê min mijûl dikir min ji xan pirsî:
"Li min biborin, lê ewqas dewlemendî bi qasi seraya Osmaniya, ev debdebe û şaşaa…"
"Min fêm kir." got, peyva min birî, beşişînek di rûyê wî de xwe da der, bi awirên watedar  li min meyizî, du re li wezirê xwe vegeriya,"Ey Selman, here ji xeremê piştextê minê mirehhes binê."

Demek şûn de, piştext hate hizurê, xan min zehf di meraqê de nehişt hatê ser piştextê devê sindoqê vekir; sindoq piştexteki nava wî bi minaya Frengî û bi zerenderzer neqşê manî, safî miressa bû, teyisîna ku bi vekirina sindoqe re derket holê çavê me qemişand, ji navê xezineyek xwe da der; almast, la'lê yaqut, zimrud, zeberced, eynulhirre, eynulsemak, eynul'at, firuzeyê seylanî, di hucreyen navîn de almastên çil pênci qirati hebûn.
"Mêvanê xoşewîst, tu dixwazi bêtir xezina me bibini." ji min pirsi, wekî ku henekê xwe bike.
Heçî matmayina di rûyê min de xwe dabû der, ji bo bersivdayinê pêwîsti nehiştibû , "Na, na hewce nake." min got.
"Xwedê hez kiribe kelha me gelek qehîm e, lê zeftkirina wî wek heyama Îskenderê Zulqarneyn ne dijwar e û car carna em mecbûrî terkirina cih û warê xwe ji dibin; lê bi izna Xwedê, Çiyayê Modka her ji bo me û xezina me sitargeheke ewle bûye, li wir artêşên dinyayê tev bicivin, nikarin pişta me bidine erdê. Û li ser vê dinyayê tu ax tuneye ku wekî axa Kurdistanê comerd be. Divê tu baş bizanibî ji bo me ê giring ne xezîne û ne jî debdebe û şaşaaye. Ev xakên kaniya dewlemendiyên me, mixabin tim û tim bûye sedema êş kişandina me jî. Ji ber çavbirçîtiya dagirkeran, me xwe her di nav şerî de dîtiye, ta ji heyama Bizansî, Persî, Romayî û ji Sasaniyan wê de welatê me yê bav û kalan tim bûye qada şer, qada dagirkirinê. Di ser şerê Osmaniyan û Sefewiyan de hêj çi derbas bû! Birinên ku di şerê Çaldiranê de vebûn ma hej ji qaşil negirtine, çi şiî, çi sinnî, bi deh hezaran Kurd di şer de xwîna xwe wek robaran tevli xaka reş kirin. Dibe ku em vêga efendiyê welatê xwe bin, lê sibê, sibê ê çibe gelo kî dizane?  Hem ji xeyni kurê min Şemseddin, li ser navê min ka çi heye? Lê ev însanên hejar û belengaz ku li van axa ripîrût kok dane, ê kî li wan xwedi derkeve, kî wan biparêze? Erê aciziya min, naçariya min li vir destpê dike, heke siltanek baweriya wî bi hikimdariya xwe hebe divê wek hikimdareki tevbigere, ji dadmendiya xwe, ji dilovaniya xwe, ji welatperweriya xwe tu tewîz nede, çavê xwe ji derdora xwe re kor neke, her gavê xwe bipîvan bavêje, bi kêmasiya xwe hay bibe, heke piştî min tofan bibêje, baweriya kî pê tê." Û piçek sekini, çavê xwe bixemginî mijand, "Ez sirek bidime te."
"Kerem bike mîrê min!"
"Tiştê herî zêde min diêşine çi ye dizani."
"Çi ye ezbeni?"
"Me Kurdan di nav xwe de yekîtiyek pêk bianiya, tu hêz nikaribû pişta me bida xwarê, lê hezar mixabin ku em tim bi leystika dijminan bihev ketine. Ji te kiri di şerê Çaldiranê de Tirk û Faris xwîna xwe wek robaran herikandin?
"Wisa dixwiye, ji gotinên we divê ez jî ji xwe re par derxim."
"Ax, tu xoşewîst…" got, ez hembêz kirim, "Çiqas nazik î tu, na wisa nefikire, tu par nîne ku tu ji xwe re derxi."
Bes bişirîm.
Carek din heman tiştî pêşniyarî min kir, "Ji bo Xwedê were tu neçe ji van deran, neçe li ba min bimine, di rez û bexçeyên min de zewq û sefa bike, ezê te bi mal û minalan têr bikim, kijan kerîma min bixwazi, bi nikeha şer'î bidime te helal û xweş pê re bizewice, bexçeyê cinnetê ji te re ihsan bikim, were tu neçe."

Demek şûn de min jî destûra xwe xwest û vekişîm daira xwe. Xulamê min ji bo danê nîvro hinek xwarin amade kiribû, semawerê danibû ser menqelê tê de çay dikeliya. Min zehf nexwar, westiya bûm ji bo hinek vehêsim li ser diwanê niviyam, ew dem meraqek bi min re hasil bûbû. Çawa dibû heta wê rojê bi Muqeddima Îbn-î Haldûn nehisiyabûm, ev yek wekî serêşiyekê li min vegeriyabû, lewma min xwest demek berê wê pirtûkê bixwinim, min hew debar kir û bi kelecaneke mezin dest bi xwendina Muqeddîmê kir û bi wê destpêkirin û kelecanê xwendina pirtûkê nizanim çend rojên din berdewam kir. Bi rasti min çiqas dixwend ewqas bêtir bala min dikişand, tiştên pir balkêş dihewand, fikrên neditî, ji berhemên heta wê demê hatibûn nivîsandin pir cuda dixwiya. Tiştên tê de dihat gotin aqilê mirov tevlihev dikir, tiştên heta wê roje di perwerdehiya Îslamî de nehatibû ditin bû. Mirov bi şaşravekirinekê dikaribû heman demî bi kufre ve biçûya, lewma berhemeke diviya gelek pir bi diqet bihata xwendin û wisa bihata şîrovekirin bû. Nêrinên wisa cuda bi pêş dixist ku, bîr û boçûnen mirov bi tevahî hildiweşand, heke hîn hûrgilî ji çavan dûr bihataya xistin, ê bingehên Îslamê yekser bi erdê ve yeksan bibûya. Piştî çend rojan ku min xwendina xwe qedand, encameke balkêş xwe da der, nêrin û angaştên Îbn-î Haldûn û El Tunusî ewqas dişibiyan hev ku kêliyek bi min wisa hat ku, Îbn-î Haldûn di kirase El Tunusî de vejiyabu, yan jî El Tunusî rasterast teqlidkarek bû…

VII

Tevî zivistana sar û seqemê jiyan didomiya, herkes bi karê xwe mijûl dibû, ez jî ewqas diçûm û dihatim tekiyê, êdî ew çûn û hatina bi zehmet ji bo min bûbû karekî asayî; herçî zehmeta rê çi çûyin û çi hatin heta pirê bû. Pira ku kelhê û bajêr bi hev ve girê dida, ji ber ewqas şaxên robaran ku ji nav bajêr derbas dibû jî, ê herî zêde di hişê min de hatibû kolan ev pir bû.
Wekî exlebî rojên zivistanê wê rojê jî mijeke tîr hewayê dagir kiribû, hema bêje çav çavan nedidît. Çiqas nêzi wê malê dibûm, heta ji destê min dihat min lêzê dida xwe, diviya çavê min careke din bi wê çavxezalê neketa, nexwe minê xwe ji wan nêçirvanên qesas nikaribûya xilas bikira. Lê ew roj, ne wekî rojê din bû, bi min wisa dihat ku her dem, bi her tiştî dikaribûm bixapiyama, tirsa min ji vê bû, tirsa min ji xwe bû. Bi van hestan ji xwe bê hay nola gêjeki dihejiyam, tam ji ber wê malê derbas dibûm ku ji nişka ve yekê bimilê min girt û ber bi derî ve kişkişand, “Were, derbas be.” got, ji ber tiştê ku yekser qewimîbûn mat mabûm li gel ku wî dengî xofek avetibû dilê min, wekî ku bîrekî dojehê li bin piyê min vebûbe. Lê nizanim çawa bû û min qet li ber xwe neda û pê re hilkişiyam. Di nav kêliyeki de min xwe li hewliya wê mala ku ê li ser min wekî xeremeki bihata qefaltin de dît. Hêja ez baş bi ser xwe ve nahatibûm ku, bi hirmetê re rûbirû mam, bi çavên tirsiyayi,”Were.” digot, “Netirse, tu hema tenê min bişopîne, li qata jor xanima min li hêviya te ye.” Hêdî hêdî bi ser xwe ve dihatim, lê min hêja jî nizanibû vê rewşê çawa şîrove bikira; dojehek li ber min vedibû yan bihuştek… Her wisa ez li pey hirmetê ketibûm, em bi dirêncekeke kevir re bi jor ve hildikişiyan. Her tişt wisa zû û bi rengekî esrarengiz diqewimî ku têkiliya min û rasteqiniyê di çi asti de seyr dikir ez tê nedigihiştim. Rewş bêtir wek xeyalek dida xwiyakirin, eşkere bû ku ji bo cihkirina tiştê diqewimîn hişê min ji

zelaliyê dûr bû. Ji aliyê din ve sermaya di laşê min de cîh dibû, bi min dida hiskirin ku tiştê diqewimîn ne xeyal û ne ji kabus, lê rasti bi xwe ye. Ew hirmeta ku qerwaşa wê fêlbazê bû, gava min dersbasî oda xanima xwe kir, mêjiyê min di nav tevliheviyekê de çeliqî û ma. Taliyê ji deriyê eninivîsa xwe derbas bûbûm. Ew kesê bi arezûyên xwe odê mişt germ kiribû bi tim bedewiya xwe li hember min bû. Delaliya wê çavê min qemişandibû. Ma min çi hay bû ku ew qemişîn ê jiyana min ber bi dojehêkê ve biajota. Kêliyek tê re derbas bû yan na, bi terqîniya deriyê li xwe werqilim, lê min nizanibû ez çi bikim, çawa tevbigerim, rewşa ku tê de bûm qet rêyeke bi silamet nîşani min nedida, wisa mit u mat ji piya mabum. Vê carê jî dengek ku hişê min ji serê min bir wekî wehiyek li guhê min ket.
"Were!" digot, "Nêzikê min be ey şahê bedewiyê, were kêleka min."
Çawa bi min hat nizanim lê bi wî dengî re wek bi efsunê ketibim, di heman kêliye de arasteyî wê bûm, bi gavên giran ber bi hêla wî dengi efsunî ve meşiyam. Dengek ji hundirê min dilê xwe sar û rûhê xwe aram bigire digot, lê çi gengaz bû, demek şûn de min his kir ku ez pir nêzi wê bûme. Min serê xwe ji ber xwe rakir Û çi bibinim, Xwedêyo wa bihuşt bi tim bedewiya xwe li hember min bû. Bi rastî jî heke ne bi wehma serabeki xapiyabim tiştê li ber min bihuşta rastîn bixwe xwiya dikir. Yek ji şahê horiyan bi rûyên xwe yên bedew a di bin pêçeyeke tenik de veşartî, bi nêrinên dilbijok li min dinihêriya. Ew her du çavên reş î xezalî di bin birûyên qelemî de wek almasta diteyisîn, di cih de dil ji min bir. Li ser diwaneke mişt balgif de dirêjkirî, milên xwe direjî min dikir û "Were." digot, li serî qumaşên hevrîşimî bi desen û figuran neqişandî, kemberek bi tayen zîvîn hunandî newqa wê dişidand, milên wê wek situnen belor, pehniya wê bi xilxalên zêrin xemilandi re, yani bi periyeka ji çîroka xwe derketi re rûbirû bûm; ew periyê ji çîrokan zabû bi awiren mest li min dinihêrî, bi heyranî. Ez bi tevahiya rûhê xwe noqî bedewiya wê bûbûm û di wê aloziya dil de hew min dit ku porên xwe ji bin şerpa xwe ya sor a bi motifên reş neqişkirî li ba kir û xwe bi fesal livand, derziyê ku pêçeya wê ye erxewani digirt vekir û bi vê rengê çavên zeytûnî bêtir xwe dan der. Her du milen xwe ber bi min ve vedikir, bi wateyeke ku were xwe bavêje hembêza min. Taliyê gava ez piçek bi ser xwe ve hatim û ber bi wê ve  meşiyam, wekî di ber xwe re bike pilepil tiştîna digot, min jê fem nedikir, gava nêzi wê bûm, bi pistepist min got ez Tirkim Kurmancî baş fêm nakim, bi vê şaş ma lê di heman demê de bi ser xwe ve hat û ji piya nemîne, runê, got. Ez hema bêgav li cihê xwe runiştim û wê dest bi serpehatiya xwe kir.
Di esasê xwe de ez jî ne Kurd im, Ereb im got, hêvî dikim tu bi Erebî dizanî, belê min got, bi vê biriqîna çavên wê ji bala min nereviya.Zehf neçû mesafa di neqeba me de gelek kurt bû germahiyeke sotîner xwe bi laşê min ve rapeça. Her tişt ewqas zû diqewimî ku, tu fersend nedima li du pirs û pirsyaran bikevim. Ew çax çawa ji hiş çûbûm û çawa radestî arezûyên xwe bûbûm? Yeki wekî min î di nav qalikê xwe de hişk qefaltî, çawa xwe bi hêsaniya cazibeyeke ku laş dilewitîne, rûh noqî robara şehwete dike re xapiya; min çawa xwe bi xwe ji rê derdixist, bêdengiyeke ku bi hilma me difetisî de em wisa bê hay çiqas nêzi hev bûbûn, tiştê ku lê hay bûm bes bi bêhnên sergêjî re jixweçûyin bû, êdî min nema dikaribû li ber xwe bida. Bayê bengitiyê ez dabûm ber xwe, di hembêza arezûyan de dihatim guvaştin, ew dilber bi şehweta xwe çawa ez xistim nav lepê xwe, çawa wisa bi hêsanî ez ji rê derxistim? Îro jî carna wan deman bi bîr tinim û tu wate ji van qewimînan re nabînim, dêmek mirov

carna bi efsunekê dikeve, ew çax bi tevahî ji hiş diçe û ne hay ji xwe dibe û ne jî ji kirinên xwe. Nexwe rewşên bi vî rengî bi tu awayî nahêtine şîrovekirin.
“Dema çavê min bi te ket, eve evîndara ku tu lê digeriyayî eva ha bi xwe ye min got, ji xwe ji xwe re, lê çi heyf, enînivîsa ku min di tevna tevnepîrekî de nêçîr kiribû, tu xoşewîstî çiqas dereng xistibû! Lê min zanibû, bengitiyên min ji hêla evînê ve ewqas xurt bû ku wê rojek tu xoşewîstî teqez derêxista pêşiya min, wekî navê xwe ji vê serwext bûm, çiqas bi derengî ketibe jî va îro ew roj e, roja wisletê ye. Min tu dîtî, min tu dîtî, tu ya min î bes ya min, tu deskeftiya min a heri binirx î, ez te bernadim, qet bernadim; cana min, evîna min, tu ya min î, êdî dinya tev ya min e.”
Wek xwe winda kiribe bi coş bû, êdî xetên rûyê wê, mêyitiya wê bi xêzên xurtir xwe didan der, ji her halê wê dixwiya ku çiqas bextewar û çiqas dilşa ye. Pêçiyen xwe di nav porê min re dibir û diani, serê min hişk bi singa xwe ve didewisand, du re, du re li xwe hay bûm ku çiqas ji xwe dûr ketime. Pê re tevizîneke sar ji pişta min hat xware, lerizîm, xofek avête dile min, di wê kêliyê de yekser jê dûr ketim. Lê di heman kêliyê de ew jî ji cihê xwe çeng bû û xwe gihande min, milên xwe bi stûye min ve aland, lêvên xwe kire lêvên min û wekî ku hilma min biçikîne mêt. Piştî domandineke dirêj ji bo bêhn vedanê lêvên me ji hev veqetiyan.
“Tu Xwedê tu neçe!” got bi vî rengî lavevan ji min kir, “ Tu bi Xwedekî neçe, were li vira ha runê, ez sond dixwum, nêziki te nabim, destê xwe nadim te, ka tu qasek runê, bêhna xwe vede, ji taam û şerbeta min bitehmije, tu ikramê min paş ve venegerine, bes min ji sihbeteke xwe bê par nehêle, binihêre te bi serê çavê xwe dit ku min çi dînîtiyek mezin kir ku te sitand mala xwe, vê baş bizanibe ku min bi xwe ev yek nekir, evîndariya min ev yek bi min da kirin, ji bo Xwedê ka tu hinek li ser vê dewşekê rûnê, ez bi deste xwe ji te re ikraman amade bikim.” got û deri ji pişt xwe girt û derket.
Piştî demeke kurt vegeriya û li hember min rûnişt, ew şehweta ji rûyê wê dida der çûbû, di cihê wê de safiyetek, masumiyetek xwe dabû der, êdî bedewiya wê ne ya ji rê derxistinê bû, tevî ji bo min xetereyek dihundirand. Ew xetên wî yên xurt, xêzên laşên wî yen mê, mêyitiya jê şehwet difûriya çûbû, çavên wê yên saf, kirasa masûmiyetê li xwe kiribû.
“Di îqlimên dijraber de laşê min tim birçî û tim tî ma.” got û direjî dayê, “Navê min Zelixa ye, ji tariyê hatim û bi tariyê ve vedikişim. Roja ku tu di bin wê pacê re diçû û dihatî, ê ku min ji tariyê xilas bike, laşe minê di zindana xwe de rizgar bike evê ha bi xwe ye, min got. Tu ewqas ronahî bûyi ku wek perwaneya li dû findê diket û di agirê wê de disojiya, min jî xwest di agirê te de bisojim, bibim mistek xwelî û bi hewayê bikevim, tune bibim… Xwezi te bizanibûya xoşewîstê dilan, bi her çûyin û hatina te bêhna min çawa diçikiya, singa min çawa ji ber lêdana dilê min hildiweşiya, xwezî tu li hinava min bûya û pê bihesiya! Û min ev hezkirina xwe çawa xwest li hinava xwe gorî bikim, lê nebû, çi bikim nebû.”
Êdî hinek bi ser xwe ve hatibûm û bi aramî lê guhdar dibûm. Jinek ewqas delal û sipehî be û li hember daxwazên xwe têk biçe, li ber tiyîtiya evînê ewqas bêhêz bikeve, min heyirî hiştibû û ji aliyeki ve jî her tişt di bin perda razekê de veşartîbû. Ev jin kê bû, çi karê min li vir hebû?
Ewqas pirs hebûn ku bersiv diviyan….

Di mêjiyê min de gelek pirs li ser hev siwar dibûn ku di wê navê de jinika qerwaş di dest de sîniyek zîvîn, mişt xwarin û vexwarin li deri xist, kete hundir, sînî dani ber me û bi lez derket û piştî demeke kurt dîsa bi sîniyeke din vegeriya, sifra me bi xwarin û vexwarinan xemiland û derket çû.
Hundir bi pizotên di menqelê de sor dikir germ dibû, sifreyeke gelek dewlemend li ber me rêz bibû, di nav sehanên zîvîn û sêniyên çînî de kewên xwedikiri, goştên mî, mast, rîçal, şêrtên leymûnan, mêwên di nav hinguvan de, şerbetên di qedehên belor de, bi ava gul hatine bêhndan…
Û bi vê rengedimenek ji bihuştê xwe dida der.
Qedehek şerbet direjî min kir, "Ewil ji vê vexwe te divê." got, "İştah vedike."
"Na, bila bimîne." min got, "Ewqas xwarin û vexwarin çi hewce dikir, ez qet nikarim bixwim, ewqas zehmet, bi rastî jî hewce nedikir." Min çend li ber da û got, çi karê min li vê derê heye, divê êdî rabim; lê min çi kir û nekir xwe ji destê wê xilas nekir.
"Na, carek ez te naşeynim, tu bi xatirê Xwedekî tenê vê şerbetê vexwî, ka lehzeyek rûnê û li çîroka vê bextreşê guhdar be, sond ji te re tu poşman nabî, tenê lehzeyek guhe xwe bide serpêhatiya min û kengê divê tu here."
Bi rastî min texmin dikir çîrokeke xwe hebe û ev bala min ji dikişand, lê ji aliyê din ve ez pir tetirxani bûbûm, ji ber ku li xwe ewle nedibûm, jinek têra xwe bedew û dilbijokî li hember min bi tevahiya rûhê xwe û dilê xwe, xwe pêşkêşi min dikir, min ê çawa bikaribûya bêtir debar bikira, jixwe êdî fikirîn bi kêrî tu tiştî nedihat, hirmetê dest bi çîroka xwe kiribû jî, ez bêgav mam ku li cihê xwe rûnêm. Di berde qedeha destê xwe nêzî devê min kir û qurtek bi min da vexwarin, tehmeki wê yê xweş hebû, xwesteka du sê qurtên din vexwim bi min re çekir, min qedeh ji destê wê girt û danî ber xwe û ji xwe piştre dawî li vexwarina min nehat.
"Wek her bedewiyekê çolê li koneki derbas bû zaroktiya min, gava bêdawîtiya çola sotîner laşê min disincirand û çermê min hişk dikir, ez hêj di wê temenê zaroktiya xwe de fêr bûbûm ku, enînivîsa wek kiraseke agirîn li mezinan hatibû kirin, li bendî min bû jî. Wekî xwişkên xwe yên mezin, ezê jî di demeke nêz de bizewiciyama, kê qeleneke zêde bida ewê min  wê ji xwe re bikiriya. Dibû ku yekî ji bavê min mezintir min ji xwe re bikira. Bedewtiya min a ji bo bavê min şensek bû, mixabin ji bo min bêşensiyek bû. Ji xwe zehf neajot, qismetê min ji welateki dûr, dijraberî germa çolê, ji ciheke serma û seqemê derket hat. Ev e îro, sedema ku ez li vir im ev qismet e; gava Evdilfettahê Bedlîsî, bi zêrên xwe yên zêrîn çavê bavê min qemişand êdî rêya min, rêya enînivîsa min pir eşkere bûbû. Evdilfettahê Bedlisî ku ji wê çaxê ve merê min e, dewlemendiya xwe deyndarê bazirganiya xwe bû. Bi salan e ku di navbere Bedlîs û Musilê de bi karwanan dide rê û carna bi mehan bi malê nakeve…"
Piştî vê kelamê çi got û çawa direjî da gotinên xwe baş nahêt bîra min. Di wê navê de hêdî hêdî giraniyek di laşê min de vedinişt û ji xwe diçûm, qelpaxen çavên min bi tevizîn vedikişiyan kortikên xwe û êdî min hew dikariya xwe ragirta. Di wê navê de çend seet derbas bûbû nizanim, bes gava min çavê xwe vekir di nav dewşek û nivînên germ de laşê min û Zelîxayê ripîrût bi hev ve alandî dirêjkirî bû, di wê kêliyê de bi min wisa hat ku bi bedena xwe ya sivik ê hêri bextewarê vê cihanê ez im. Û ji wê rojê ve dawî li hevşabûnên me nehat, êdî çavê min ji Zelixayê pê ve tu tiştî nedidîtin, ramusanên wê, mistdanên wê, dev û lêvên wê tim di laşê min de bi seyranê diketin û di qêraxa şêtiyekê de bê çawa xweziya min li rabirdûya min dianin,

rabirdûya bêyî Zelixayê, bêyi wan zewqên ku wê bi min dida tehmijandin. Lê tew min hay nîn bû ku ew zewqên hatûçû min ji bihuşta mina rasteqîn dûr dixist. Ji min kirî heta min Zelixayê nas nedikir her tişt derew bû, di jiyana min de her tişt bi kêmasiyên mezin ajotibû, Zelixayê her tiştî bi min dida jibîrkirin, li ba wê her tişt bi min şêrin dihat, dilşayiya ku di hembêza wê de bi destê min diket car carna berpirsiyariyên min ên giring jî bi min didan jibîrkirin. Di wê navberê de hema bêje min rêya tekiyê ji bîr kiribû. Sedemên ku min ji Konstantiniyeyê kişandibû heta van deran nedihat bîra min, lê tiştek tenê hebû ku tim digihaşt hewara min, ew jî ez çiqas rêya tekkê ji bîr bikim jî, şêxê min qet ji bîra min dernediket.
Zivistana sar ji çar alî ve rêyan girtibû, Evdilfettah Efendi li du bazirganiya xwe diyar diyar digeriya û ez û Zelixayê di xewneke mişt sipî de bihevşabûnan re ji xwe diçûn. Ez bê hay bûm ku bi vî rengê kirêtiya laş, rûhê xwe ber bi êşeke kur ve digindirînim. Niha gava wan dema bi bir tînim ji xwe ji xwe re dibêjim miheqqeq ew roja ku ji deriyê Zelixayê ketim hundir bi afyoneke dîl ketibûm, ew çi şerbet bû dabû min nizanim lê li min wisa tê ku wan şerbeta bi afyon dikir û wisa bi min dida vexwarin. Rûhê min bi çi tesirekê ji xwe diçû ku, piştî şevên bihevşabûnan bi sedaqeteke fedaiyan pê dihatim girêdan. Gava li cem wê bûm çi bixwesta dikaribû bi min bida kirin, bixwesta bi dil û can min canê xwe ji ji bo wî feda bikira; ez wisa ji xwe çubûm ku, guhê min jê pê ve; ji tim gotina re kerr û çavê min ji tim bedewiyan re kor bûbû. Her diçu ji armanca xwe dûr diketim, heqiqet bi perdeyeke reş dihat veşartin.
Jehr carek tevlî xwîna min bûbû.
Ji bo têbigihejim çi bi min hatiye, gerek umrek derbas bûya.
Ewqas kor bum ku hêj têneadigihiştim, deriyê ku min bi xwe ve vedikişand li dojehekê vedibû, têneadigihêştim wê sêva qedexe ya ku ji min re hatibû pêşkêşkirin, îkrama îblis bi xwe ye û min ji cih û warê min ji welatê rûhê min sirgun dike.
Ji min kirî evînekê bextewar dijîm; gava min ji hêla zewqê ve meyla laşê xwe kifş kir, êdî ji bo min tu qedexe û tu asteng nemabû. Pirseke girîng ji alî têkiliya me ve di mêjiyê min de cih nedigirt, lewra tu sedem tune bû ku ez xwe bi pirs û pirsiyaran bifetisînim, tevî tu berpirsyariyek jî min bi xwe re nedidît, bes heqiqetek hebû ew jî em bihev re bextewar bûn.
Me ji hevşabûnên xwe ji xwe re cihaneke taybet saz kiribû, ji me pê ve kes tunebû di vê cihanê de û ne jî tu pirs û pirsgirêk... Gava derveyî vê cihanê bi min biyanî hat, veguheriyam û bi vê veguherin ji çavê şêxê min nereviya, baş didît ku êdî ez ji sedemên ku min ji Konstantiniyeyê heta van deran avêtibû dûr diketim, wek peleke ber bi bayê ketibim tevdigeriyam, belê baş pê dihisiyam ku veguherineke seyr bi min re çêdibû, lê dîsa jî qet bi ser min de nedihat.
Êdî tiştê mêjiyê min mijûl dikir, bes evîn bû, lewma min di dersan de tim pirsên li ser eşqê dikir, êdî her işaret pê baş dida fêmkirin ku dijminek rûhê min bidest xistiye, ev dijmin her ki be wek kurmeki min ji hundir dikurisand û piştî çi hebe hebûna min watedar dike ê tune bikira, ji bo jiyanê pêwîstiya wateyê ji holê rakira; lewma gava şêx derbarê evînê de pirsên min dibersivand bi vê hişmendiye tevdigeriya.
"Rewşa te dişibe kesê li çoleki ji tîna ziwa bûbe."
Ji xwe ev tenê jî eşkere dikir ku şêx ji rewşa min haydar bû, lê çi heyf ezê piştî umreki ancax bi vê têbigihiştama.

“Ji bo xwesteka xwe bi cîh bînî, arasteyî serabê bûyî, gava tu destê xwe bavêji û mistek av je daqurtînî, tê wê çaxê bibînî ku di rastiya xwe de ewê li ber çavê te wisa xweş û xweşik dihat, ne tu tişt e, ne tu tişt, tenê tuneyiyek, tuneyiyek têra xwe bê rehm; divê tu vê baş bizanibi ku, rûhê însana ronî ye, lê tebieta wan tarî! Wext tê, herkes di bin siqleta vê tariyê de dieciqe; rûhê azad ewe ku xwe ji tariyê xilas dike, ji xwe rêya xilasbûnê tekane ye, ew ji tunekirina arezûyan e, divê mirov bûneveriya xwe ji xwestekên laş rizgar bike û wekî robareki azad bi rêya xwe ve biherike.”
Min pirsî, “Wê çaxê divê em vê dinyayê, çi tiştê ku çav dibine heye bi tevahî red bikin.”
Bi bişirîneke manîdar, “Bi vê rewşa xwe dizanî” bersivand, “Dişibî wê rewiyê ku, menzila xwe dizane, lê şopa xwe winda kiriye. Di esasê xwe de evîndar pir nêzi me ye, lê em jê pir dûr êşa veqetînê li xwe dikin û evîndara dijî rûhê xwe û hebûna xwe ji xwe re icad dikin; sotin li me dijwar tê, helbuki evîndar gava bisoje, veguheze xweliyê, tune bibe, bêdawî bibe, wê çaxê wasilê mirazê xwe bibe. Evîndarê rasteqîn tu giringî nade tiştên xwe ji derve didin der, ew noqî behrê dibin, xezina xwe li kûrahiya avê, cewhera di nav sedefê de veşartiye digerin.”
“Baş e lê ya rastîn ne ew e ku, mirov hebûna xwe, bi ê eyan beyan li ber çavan e, yani bi evîndarên dil de cîh digire re, pêk bîne. Bi vî awayî nêzîkbûna wisletê ne pêkantir e?”
“Nizanim min berê gotibu yan na. Gava Qeys li çola xwe bi navê Leyla dinale û bi sekeratan dikeve, Leyla tê cem wî, Qeys bi hatina wî hay dibe û perçeyeke qeşayê digire dibe ser dilê xwe, perçeyê qeşayê, şewata dilê wî piçek aş dike. Di vî halî de, Leyla silav didiyê û ‘Wa ez hatim.’ dibêje, ez Leyla me, Leylaya ku te dixwest, ez im, ez hezkiriyê te me, ez im, ewê ku çavê te û dilê te şên bike, ez ew im, Leyla me.’ dibêje, Qeys bi kêlekên çaven xwe lê dinihêre û, ‘Ji kerema xwe, tu ji ber çavê min rabe here, lewra ez bi evîna te ewqas zêde mijûl bûm ku, min tu ji bîr kirî.’ dibêje.”

## VIII

Rojên bihuştîn di hembêza Zelixayê de wekî kefên devê behran vedimirîn. Mixabin me hay nin bû ku têkiliya me ya qedexe di devê xelkê de bûye benişt. Ji dilşabûnan em ewqas ji xwe çûbûn ku, çavê me ji cihana me pê ve ji her tiştî re kor bûbû. Ne tenê laşê xwe, lê me aqilê xwe jî li ber bayê hevşabûnan de pûç kiribû, bes zewqên evînê me xistibû nav lepê xwe. Hebûna min di hucreyeke tarî de, wek du rûhên cuda di bedenekê de bijîn diqilqilî. Di navbera du hêzên min wek karûbayeke berbixwe ve dikişandin de westiya bûm: Li tekiyê, li ba şêx li rêya heqiqetê vedigeriyam, lê piştî demekê li helina xwe ya evînê, li hembêza Zelixayê di nav mistdan û ramusanan de ji xwe diçûm. Hevşabûnên me rûhê min, mêjiyê min û hemû heqiqetên min li derve dihiştin. Gava wê milên xwe yen belor li stuye min dialand, çawa ji hiş diçûm, jiyan beyî wê çawa bê wate dixwiya! Demên min ên derveyi tekkê, bes bi vê mijulahiyê derbas dibû, di demên vala de min tim wê xeyal dikir, min dixwest demek berê bigihijimê xwe bavejime hembêza wê û pê re di bêdawitiya hevşabûnan de winda bibim. Bê guman ji aliyekî ve jî min rûhê xwe yê lewitî bi telqinên şêx dida şuştin, lê dilê minê tî her berê xwe bi aloziyên mezintir dida. Dilê min wê çawa aş bibûya,

mêjiyê min di neqeba rûh û bedena min de veguhestibû qada şereki, nikaribû tu rê nîşanî min bida.
Bêçaretî janeke mezin dida; tariya li ser min tîr dibû, birinên min xwê dikir.
Ax Zelixa te ez ji ku ditim!
Min tu ji ku dîtî?
Ez çiqas ji rewşa xwe ya derûnî nexweşhal bim ji, niha dîsa pêngavên min, min ber bi alî wê vê dikişine, bi vê nakokiyê tevî mêjiye min ji tevlihev e. Tiştên di mêjiyê min de nav toz û dumaneki de bela wela bûne çawa bi cih bikim nizanim, pirsên bê bersiv li hev siwar dibin; bes dizanim, piştî gaveke din li koşka evîna me, Zelixayê wê min hembêz bike, her deverê laşê min ê niqut niqut bi ramusanan dagir bike û bi vê re jiyînen min, wê careke din xwe dubare bike û ligel tevliheviya mêjiyê min, her pirs û pirsgirek dê li derve bimine. Serê min, li singa yên bi cure cure rayihayan bêhndayî de bi miskên porê wê re aş bibe, hestên şehwetê wekî xwîna kelekel ji damarên min biherike û here…
Tew, heta ez pê bihesiyama ku pê re bîra xwe ya Babîlî ku Harut û Marut tê de ser berjêrî hatibun deliqandin, dikolim wê zehf dereng bibûya.
“Demên xwe heri bextewar his dikim de jî, bê çima tetirxaniyek li dû min e.”
Diyar bû ku ev gazinên min li xweşa wê nediçûn, lê min wê bi vî rengi gazinan, ewqas mijûl dikir ku êdî bi bersivên xwe baş fêr bûbû, dizanibû rûhê minê tevlihev dê çawa aş bike. Bi nîv beşişinekê, “Gerek mirov bizanibe dilê jineke ciwan çiqas tenik e.” dibersivand, “Wekî şuşeyekê şikestina wê rehet e, lê cebirandina wê ewqas ne hêsan e; divê tu destûrê nedî dilê te meyla arezuyên şaş bike, dewlemendiya mezin di vê ava heyatê de veşartiye” qedeha destê xwe direjî min dikir. Gava şeraba di wê qedeha belor de bi devê min diket, hêdî hêdî ber bi serxweşiyekê ve diçûm, her qurt êdî bihuşta xwe ya sexte ta bi ta dirêsand.

“Belê, tiştê tu we’d diki, serê min gêj dike, lê dîsa jî rûhê min bê biryar e ku kijan cîhi ji xwe re mekan bigire? Ev der yan mekanek din, çiqas aidê rûhê min e? Dizanim bi van peyvên xwe te xemgin dikim, lê ez mecbur im li bersivên van pirsên ku mêjiyê min mijûl dikin bigerim, loma divê tu li min negiri. Tevî her tiştî kêmasiyek heye; tu heyî, her tişt bi te re, lê nizanim çawa, kêmasiyek… Li ba te, di hembêza te de gelek û gelek bextewar im, gava ji te vediqetim, ba û bahozên tund mêjiyê min dagir dikin û her perçeyekî mêjiye min di hinava min de ber bi valahiyekê ve digindirînin. Nexwe ev çiye, ê ku lê digerim ne ev be çiye? Bextewariyeke temam heye gelo, car carna xwe zehf nêz his dikim, car carna ji ewqas dûr… Gava ez di hinava te de cih dibim, bi te re dibim yek beden, dibêjim temam, lê şûn de, şûn de çima nikarim bêjim ez temam im… Çima, çima… Kêliyek dema zewqê u ji xwe çûyinek, piştre valahî, valahî û tim valahî… Ma tu ne nivê rûhê min î?”
“Helbet nîvê rûhê te ez im, helbet ê tu lê digeriya ez im. Lê te mêjiyê xwe bi sofîtiyê ewqas mijûl kiriye ku, tu pê kor bûyi; were şahê dilê min! Usifê minê bedew, bes te bi evîna xwe ez sotandim, were tevlî min bibe. Vê baş bizanibe, zana ew e ku destur bide şahî jiyana wî dagir bike. Were qedeha te bi şeraba sor tije bikim, tije bikim da ku hinarikê te yê sorik sortir û xweşiktir bin. Baş binihêre, dostê te yê rastîn saqiyekî delal û ciwan e, lê binihêre û qedeha ji te re pêşkêş dike ji destê wê bigire, bigire û ji

cihana pê xapiyayi xilas be, ew cihana xapinok ku xwe wekî cihana zanistiyê nîşanî te daye, were ji wê cihana têra xwe tengav xilas be, ji şerabê pêşkêşi te dikim vexwe; ewê te ji her pirs û pirsgirêkan rizgar bike! Tu vexwe, vexwarin şolitiya dil zelal dike, vexwe û bi zimanê xwe yê şêrin qala bengitiyê ji min re bike, vîçevîça te şalûl û bilbilan kerr û lal bike. Vexwe têra dilê xwe, vexwe û qedeha bi lêvên te hatiye çêjandin bide min, were xwe daquli lêvên min bike, ez te maç bikim; lêvên te, devê te stuyê te, singa te bi ramusanan dagir bikim."
Bi awirên mest wisa digot û bi peyvên sotiner min ji hiş dibir. Ew çax, wekî ku berê tu car pê şa ne bûbim, radesti wê dibûm. Me wan deman di nav zewqekî mezin de bi hev re derbas dikir. Rojên me di nav bextewariyekî wisa de dihat û diçû. Şûn de demek di navberê de derbas dibû, pirsên min dîsa xwe dubare dikirin, li ser heqiqetê dûr û dirêj radiwestiyam, heta serê wê bi wan pirsa bieşiya, "Te çavê xwe ji rastiyên dinyayê re kor kiriye, ewqas ku êdî nikari xeyal û heqiqet ji hev derxi, rêya ku evîn nîşanî te dide tu çawa nikari, bibini." digot, "Ê rast em in, em heqiqet in, ez im, tu yî, eşqa me, arezuyên me, zewqên em bi hev didin tehmijandin… Ev eşq li diji qedexekirina bengitiyê ye, li dijî redkirina zewqê ye, rastî bixwe ye. Li hember min li hember evîna min ê tu lê digeri dikare çi be, min deryayê pêşkêşî te kiriye, tu li pey dilopê digerî."
Û min destpê dikir, "Bi rastî ez jî baş nizanim li çi digerim, tiştê ku rûhê min bilind bike yan tiştê bi nirxa xwe li hebûna min tiştîna zêde bike, yan ji ê laşê min têr bike…"
"Bê guman dilê min bi te ve hatiye giredan û ji te pê ve tu tiştî naxwaze; bes bizanibe ez evîndara te me. Tu bizanibûya bedewiya te çawa bi bengitiyê rûhê min dagir kiriye? Ev dinîtî ye… Şevên bêyî te derbas dikim di rûhê xwe de bi sêwirandina xeyalên te, şefeqa, ji bêxwew bûnê, çawa ji hal ketî radibim tu bizanibûya! Ji bo yeki wekî min evîneke wisa helbet dinîtî ye, lê ez çawa bikim ev dilê minê reben carek bi te ve hatiye giredan."
Bi vê re êdî ez jî wekî evîndareki, li ser singa wê radiketim û radesti mistdanê wê dibûm. Zelixayê sermestê eşqê, ji aliyeki ve bi pêçiyên xwe, ji aliyeki ve ji bi peyvên xwe laşê min û rûhê min mist dida, evîna xwe bi çarinên Ebu Nuwas dixemiland û ji ber van sergêjiyan, min xwe nedigirt û bi can û rûhê xwe tevli coşa wê dibûm. Xwedêyo, xewnek bû her tişt! Çawa ewqas ji her tiştî dûr ketibûm, evîn çawa ewqas bi hêsani ji dest diket, evîn çawa ji wê bilindahiya ku çav nediwêriyan lê binihêrin de bû dihat xwarê? Xwedêyo, bi wê kawiktiya xwe çiqas ji heqiqetê dûr bûm, li pey arezuyên vala ketibûm, noqî robarên qedexe bûbûm! Bi senemeke wisa dilperesîn re bi efsûnê ketibûm û çavê min tu tiştî nedidit, delaliyeki wisa xwe li min eyan kiribû; çavên wê ji nêrgizan, hinarikên wê ji gulan vekêşiner; lêvên wê hinguv, bejna wê situneki ji robarên şîran , porên wê ji misk û emberan bêhnxweştir…
Qedehên şeraban bi evîna min re dibûn yek, rûhê min ji zincirên xwe vala dikirin. Her qurta di gewriya min de diçû xwarê, bi xwe re robarên rûhê min ji dimiçiqand. Gava ji taqat diketim, gava di qunceki de asê dimam, wekî her car şêx di hewara min de dihat.
"Gava rêya şaş û ya rast tevlihev bibe mirov çawa dikare ji nav derkeve, yan dikare derkeve?"

"Heke kesê di vê rêyê de yeki qenc be, dilpak be teqez Xwedê rastiyê dê nîşanî wî bide." got û çîroka Şêxê Sen'an minak da, "Şêxê Sen'an tevî bi çar sed derwêşê xwe li Yemenê dijiya, pênci sal li Mekkê bi şev û roj taet dike, piştî gava tê welatê Rûma di xewna xwe de dibine ku sijde li senemeke dike. Li ser vê xewnê bi rojan dikeve tefkîrê. Rojek dîsa di nav tefkiran de wisa di rêya xwe de diçe û demek şûn de li ber pencereyeki rastî keçekê fille dibe û di cîh de aşiqê wê dibe. Tam mehek li ber pencera wî tî û birçî disekine, derwêşê wî ewqas nesihet dikin, lê ew guhê xwe nade kesî; li ser vê derwêşê wî her yek bi aliyeki ve belav dibin. Şêxê ku li ber deriye keça fille bi parsa evînê dikeve; dev ji tizbiyê, ji nimêjê û ji helwetê berdide, tenê ji bo wê rûsenemê here sijdê hewl dide. Herçî ew rûsenemê ku şêx ji hiş biribû tu tişt ne xema wî bû. Lê rojek çawa dibe, dibe li şêx tê rehmê û dibê, heke tu ji bo min şerabê vexwî belki ez daxwazên te bi cîh binim. Şêx, daxwaza wê di cîh de pêk tîne û bi têra xwe şerabê vedixwe. Lê daxwazên keçkê bi vê dawî nabe û ji bo mirazê wî bine cih jê daxwaza filetiyê dike. Li ser vê şêx zunnar li pişta xwe gire dide, dibe fille. Lê keçika fille bi vê jî qayil nabe û vê carê jî jê dixwaze ku şivantiya berazan bike. Şêx bêgav dimine vê pêşniyari jî qebul dike û tam salek şivantiya berazan dike. Dawiya dawî şêx digihêje mirazê xwe û gava qedeha şerabê ji destê rûheyvê digire û bi afiyet noş dike; zilfên wê, lêvên wî yên la'l, devê wî yê hoqqe, bi agireki xwe bera dile wî dide, her serxweş e û rûhê wî wekî behreki her pêl dide. Şêxê ku bi vê halê xwe bêtir dikeve eşqê ji xwe diçe û xwe rezil û riswa dike. Hela vêga Şêx di vê rewşê de li cihê xwe bimine. Ew derwêşên ku dev jê berdidin û bi mala xwe ve diçin, ji ali derweşeki din ve têtin şermezar kirin, bi vê hişyariyê bi ser xwe ve tên, tevde ji kiryarên xwe poşman dibin û carek din bi rê dikevîn. Çil roj ji Xwedê lavelav dikin. Piştî çil rojan ew derweşê ku hevalên xwe şermezar kiribû di xewna xwe de Hazreti Muhemmed dibîne û jê niyaz dike ku ji bo şêx şefeet bike; Hazreti Mihemmed jî bersiveke erênî didê û tam di wê kêliyê de Şêx zunnarê li pişta xwe digire davêje û toba xwe dike. Ew keçka rûsenem jî, wê şevê di xewna xwe de dibîne ku bangi Misilmantiyê lê tê kirin . Piştî ku şêx û derweşê xwe bi rê dikevin diçin, ew rûsenemê jî, ji ber xewna xwe dide pey wan, digihêje dibe misilman û li wir temam dibe."
Wisa dixwiya ku şêx bi çîroka Şêxê Sen'an ne tenê pirsa min dibersivand, lê rêya têgihiştina manayê jî nîşanî min dida. Bi vê çîrokê ez hejiyabûm; lewra tu ferqa halê min û ya şexê şivantiya beraza dikir tune bû, rewşa min çiqas dişibiya ya wî! Ji tesira wê çîrokê çend rojek ji Zelixayê dûr mabûm, lê çi bikim li ber arezûyên ku nedihatin zeft kirin dîsa têk çûbûm û taliyê dîsa lê vegeriyabûm. Nizanim çibû wisa ku, derveyî irada min, min ber bi xwe ve dikişand? Wisa dixwiya ku, ez miptelayê bengitiyên xwe bûbûm, muptelayê Zelixayê bûbûm.
Bêxude diqirqilim, ji bo min tekane rê ji vê rewşa dijwar xilas bûn bû, ji bo rizgariyê diviya min rêya herî guncav hilbijarta; rêya evînê, mana evînê. Di murşidiya şêx de diviya ez fêri evîne bibûyama, bi rastî evîn çi ye, rêya ku heta niha min dişopand çi rê bû, evîn çi bû, ez ki bûm, çi bûm, li çi digeriyam, diviya bi van pirsan tev têbigihiştama. Û bi vê re careki din weke rojên berê bi şêxê xwe ve hatim giredan.
"Mirov ancax bi eksa rûyê xwe, bi mana tê de, xwe dide der dikare bi hevahengiyeke bimeşe. Çi şikl be û çi naverok, tiştê di evînê de heye li ser temamkirina hezkirinê ye, herçî di hezkirinê de tiştê nîvcomayî bi evînê temam dibe. Di navbera evîndaran de tu tiştê dijraberî hev namine, her tişt, dijraberi xwe di hebandina xwe de tune dike.

Evîn li ser vê hatiye sazkirin, evîn bi tevahiya xwe, xwe radesti vîna evîndaran dike. Bi ya min evîn, berhevkirina rûhên di nav bera cure cure bûnevaran de hatiye parvekirin e. Ev lihevhatina astbilind, ji anasirên kakilê bûneweriyê de cîheke bingehîn digirin, pêk tê. Em dizanin ku têkiliyeke xurt di navbera wasilbûn û veqetîn, lihevhatin û ji hevbuyina buneweriyê de heye. Her teşe teqez bangi xwe dike, her bunewer bangi ya dişibe xwe dike. Her tişt bi mislê xwe li xwe vedigere; ji xwe hûn jî baş dizanin ku, dijraberi hev xwe ji hev dûr dixin, lê hemahengê hev arasteyi hev dibin. Bi vî rengî heman tişt ji bo rûhan ji derbasdar e?"
Tiştên şêx digot çiqas ji hev cuda bixwiyan jî di esasê xwe de ji heman kaniyê dizêyan; bi çîrokên cure cure, bi buyerên cure cure, bi qewimînên cure cure re di esasê xwe de şêx heman tiştî dubare dikir. Tiştê tênedigihiştim tenê ew bû ku, tevî ez û Zelixa nedişibiyan hev jî, rûhê me çawa neziki hev dibûn? Biponijineki dirêj de min bersiva vê pirsê jî di nav gotinên şêx de peyda dikirin. Yek ji me bangî yekî din dikir, lê em qet ne perçeyên ku hev temam dikirin bûn, bes bi pêwistiyên laş em nêzi hev dibûn nexwe di navbera rûhê me de tu nezikahî tunebû.
Li ba şêx vedikişiyam bêdengiyeki, pê dilê min zelal dibû, ber bi zelaliyeki ve diçûm, "Li xwe vegere!" digot, "Li xwe vegere, ê tu lê digeri bi te re ye." û ev hişyariyên wî ji min re dibû rêber, êdî bi wêrektî li hinava xwe dizivirim û hêdî hêdî fêr dibûm ku her însan gerdûna xwe li hinava xwe dihewîne, jê pê ve ew gerdûn însan bi xwe ye, erê bi saya şêx hedi hedi bi vê rastiye dihisiyam.
"Divê ez behsa Mewlana ji te re bikim, behsa Şems, behsa rûhên cêwî..." digot û dest bi vegotinê dikir, "Şemsê Tebrizî, gelempêri bi kirasê bazirganiyê digeriya, carna jî rûyê xwe dinixwumand, li ciheke nedisekini û bajar bi bajar digeriya. Rojek di nav kirasên reş de li Şamê laqayî Mewlana dibe û jê re, "Ey serafê alema manayê, min bibine." dibêje û winda dibe.
"Çawa?" min pirsi, "Ji alemê xeybê xwiya dibe."
"Na! Ne ji alema xeybê, hema li sûka Şamê bixwe! Lê ev, ne rasthatineke ji rêzê bû, lihevhatineke dîrokî bû, hema bêje, evîna di kakila pîroz de veşartî bû, bi wê rasthatinê xwe dabû der. Ev ji bo her du cenabê pîroz tiştekî pir giring derdixe holê, di neqeba du dilan de birûskan vedide, du dilê pîroz, bi vê rasthatinê li hev hişyar dibin."
Ez bi gotinên şêx matmayi mabûm, yan aqlê min tênedigiheşt, yan ji şêxê min raste rast qala evîna du hemcînsan dikir, tobe estexfirillah, ya Rabbi tu aqilê min bistirînî, "Ya…yanê çawa şêxê min, ev ev her du cenabê qedirbilind evîndarî hev dibin."
"Hiş be!" bi qîreki tund pêyvên min biri, "Te çi ji evînê! Gelo tu bi wê aqile xwe yê negihayi çi dizani evîn çi ye!"
Ez qet ne li benda bertekeke wisa tund bûm. Diyar bû ku ev pirsa min şêx pir hêrs kiribû, demek kurt awirê xwe li ser me gerand, bêhneke kûr kişand û domand, "Hûn, hûn nifşên nûgihayî çi ji evînê fêm dikin, ka hûn pêşi aqilê xwe dilê xwe û rûhê xwe safi bikin, piştre li pey wateya evînê bikevin. Vêga bes guh bidine min ez dawî li axaftina xwe binim, heke hûn bivên gavek piçuk di rêya ilma evînê de biavêjin dêhna xwe baş bidine min."
"Bibore şêxê min." min got, "Min bi nezantî şaşitiyek kir, li min negire û ji kerema xwe tu me ji çîroka Mewlana û Şems mehrûm neke, piştî wê rasthatinê çi bi wan hat?"

"Belê, piştî wê rasthatinê demeke dûr û direj li pey hev dikevin û dawiyê hev peyda dikin. Piştî digihine hev, Şems wê rasthatinê ji Mewlana re wisa rave dike, 'Şêxekî min hebû navê wî Ebubekir bû, di ilma xwe de gelek kemilî bû, lê tiştê ku bi min re hebû wî nedidît, lewma jê veqetiyam û geriyam û ew roj laqayî te hatim, min di çavê te de wê çiruskê dit, te ez kişf kiribûm, tiştê şêxê min bi min re nedîtibû, te ew dit, lewma min got, min bibîne.' Ji xwe Mewlana jî bi ditina ewil re pir dilşad dibe, şûn de li pey dikeve taliyê wî peyda dike û qet dev jê bernade. Ji ber vê têkiliyê der û dora Mewlana gelek zexta lê dikin, lê ew carek ji rêya xwe venagere. Ji xwe ew cenabê mezin, bi kêmahiya xwe dizanîbû, dizanibû aliyeki wî jê veqetiyayibû, lewma diviya dostek hebûya, dosteki bi çirûskên dilê xwe finda rûhê wî pêbixista, cewhera pê re derxista holê. Hazret bi wê rasthatinê baş tegihiştibû ku ê lê digeriya Şems bû. Mesnewiya Mezin her çiqas li ser navê Mewlana be ji di kûrahiya rûhê xwe de rûhê Şems bixwe vedişêre, her wisa mezinahiya mesnewî ne ji çîrokên ku dihewîne tê."
"Ji çi tê şêxê min?"
"Ji evînê te, ji her rêzikekî baş dixwiye ku mesnewî bi rûhekî bilind û bi dile ki mişt bi evîn hatiyê rêzkirin, ji xwe coşeki wisa tunebûya kê li ser vê cihanê dikaribû berhemeke wisa pîroz biafiranda."

"Şêxê min bibore, min baş fêm kir ku di navbera van her du canaban de evînek neqewimiye, nexwe ev evîna ku hûn bilêv dikin çi ye?"
"Te ez baş fêm nekirime! Belê her du evîndarê hev dibin, lê ev ne evîndariyeke madî ye; ew evîndarê cewhera di rûhê hev de bûn. Yani rûhê wan, ji yek cewheri pêk dihat û gava laqayî hev dibin hevudu temam dikin, lewma gava hev dibinin, careki din ji hev venaqetin; dizanin ku ji yekitiya rûhê wan tiştekî mezin ê bizê. Mewlana, heta Şems nehatibû Qonyayê, sofiyeki bi qudret bû, bi îbadeta xwe mijûl dibû, li medresê dersan û li mizgeftê we'zan dida; şêxekê destê wî dihata maçkirin û duayên wî dihate sitandin bû; lê çawa di temenê xwe yê dora pênci salî de rastî Şems tê, ji bo wî zayineke nû diqewime, cewhera di hinava wî de derdikeve holê. Gava Şems tê balê, Mewlana wî dawetî mala xwe dike, 'Padişahê min.' dibêje, 'Li vî derwêşê guhdar be, mala min ne layiqê te ye, lê ez aşiqê te me. Li ser vê, Şems tê li Qonyayê digihiyê û siya Mewlana di ronahiya wî de tune dibe. Bi vê yekê di alema evînê de dengeki bê def û bê pêjn cihanê digire, razê Mewlana digihêje qata asimana. Şems behsa hezkirinê jê re dike, 'Belê' dibêje, 'Tu li alema hundirîn gelek li pêşi, lê ez bixwe hundirê alema hundirîn im; sirrê sirra me, nurê nura me ez. Hezkirinên zindî li dergeha min mirî ne' bi vî awayî Şems ji bo alemekî nû bangî wî dike, ku ne Tirk di xewna xwe de ditibe, ne ji Ereb. Şêxê hosta wekî zanistiyeki nû bidest xistibe her roj li hizura wî dersa dixwîne. Berî Şems gihaştibû dawiyê lê vêga dîsa ji nû ve dest pê dikir; beri Şems bi ya wî dihate kirin, lê piştî wî, wî bi ya Şems kir. Ji xwe demek şûn de jî, dev ji dersê û we'zê berdide û bi eşqeke mezin xwe dide huner û reqsê. Di esasê xwe de ew qendileke ronahiya wî qet kêm nabe, donê wî naqede, gava pêkeve cihanê tev bi xwe re roni bike, nûra wî roj bi roj zêdetir ê bibiriqe bû; lê çirûskek diviya, çirûskek ku wê qendilê pê bixe. Ew çirûsk Şems bû, gava derket pêşberî wî û wê qendilê pêxist, vê care ew bixwe li dora wî agirê bû perwane û ji xwe çû. Gava Hazret ruyê wê dit sirên nepend jê re wekî rojê eyan bûn.."

"Çawa dibe şêxê min, ev tiştekî gelek seyr e û bi tu awayî mêjiyê min nastine, herhal bes riwayet in ev."
Ev kelecaniya min şêx aciz kiribû, "Tiştê ku ji devê min derdikeve, bizanibe êdî ew ne rivayet û ne tu tişt e, heqiqet bixwe ye."
"Bibexşînin, mebesta min ne ev bû."
"Ji aliyekî ve tu jî mafdar î, lê te Hazret baş fêm kiribûya ev pirs nedihatin bira te. Binihêre ku çi dibêje:

'Pêtên evîna min erd û asimanan derbas kir
Di nav pêtan de ji destê min nahêt rûyê Şems veşêrim
Di hembêza min de qewdên agirê dibinî
Ew bi hesreta Şems vediguhezin ava heyatê
Zimanê dil ku dişibe şûrekî, behran bi durr dagir dike
Li dergehê Şems lal bû mit û mat ma'

"Belê Mewlana cewhera bi xwe re bi eksa sûretê xwe, yanê bi Şems re bi mana yê cêwî re derxiste holê. Yanê çi hebe, ji Feyza vê evînê zaye, evîna ku Mewlana nemir kiriye, yanê wekî ku we dit evîn qadiri her tiştî ye, lê ne evîna şaş, ne evîna laş; evîna rast, evîna di kakilê xwe de cewhera Xwedayî vedişere."

Bi hezaran pinpinikên mirî di hinava min de kom bûn…

## IX

"Bi rastî tu baş li ber xwe didi"
"Welleh mîrê min, çi bêjim…"
"Na, na ji bo têkçûyinê xeman nexwe!"
"Ez, ji têkçunê qet ne aciz im, lê eleqeyê ku hûn nîşanî min didin… Nizanim ji bo cenabê we çi ji destê min tê?"
"Ango derdê te ev e, tu ji bo vê xwe aciz diki?"
"Belê ezbeni, min karibûya ji bo cenabê we tiştek bikira…"
"Erê te fêm dikim."
"Bes feydeyeki minê piçûk jî bigihaşta we…"
Bi vê israra min xan demek fikirî û demek şûn de "Min dît!" got.
"We çi dît mîrê min?"
"Ji bo te karek"
"Karêki çawa ezbenî?"
"Tu dikari ji bo min weqeniwîsî biki."
"Çawa nikarim!"
"Nuwaze! Hem roniya çavê min, emê bi te re mihebbetê bikin û hem jî bi "Şerefname" nav, dîroknameyek temam bikin."
"Ev ji bo min rûmetek e ezbenî, lê karekî wisa wê gelek berdewam bike û li vir çi ma ku zivistan biqede?"
"Ango tu dibêji ezê di nêz de ji vir biçim."

"Rêwî di riya xwe de divê mîrê min."
"Ka bila ew çax were, heta wê çaxê ji Xwedê kerim e! Ji xwe ez jî ne bawer im ku bikaribim Şerefnamê xilas bikim, bes em vêga destpê bikin her du çavê min. Destpêkirin gavavetinek e, gava mirov gavek biavêje teqez gavên din wê şûn de bên." Ev tiştekî cuda bû, di jiyana min ya Bedlisê de qonaxeke nû bû. Bi tevlibûna vî karî hem ji pirs û pirsgirêkên di tenêtiya xwe de mêjiyê min dagir dikirin xilas bibûyama, hem jî li ser dîroka Kurdan dê agahiyên teybet bi destê min biketa.
Piştî çend rojan me dest bi xebata xwe kir. Gava me karê xwe diqedand xan vedikişiya û katib dihatin ji bo zêdekirina qopyeyan, tiştên me bi hev re pêk dianî min bi wan dida nivîsandin. Xan tiştê dixwest bibêje ji min re digot, min jî notan distand û tiştê ji wan derdixist bi katiban dida nivîsandin. Min bi Farisî digot, lê tiştên ji devê min derdiketin, di heman demê de li Tirkî, Kurdî û li Erebî werdigeriyan û bi vî awayî di heman demê de bi çar zimanî dihatin nivîsandin. Piştî vegera min a Konstantiniyyeyê ezê hîn bibûma ku nivîsandina Şerefnamê hatiye taloqkirin û bi ya ku ez dizanim, kurê xan, Şemsedin serê xwe pê neêşandibû û ji xwe ji bo hîn bibim ku Şerefxanê kurê Şemsedin vê berhemê wê bidomanda yan na jî, umrê min têrê nekira. Min hêvî dikir ku were qedandin, lewra xan vê yekê wekî wezifeyek ji xwe re didît. Tim digot, em ewqas mileteki qedîm in û dîroka me ewqas dewlemend e, lê ka tu lê binihêre ji bo peyitandina vê yekê li holê tu tiştekî nivîsandî tuneye.
Katip karê xwe çawa ewqas xweş û zû dimeşandin, bi rastî jî ez heyirî dimam. Notên ku dihatin qeydkirin bi çar zimanî ji xan re dihatin xwendin, xan bi baldarî guhdar dikir û ji guhdarkirina her peyvî kêfek distand, di cîhên pêwîst de, midexele dikir, hin cihan sererast dikir.
Berî em dest bi beşa ewil bikin, xan girizgaheke dirêj bi min dabû qeydkirin: "Dîroka Kurdan bi qehremanan tije ye, ji van yê heri tê nasîn Ristemê Zal e. Xan gava navê Ristem bilêv dikir wekî perdeyeke huzne ji rûyê wî derbas bû, "Tu dizani." got, "Divê ez çîroka Ristem û Suhrab ji te re bêjim, ku ev çîrok ji çîroka Oidipos jî dilsotînertir e."
Helbet diviya ev çîrok nehata qeydkirin.
"Rojek Ristem li hespê xwe siwar dibe û derdikeve nêçire.Piştî demeke dûr ji bo hinek bêhna xwe vede li bin darekê radikeve û di xew re diçe. Gava hişyar dibe ku hespê wî ne li cîhê xwe ye, lê dide bi du hespê xwe dikeve û heta welatê Semenganê diçe. Li vir ji ali padişahê Semenganê ve bi şahiyeke geş tê pêşwazikirin, ji bo peydakirina hespê wî çi imkan hebe seferber dike. Şeva ewil, Ristem bi xwarin û vexwarinê ji hal dikeve, bi tesira şerabê serxweş dibe û xwe davêje nav cihan. Gava dibe wextekî şevê, keça padişahê Semenganê, bi bendeyekî xwe re tê dikeve oda Ristem, Ristem hew dihise ku mêvanên nepayî li ser serê wî ne, yekser ji cîhê xwe çeng dibe û dipirse, 'Di vê şeva tari de çi karê we li oda min heye, hûn in in, yan cin in?' Herçî Tehmîne bû bi bedewiya xwe ji xoriyan ji derbas dikir, ji berê ve xistibu serê xwe ku Ristem bi dest bixe, bi hezar naz û işweyan li ber dilê Ristem dide û ji bo ditina Rehşê jî soz dide. Li ser vê Ristem baweriya xwe pê tîne û dotira rojê wekî ku soz daye Tehmineyê ji babê wê dixwaze û bi destûra Xwedê tova xwe di mêrga Tehmîneyê de diçine. Lê hezar mixabin ku bi vê re hibra çîroka herî bi elem li rûpela dîrokê dinuqite. Piştî demekê wekî Tehmîneyê soz dabû Rahş tê peyda kirin û dema

vegerê tê, Ristem careke din ber bi rêya Zabilistanê ve dikeve. Tehmîne piştî neh mehan, zarokekî wekî goga agir tîne dinê. Tehmîne di cih de muhreya ku Ristem dabûyê bi mile wî ve dike. Ev lawê bi navê Suhrab wekî babê xwe pir zû dikemile û hêj di deh saliya xwe de xorteki agid jê derdikeve, dibe palewanekî xurt û êdî kes newere pê re şer bike. Suhrab rojek baş hay dibe ku naşibe tu birayê xwe, li diya xwe pirsiyaran dike, ewqas zorê didiyê ku dayika reben mecbur dimine li xwe mikur bê. Suhrab gava hîn dibe ku kurê Ristemê Zal e, bi xwe bi xwe biryar dide ku, babê xwe bîne ser texta Îranê, her wisa guh nade tembiya diya xwe û raza xwe li der û doran eşkere dike. Zehf tê de naçe û Efrasyab jî ji vê rastiyê haydar dibe û di cih de li pey dek û dolaban dikeve. Mebesta wî ew e ku bi destê Suhrab ji Ristemê Zal xilas bibe. Ji xwe Suhrabê ku plan dikir Kawîs ji text bixîne, pê dixape û tevî bi deh hezar leşkerên xwe tevli artêşên Efrasyab dibe. Her wisa Suhrab di demeke kurt de li welatê Îranê kevir li ser keviran nahêle. Gava Kawîs pê dihese ku palewanekî bê manend dest bi dagirkirina welatê wî kiriye, dixwaze yekser Ristem ji rewşê haydar bike; lewra ji Ristem pê ve kes nikare wî ji vê rewşa kambax xilas bike, hema zûzûka nameyekê ji bo wî bi rê dike. Ristem gava namê distîne şaş û metel dimine. Difikire ku di nava Tirkan de yeki wisa palewan ne mimkin e derkeve. Kêliyek bêhna xwe vedide û kurê xwe tîne bîra xwe. Li ser vê bangawaziyê piştî haziriya xwe temam dike, ligel siwariyên xwe tevli artêşa şah dibe. Dema ku artêşa Kawîs û Efrasyab li hember hev tên… Xwedêyo deşteke bê seri û binî tevde leşker! Wekî ku erd û asiman mişt bi peyadan û siwariyan hatibe dagirkirin. Berê ku her du artêş bi hev bikevin, qada şer bi pêşandana her du serfermandar Suhrab û Ristem re geş dibe. Her du şêr derdikevin hemberi hev, gava êrişî hev dikin wekî du çiyayên girs li hev biqelibe li hev dikevin. Suhrabê ku ji hêza li hemberî xwe heyirî dimine, demek li babê xwe difikire û valahiyeke mezin di hundirê wî de vedibe. Dixwaze kesê li hemberî xwe bi hesreteke mezin hembêz bike, xwîna wî lê dikele, rûyê wî sor dibe û bi pirsa ‘Tu Ristem î, Ristemê ji mala Samê Neriman i tu?’ bang lê dike, lê tu li vê bê siudiya kambax binêre ku Ristem vê rastiyê qebul nake û piştre şereke wisa di navbera wan de diqewime ku heta wê roje li ser rûyê erdê tu îbadê Xwedê pevçûneke wisa nedîtiye. Ewil bi rima diçine hev, heta ku hesinê serê wan dirije, piştre birûskên ji şûrên wan diçûrisin asimana dagir dike, piştre bi gurzan êrişi hev dikin, heta ku gurzê wan ditewe, hespê wan diterpile, zirxê wan ji hev dibe û piştre tîra dadiweşinin û heta peykanên li ser tîran tesira xwe li ser yekî ji nîşan nade, vê care bêhêvî li kembera hev asê dibin. Gava tarî dikeve û ji westa bê hal dikevin, ber bi alî artêşên xwe ve vedikişin û her du jî li qeweta hev heyirî diminin. Dotira rojê Suhrab dibîne ku xwîna wî wekî roja ewîl lê dikele û debar nake, careke din dipirse ‘Tu bidî xatirê Xwedê were ji min re bêje, tu ji kijan êl û eşir î, bav û bapirên te kî ne, tu ne Ristem î gelo?’ Û ji xwe ya ku Xwedê nivîsandiye kes nikare xirab bike, Ristem wekî besireta wî hatibe girêdan careke din vê rastiyê napejrine û vê carê şerekî dijwar di navbera wan de diqewime. Di vî şerî de ligel fersenda kuştina Ristem bi destê Suhrab dikeve jî Suhrab vê yekê nake, dibe dotira rojê vê carê Suhrab hinek westiyaye û piştî pevçûneki bê çawa dibe dibe Ristem ji nişka ve bi hemleyeke Suhrab ji axta wî dixe û bi şûrê xwe singa wî diqelêşe. Suhrab di nav lehiya xwînê de çavên xwe bi xemgînî li ser Ristem digerine, ji bayê felekê gili û gazinan dike, li qedera xwe lomeyan dike. Jê re qala bavê xwe dike, çawa umrê xwe bi hesreta hezkirina wî bavî derbas kiriye

dike; ji bo bavê xwe derxîne ser texta Îranê îro li ser vê qada şer pê re pevçûne dike û heyfa xwe tine ku ji vê kêliyê pê ve li ser dinyayê tu ava ew bixwe nemaye ku bi çavên sax tenê carek bavê xwe bibîne. Lê hay nîn e ku kesê bi şûrê xwe singa wî qelaştiye babê wî yê helal bixwe ye û didomine, 'Tu vê baş bizanibe ku babê min Ristem, wê rojek heyfa min ji te bistine, baş bizanibe ku ev heyf li erdê namine. Û bi vê yeke re, bi bilêvkirina Ristem re, wey Xwedê! Qêrineke çawa bi erd û asîmanan ve dikeve, qêrineke nola Çiyayê Elbiruzê li ber hilbiweşe, qêrineke wisa ku wek sûra İsrafil gora biqelişîne û miriyan li pêş xwe bixe… Ristem li ser laşê kurê xwe, bi van peyvên wî kerr û lal ji xwe diçe û hema wekî cendekekî li ser bedena kurê xwe ve dikumişe, bi ax û nalinan dev û rûye xwe vediçirine, singa xwe dide ber gurmistan, xweli li sere xwe dike… Ji hêla din ve, Suhrab bi van yekan rewşa xedar fêm dike, têdigihêje ku kujere wî, babê wî yê helal bixwe ye, dev û rûyê wî di nav xwînê de, muhreya bi singa xwe ve giradayi derdixe direjî Ristem dike û dibêje gava ji bo vî şerî derket hat, diya wî vê bi mile wî ve gire daye û careke din dest bi lome û gazinan dike, tevî ewqas pirsan, çira nasnameya xwe jê veşartiye? 'Lê dîsa jî' dîbêje, 'Dîsa jî ez bextewar im ku  bi çavê dinyaye tenê carek be jî min babê xwe dit, ev bextewari…!' Bi rastî jî, vê çîrokê ez girî kiribûm; lê bi min wisa dihat ku mebesta Xan ne tenê ev bû…
Gava şêx, "Neynika rûh divê zelal be, rûhê neynika wê ne zelal be, di bedenekê de heps dibe û tê de bê armanc digere." digot, dibê qey rewşa min rave dikir.
Mixabin ez derwêşeki layiqê şêxê xwe ne bûbûm, ji min nehatibû, bibime mêşehinguvek û ji kulilkên xas bexçeyê wî dilopek hinguv bimêtim. Ji rêya kemilandinê ewqas dûr ketibûm ku, tehmijandina mêwên qedexe bûbû sedema êşen min ên herî giran, di pirsyariya wîjdana xwe de birindar ketibûm, wek şerwanekî westiyayî, qenaeteki wisa bi min hasil bûbû ku, wek derwêşên kefareta gunehên xwe ancax şûrê tuj li ser singa xwe bike û bedena xwe di nava caxekî hesini de heps bike, wê ji heywana nefsa xwe, heta hetayiye bi vê awayî dûr bixine. Lê ez çi bikim ji, ji heqiqeta dinyaya madî xilas nedibûm, aliyeki min aidê vê dinyayê bû, ev rastî dev ji min bernedida.
Dotira rojê rasterast çûbûm ba Feridunê Nişaburî. Hêviya min ew bû ku, cendeka di rûhê min de digevize bivejîne, bi vê heviyê min xwe avetibû deriyê wî. Gava destê min di nav destê xwe de qufiland ji xwe ronahiya min jê dipa bi deste min xisitibu, "Binihêre." got, roniyên ji çiyayan diçirusîn destnîşan kir, "Berfên ku bi mehan cihana me dorpeç kiribû, li bin tîrêjên rojê çawa dibiriqe, dihele, erdê dimijîne. Erda ku piştî demekê wêneyeki rengîn pêşkêşî me bike, xwezayê bivejinîne, tirtilan ji qozeyê xwe derxine û ji ser rûyê pelan bişemitîne, pinpinîkan bifirine û bi reqsê bixe, mêş û kêzikan li ser kulilkan bigerine, xezalan ber bi qêraxa robaran ve bimeşîne… Ev çerx heta me bi vê meşandina xwê ya muezzem fêr bike, xwe ewqas dubare kiriye, bi dubarekirina vê rengi, sirrê xwe ji me re ewqas eşkere kiriye ku, êdî kêm tişt maye ku em di xwezayê de kifş bikin. Bi dubarekirina ewqas mirin û vejînê re em bi xwe, bi hebûna xwe, bi heqîqeta xwe jê hay bûn û em hay bûn ku piştî mêwê qedexe perda şermê çiriyaye û guneh wek mirateke bav û kalan xwe li me girtiye. Ma çilekêşên bi evîna Xwedê dişewitîn, ne ji ber vê, êşê ji xwe re rêheval kirin. Li vê berfa ha binihêre, çawa dihele û ji binî hezar mucizeyên Xwedê zil dide. Belki tu ji

mecbur mayî bi zivistaneki dijwar re bijî, wek çilekêşeki bi şûra êşê hatî imtihankirin, lê baş bizanibe ku rûh zivistana xwe jî, bihara xwe jî, bi xwe bi xwe diafirine.
Êşên ku hinava min dikurisandin bi vê hevditinê hinek aş bûbû. Gava min destûr xwest, na got, were ez oda xwe ya xebatê nîşanî te bidim; ji bo min cîhek pir teybet e. Min ev pêşniyar bi kêfxweşî qebul kir. Em derbasî odê bûn, ewil dolaba tiştên xwe yên teybet tê de cîh kiribû, vekir, jê pirtûkekî qalind ku, cildê wî hêj nû hatibû lêkirin derxist û direjî min kir, a ji te re, got, dixwazim ewil tu bixwîni.
Bi rastî min ji çavê xwe bawer nedikir! Şaîrê mezin, berhemê xwe yê herî binirx, qedandibû û va vêga di destê min de bû, ezê bibûyama xwendevanê wî yê ewil. Di bin çengê min de pirtûkekî bêhna hibrê jê difurî vekişîm daira xwe û ketim nav xwendineki nuwaze.
Hoste di vê mesnewiya xwe de ji bo mirovahîtiye derseki xweş dida, nexasim ji bo min, ji bo wekî minê ku pêwîstiya wê ji rêbereki re heye berhemeki gelek bi nirx bû. Di dewreke inziwayê de rêwîtiya rûh vedigot. Di vê inziwayê de çil roj, miqabilî çil rawestgehên rûh dikir. Rûh di vê rêwîtiya hîşî de bi şev û roj bêrawest diçe. Ji bo êşa dilê penabereki çareser bike, piştî çar melayiketê mezin, ji Cebrail, ji İsrafil, ji Mikail û Ezrail; melayiketê ku gerdûnê hildigirin temsil dike, ji komên stêrkên sabit, ji lewhê mehfuz, ji qelemê, ji cinnetê, ji dojehê, ji asimana, ji rojê, ji erdê, ji çar anasirên bingehîn, ji çiyayê keştiya Nuh, ji behrê; ji madenan, ji nebatan, ji heywanên hov, ji balindeyan, ji rûhan, ji mirovan; ji şeytan, ji Hazreti Adem bigire heta Hezreti Mihemmed ji hemî pexemberan, ji goşt û hestiyê bigire heta têgihiştina aqlê, diçe her deriyê, ji her kesi û ji her tiştî arikarî dixwaze û dawiya dawî li rawestgeha dil û rûh radiweste li wir jê re wisa tê gotin: Taliyê, heta gihaştî qêraxa behra min te beyxude li tim kainatê geriyayi. Hey bê mejiyo, tiştê ku tu lê digerî bi te re ye, ê ku xwe jê vediqetine dîsa tu bixweyî, vêga bikeve vê behrê û tê de tune be!”

X

Bedlîs amadehiya biharê dikir û hêdî hêdî ber bi rojên xwe yên geş ve diçû. Xwezaya ku li ser bajêr tesira xwe ya veguherinê nîşan dida, li ser têkiliyên min û Zelixayê de ji nîşan bidaya. Lewra berf diheliya û pê re jî rêyên qefaltî vedibûn, ev ji nîşan dida ku vegera mêrê Zelixayê pir nêzik e. Ji xwe zehf derbas nebûbû ku Evdilfettah Efendî derket hat, bi vegera wî re di têkiliya me de qonexeke nû destpê kir, êdî hevditinên me di şert û mercên pir dijwar de, bi hezar zehmetî pêk dihat
“Ez ditirsim.” digot Zelixayê, “Zehf ditirsim, ew êdî ne a berê ye, diyar e ku ji min ketiye gumanan! Ditirsim zehf ditirsim! Dilê min, min ji vir bibe, em ji van deran herin, min bixwe re bibe, bibe Konstantiniyeyê, ez di bextê de me, min bibe, min bike cariya xwe, bike bendeyê xwe, bes min bibe, li vir bi tena sere xwe nehêle.”
Ev rewş berpirsiyareki giran li min dikir, lê min nizanibû ez çawa bikim, heta wê çaxê ev tişt nehatibûn bîra min tevdireki bifikrim. Heçî Zelixa bû di tirsa xwe de mafdar bû, lewra mêrê wê bazirganekî dewlemend bû, der û dora wî fireh bû û tiştê ku me bi çavkoriyeki dikir, dibe ku heta guhe wî ji çûbû. Bi rastî ev ji bo min ne pirsgirek bû, lewra, parêzgerekî minê bi qudret hebû, ez di bin himaya xan de bûm,

lê rebenê Zelixayê tu çara wî tunebû û heke ku di gumana xwe de mafdar bûya, serê wî di belayeke mezin de bû û min nikaribû çavê xwe ji vê re bigirta, ax Xwedêyo ev pirs wê çawa safî bibûya…
“Ka em hinek bisekinin.” min bersivand, “Heke bi rasti ji tu bi talukeyeki cidî hisiyayî emê li çareyeki binêrin.”
Êdî wekî berê ji hestên xwe baş ne ewle bûm, min nizanibû bi dilekî evîndarî ji Zelixaye hez dikim yan na. Lê ev yek min ji ber berpirsiyariyên min xilas nedikir. Tawanek ku kefareta wê bihata kişandin hebûya; heke sûcek hebûya, ez jî şirikê wê sûcê bûm, min nikaribû xwe jê bidaya alî. Min nikaribû bi hêsaniya imtiyaza xwe tevbigeriya.
Mêjiye min tim bi vê pirsê mijul bû; li çareseriyeki digeriyam; difikirîm, difikirîm û tu rê li ber min venedibû, tu çareseriyek…
Bi vî rengî çend roj derbas bû nizanim, dîsa di nav taswasan de diqirqilim û çawa bu nizanim, tiştekî ecep qewimi, şêx ji bo ku min bibine, xizmetkareki xwe şandibû pey min, deqqeyek ji nesekinim û çûm dergeha şêx.
“Kerem bike şêxê min.”
“Runê.” got,“Piştî gaveki din ezê tiştekî nîşanî te bidim.”
“Belê şêxê min.”
“İhtimaleke mezin, tiştê ku tu bibini dê li xweşê te neçe.”
Nizanim lê her tişt ber bi rewşeke nepend ve diçû û cara yekem bû ku gotina wî xofek avetibû dilê min, ez hema di cihê xwe de diqirqilim û ji aliyekî ve jî min pir meraq dikir ku wê çi nîşanî min bida, demek berê perda sirrê rabûya û min jî ji xwe re bêhneke rehet bistanda.
“Divê tu bi qewet bi.”
“Amade me şêxê min, çi tişt be bila ji we were, min qebul e.”
Û li ser vê şêx işaret kir ku min bibin. Heta cihê ku em herinê Îsmail refeqeti min kir. Perdeya sirrê her diçû tîrtir dibû. Piştî demekî em li ber deriyeki sekinin û hem alî wir di cîh de mit û mat mam, lewra ev der mala Zelixayê bixwe bû; bi ve têgihiştinê ricfekî sar ji pişta min avête xware. Êdî em çawa ji derî derbas bûn, Îsmail min çawa bir oda me ya hêlîna evînê; oda me ya şahidê rojên me yên bihuştîn… Zehf rê de derbas nebû û di nav kirasên reş de jineka ziravok, rûyê wê bi pêçeyekê nixumandî anin pêşberi me. Her diçû mêjiyê min bêtir tevlihev dibû, ez di nav pirsan de digevizîm. Di wê navberê de jineke din rûyê wê ji bi pêçeyeki nixumandî kete hundir, bi lingên xwe yên wekî şaxekî zirav, ber bi min ve meşiya û ji nişka ve derziyê ku pêçeyê xwe digirt vekir û hêma di wê gavê de nemabû ku ez ji dil biçûma. Lewra ya li hember min dişibiya mexluqeki eceb! Ji xwe gava têgihiştim ku ew Zelixa bixwe ye, hema di cih de ji hiş ve çûbûm. Xwedêyo, ew xoriya bedew di navbera çend hefteyan de çawa ketibû vî halî? Ev, ev çi karesat bû, ew perî çawa bûbû mexluqateki tırsnak, aqil û hefsela min tênedigihişt.
Ew kêli, ew kêliya biçûçik, di jiyana min de hilweşineke wisa mezin pêk anibû ku… Çawa careki din hatibûm hizura şêx, kî ez anîbûm…
Şêx hat û ji min xwest ku li kêleka wî runêm û bi işaretekê Îsmail şand derve, piştî demeke İsmail legenek anî li ber min dani, min tu wate ne dida tu tiştî û her diçû her tişt ber bi nependiyekê ve diçû. Şêx wê legena bi terhiyeki hatibû girtin destnîşan kir û got “Terhiyê rake!”

Min  itaet kir û terhî ji ser legenê rakir, lê bi dimenê rû bi rû mam re dilê min li hev ket. Xwedêyooo, çi tiştên ecep bûn di nava legenê de, sefre, kesekê xwînê, gilêz û hwd.
“Çira berê xwe jê didî alî?” got Şêx, ancax bi vî dengî re bi ser xwe ve hatim, “Ewê ku te dît heta berî demekê li ber çavê te bedewiya herî mezin dixwiya baş lê binihêre ew delalî ew sipehitî, ew bedewîtî di çi halî de ye, tu baş lê binihêre.”
Nizanim ez kengê bi ser xwe ve hatim, gava ew dem tê bîra min dengê şêx hêja ji bi tinginiyeki zengarî li guhê min olan dide. Dû re Şêx destpê kir: “Ji we kirî li cihekî wekî Bedlîsê tiştê we kir ê ji we re kâr bimaya? Ma Xwedê qet hiş û mêjî nedaye te, te çawa bîr nebir ku tiştekî wisa veşartî namine! Neyse ka vêga em dev ji vê berdin. Herhal tê bîra te ku tu çawa ji xwe dûr ketibû û min çawa hewl dida ku ez te li te vegerînim; ew armancên ku te ji Konstantiniyeyê avêtibû heta van deran, ji bîra te çûbû! Te çawa fêm nedikir ku tiştên te ji rê derdixistin wê ji bala kesi nereve, çawa çavê te ewqas kor bûbû? Herçî êdî tu giringiya van nema, vêga tu meraq diki ku ew tiştên seyr ku te bi serê çavê xwe ditin çawa qewimîn.
Rojek mêrê wê hirmetê li deriyê min xist. Wisa bêçare dixwiya ku dilê min pê şewitî, di rewşekî pir dijwar de bû, nizanibû çi bikira, ji min arikarî xwest. Û dest bi çîroka xwe kir, ji xwe tiştê ku tu jî baş dizani, te û jina wî çi kiriye û ne kiriye yeko yeko ji min re got. Digot ku, di vê rewşê de divê bibe qesas, destê xwe bi xwîne qirêj bike, lê nikaribû bikira, bêçare bû, dixwest rêyek nîşanî wî bidim. Û me çareseriyeke wisa peyda kir. Me çend rojek ji mile Zelixayê xwîn stand,  mishil pê da vexwarin û me wisa kir ku demek adet bibine, bi vî awayî wê berdêla gunehê xwe dida û wekî findekê diheliya, bejna wê yê serwî, her diçû ditewiya, hinarikên wê yên sor li pelên payize vediguheziyan, ji xwe encam tu bi serê çavê xwe dibînî. Ew tiştên ku xwaribû, dermanên vexwaribû û xwînên ji damarên wê hatibû vekişandin, va tev di nava vê legenê de kom bûne, vêga baş li wan binihêre, baş binihêre ku tiştê te dixwest, tiştê tu bi hesreta wê dişewitiyayi hemû li ber te ye, tiştê ku te dixwest wa li ber te ye. Ev legena ku heta dev tije ye, li ber te disekine, ka carek lê binihêre; tu aşiqê vê pisîtiyê bûbûyi, wekî ehmeqekî li pey vê pisitiyê ketibûyî, tu ji bo vî gûyê hanê ji rê derketibûyi”
Û bi her gotineki erd li bin piye min diqelişiya û ez tê re diçûm xware, Xwedêyo ez çawa li ber xwe diketim û çawa di bin şermekî giran de dieciqîm… Wê demê li hizura şêx de mit û mat mabûm çiqas dirêj ajotibû, wekî sed salan bi min dihat û çawa dawî lê nedihat, çi êşkence bû, çi êşkence…
Min dersa xwe sitandibû. Demên, min li wir, li hizura şêx derbas kiribû wekî sed salan bi min dihat. Min tu rê neditibû ku li rûyê kesî binihêrim û tu cihek tunebû xwe tê de veşêrim.
Vê dersê baş nîşanî min dabû ku, însan ne tenê ji goşt û hestiyê ye, lê tiştekî jê zehf zêdetir e û zehf wêdetir.
“Pizotên sor ku di sindana heddadeki de teşe digirin bîne ber çavê xwe, çi ferqa me jê heye, her derbê ku em dixwin di esasê xwe de cewhera di kakilê me de, teşeyê heqiqî bêtir derdixe holê û tu xwe amadeyî êşan bike ku ewê dawiyê cewhera di kakilê te de veşartiye derxe holê. Vêga te tenê destê xwe ê ku ji te re belayan biainiya şuşt, di esasê xwe de dijmine ku te bişewitine wekî siyekê li dû te bû, vê qet ji bîr neke. Jina

Evdilfettah xwest mirazê xwe ji te bistine, lewra eşqa te dilê wê wekî pizotê agir dişewitand. Sedema bêsedeqetiya wê çi dibe bila bibe, ev yek tu car nahête efûkirin. Di wê kêliyê de çawa bû nizanim, min xwe li dawa şex girt û lavayan jê kir, "Min çi kir, min çi kir şêxê min, ez layiqi dergehê te nebûm, min efu bike, ez layiqê dergehê te nebûm, ji niha û pê ve tu xêra min ji kesi re tune ye."
"Kurê min, bi ser xwe ve were, bi ser xwe ve were; ka rûnê, bêhna xwe vede; binihêre, tu bi cewhera xwe yekî pak î, lê heçi hesinê ku cewhera wî pûç e, tu çiqas bibiriqini ji bê fêde ye. Ê ku tu pê xapiyayî li ber çavê te delal dixwiya, lê te bi kirêtiya hinava wî nizanibû. Wekî tê zanin ku şerma tawis, bi renge xwe yê xweşik, bi pirçên xwe yên rengîn û bi neqşên xwe yên çavan diqemişine, ji piyê xwe yê kirêt e. Heke tu bixwazi bigiheji ronahiye dive tu xwe fêrî êş û xeman bikî, êş û xem azixê miroven e.
Destê min di singa min de.
Bêçar!
Wisa…
Mam û mam.
Li xwe qefilim.
Bi rojan ji hicra xwe derneketim.
Bi şerma Şêxê Senan, tu tişt nikaribû min ji tariyê xilas bikira min nikaribû rêya rast hilbijarta.
Dadmendên ji qeliştekên wîjdana min de rê diditin, bi êrişên dijwar rûhê min didan ber tîran.
Min çi rêyeke dûr ajotibû û dawiya dawî gihabûm ku derê.
Min çawa ferq nekir, heywanê ku xwe di ava heriyê laşê min de dişuşt, ji bo birçitiya xwe aş bike li bendî qelsitiya min bû.
Kawikekî şehwetê…
Ax, çi were ser hindik e!
Cihê ku ronî lê ditemire, di behra bagerê de dinepixe û pêl bi pêl diteqe de, di cihê bablisokên dojehê, rûha bi hêrseki dide ber xwe û rûhên birindar ku bobelatan daye peşiya xwe û bi avzêma ve dibe de, bayên guhên mirovan kerr dike de…
"Çi were serê hindik e!"

XI

"Nexwe tu bibiryar î?"
"Belê ezbenî."
"Hema wisa bi kiras û tûrekî?"
"Di vê rêye de gerek dirûvê hebûne were çirandin."
"Bi min wisa tê ku di vê karê de tiliya şêx heye."
"Na, ez dikarim mîrê xwe serwext bikim ku şêxê min vê rêwîtiyê munasib nabîne."
"Ka ezê niha Şerefnamê çawa biqedînim?"

"Bila qet gumana we nin be, katibên we di hunera xwe de gelek jîr in."
"Ezê hevalekî wekî te ku feyzê bide min ji ku peyda bikim."
Veqetîna min; veqetîna ji şêxe min, ji xan û Bedlisa ku di her deverê wê de perçeyeke min hebû, ne hêsan bû.

Ev bajarê bi sirr û efsaneyan tevnandî, diyarê şêx meşayix û ewliyayan, berê mehan bi hezar hêviyan min xwe gihandibûyê, vêga ji vî bajarê di bin kûrahiya çiyayan de, wêraneyên xwe yên kund veniştinê de, di nav teyisîneke sipî de bêdengiyeke xwe yê teybet de hewayeke uxrevî dihewand û bi her teybetiyeki xwe li hinava min cîh girtibû, diçûm û bi hêvîşikestineki, lê tevî bi dersên giranbuha hêdî hêdî li pey min dima.
Vê carê li hember şertên xwezayê bêparastin, lê bêtir li xwe ewle, bi tena serê xwe bi rê ketibûm. Ber bi wîlayeta Diyarbekirê ve diçûm. Tiştê balkêş ew bû ku ev rêya dur û westiner bi avêtina her gavekê re sivikahiyek dida min û baweriya min bi min xurtir dikir.
Gelo ew kesê ku bi rojan xwe li xwe qefaltibû, çawa bûbû xwe ji wê rewşê xilas kiribû û vê rê dabû ber xwe.
Dostek.
Belê dostek!
Mirîdeki ji Diyarbekirê wekî min li tekiya şex sitirî bû.
Dostekî ji rewşa min hestiyar bûbû û xwestibû min sitar bike, rêyek nîşanî min bide.
Qala yekî kiribû; munzewiyekî di nav hebûnê de xwe radesti tunebûne dike û şûn de jî, ji alema madî dest vedikişe û xwe li alema navîn bi cih dike.
Tiştê ku min ber bi xwe ve kişandibû, çîroka êbret a wê munzewiyê bû? Yan cezayê ku ji xwe re rewa ditibû bû? Texmin nakim. Nexwe çi? Nizanim, bi rastî ji bersiva vê pirsê ji bo min jî dijwar e. Belki hilavêtineke derxwezayi bû, hilavetineki derhiş… Çi be jî va li ser rêya xwe bûm û tiştê derketa pêşiya min, ji xwe dê bersiva her pirsan bibûya.
Hê ji Amedê re pênç şeş seet diviya, ji cihê ku ezê biçûyamê re du se seet mabû. Taliyê wekî ku min texmin dikir piştî du seetî gihaştim menzîlê. Gundeki biçuk bû, gundekî li rojhilatê Dicleyê. Heta wê derê, ji alî gundiyên xêrxwaz ve hatibûm pêşwazîkirin û wekî mevanekî Xwedê hatibûm qebûlkirirn. Gundiyên vê derê jî bi heman germahî ez peşwazî kiribûm. Ewilî min şibandibûne derwêşekî gerok, lê piştî ku min rewşa xwe ji wan re rave kir, bi mebesta min gihiştin. Em dikarin te bibin cihê ku tu dixwazi, gotin, lê wext dereng e va ji xwe hêdî hêdî tari ji dikeve, ya maqul ku tu işev bibî mêvanê me, sibê zû dikarî biçî. Ev ji bo min ne pirsgirêk bû, ecela min tunebû, ji xwe ez gelek westiyabûm, qene bi vî awayî ezê hinek vehesiyama.
Tiştê ecêp ew bû ku gundî meraq nekiribûn ka ji bo çi dixwazim wê minzewiyê bibinim. Herhal nexwestibûn pozê xwe têxin karê min. Li gor vegotina gundiyan, ev munzewî li ciheke ji gund gelek dûr ji xwe re jiyaneke xweser saz kiribû û xwe ji her tiştî tecrit kiribû û li tenhayiya xwe de, li tefkirê vekişiyabû. Ev tiştê ha ne wek çilekêşiyeke dihata zanin bû, lewma li min piçek xerîb hatibû. Ev xortê ha gava biryara xwe dide ku li vir bi cîh bibe, di dest de çi heye çi tuneye difiroşe û pereyeki baş li gundiyan belav dike û bi vî awayî dest bi jiyana xwe ya munzewî dike. Heçî

gundi jî, di bin xêrxwaziya wî de naminin û heta ji deste wan tê lê xwedi derdikevin. Tevî vê kes bi çîroka wî nizanibû û ji xwe kes nikaribû ewqas nezikî wî jî bibûya. Piştî tarî ket erdê û bû êvar, ji bo piçek bêhna xwe vedim derketim derve. Ji cihê ez lê bûm li ser deşteke mezin ronahiyên qels ên Amedê dihate neqandin. Ji aliyeki din li ser serê min stêrkên biriqdar bi cumbuşeke ronahiyê çavê min diqemişandin. Demek wisa hewaya efsûnî giyanê min min rapêça û ji xwe çûm, lê piştî demeke kurt, ji ewte ewta kuçikan mecbûr mam ku vekişim malê. Ji bo min dewşekek hatibû raxistin, hema ketim nav cîyan û razam. Tevî ku ewqas pêwîstiya min hebû jî, qene kêliyek be jî xew ne kete çavê min, bi vî ali û bi wî alî çûm û hatim, nizanim ancax piştî çend saetan di xew re çûm. Ji xwe tim wisa dibû li min, çiqas pêwîstiya min bi xeweke baş çêbûbûya hema wisa tetirxaniyek min di nav cihan de diqirqiland, çiqas li xewê bifikiriyama, ewqas jê dûr diketim.

Gava min li tiştê du xwe hiştibû dinihêrt, baweriya min bi tu tiştî nedihat. Nêziki şeş meh bû ku ji Konstantiniyeyê derketibûm û di wê navberê de çi umreki ixtiyar li min hatibû kirin, çi kiraseki agirîn li giyana min hatibu rapêçandin! Heqiqetek eşkere xwe dida der; min ji temenê xwe gelek derbas kiribû. Ji hinava min dengek bi pistepist digot êdî dê tim pirseki te hebe, lêgerina te êdî li rêyeke bêdawî ve ketiye. Heke bi rastî jî wisa be êdî tu kes nikaribû min qanih bikira ku jiyana min, a min bû. Ev çi dinîtiyek bû! Nependiya ku însanekî ji jiyaneke bihuştî vekêşe û ber bi aloziyeki ve kaş bike… Axx, çiqas ji xwe dûr im, bi vê dizanim, bi vê baş dizanim û mixabin ji bo vegerê dereng e. Çi bikim jî êdî nikarim xwe zeft bikim, ezê berê li cihê xwe bûyama jî, ez bi xwe êdî ne ezê berê bûm, nikaribûm li xwe vegeriyama. Jiyan tim di tevgereki de diçerixe û her tevger veguherinek û veguhezinek bi xwe re pêk tine, her tişt ber bi kemilinekê ve dimeşe, lewma tu tişt li cihê xwe namine û wekî xwe namine. Rast e lê hêja di vî temenê xwe yê ciwan de… Diviya ne wisa bûya! Heke wisa be, ev tê wê wateyê ku du cure jiyan heye: Yek, jiyana ji her wateyi tecrid kirî ku piranî bi hêsaniya xwe ve kişandiye, ê din jî jiyana bi sirr û nependiya xwe wateyeke xwe heye ku, dîvaneyên wekî min ji xwe re hilbijartine. Yek ciwan û yek pîr; mixabin ez bi vê ciwantiya xwe, di rêza pîran de bûm. Tiştê, min herî bi fikar dikir jî ev rêya ku min xistibû pêşiya xwe ê li ku û ê çawa bi dawî bihata.

Li Misrê, li her du qêraxa Nilê munzewiyên di qiluba xwe ya axin de dijiyan hebûn, ev li hember çola bêdawî, li kûrahiya bêdengiyeke de wan deran ji xwe re mesken girtibûn. Ew mala ku berbanga şefeqê li ber deriye wî bûm dişibiya wan qiluban; ew jî wekî wan bi axê hatibû çêkirin, û ê tê de dijiya jî, ji wan munzewiyan zehf dûr nedixweyiya. Berê, min bêdengiya hawirdor guhdar kir, bi şefeqa berbangê re li ber deriyê wî munzewiyê sekini bûm, ji qiluba wî tu tiqa Xwedê dernediket û nizanim çend setê din borî, wisa dewam kir, ne dengek hebû ne pêjnek. Herçi ez bûm min digot, miheqqeq wê mecbûr bimine derkeve û rûyê xwe nîşan bide, bi vê hêviyê bi bêhna fireh li hêviyê mam, lê tevî her xîzên ji seeta qumê bi xwarê ve diherikî jî, li rewşê tu veguherîn çênedibû. Di wan demên dirêj de min sebra xwe bi raçavkirina hawirdorê re diani. Robarê Dicleyê ji vir bi qasî bist deqiqe dûr bû, li qêraxa alî din gundên li vî ali û li wî ali belav bûbûn dihate neqandin; lê li vî alî, li geliyê mişt bi dar û beran hatibû dagirkirin de tu gund mund nedixwiyan. Li ser milên çepê ji Amedê bigire heta çiyayê Turabdînê, deşteke bi têra xwe mezin û fireh bejn dida, ev dîmen bi min wisa nîşan dida ku ev ax, ev deşta hanê ya bê serî û bê binî bi

çandiniyên xwe, bi mêw û fêkiyên xwe dikaribû tevahiya memalik-î Osmaniye têr bikira. İnsanek hema bes ji qêraxa zanistiya tarixê jî derbas bûbe dizanibû ku ev deşta ha, bi geliyên Dicle ve dûr û dirêj dibe, bi hezaran salan, ji dîroka mirovahîtiye re û ji şaristaniyan re derguştî kiriye, mirov dikaribû hema kêliyek bi sêwirandina deşta ku mişt bi uniformayên xwe yên teybet bi leşkerên Hurrî, Asurî, Medî, Bizansî û Romayî u wekî din di şopa dehan şaristaniyan de ji xwe biçûya.
Tava biharê tam li ser serê min sekinibû. Li wê bendemayinê de min qet nexwestibû li deri bixim, lê êdî piştî ewqas seeti tu çare nemabû, lewra wisa dixwiya ku niyeta camêr tunebû derkeve derve. Di tu cepheya xani de pencere tunebûn, bes li jorê kulekên biçuk, ku dişibiyan koxê kewa hebûn. Ji derve wekî qulubeyeki bê ewle dixwiya. Di vê aloziya hestan de min çend carek li deri xist, lê tu bersiv nehat, li ser vê fikirîm ku camêr li hundir ketiye tefkîran. Di vê rewşê de ne guncav bû ku ez wî nerehet bikim, lewra min carek din tûra xwe da pişta xwe û li nêzî qulubê li bin dara maziyekî posteki li erdê raxist û xwe li seri dirêj kir; roj hêdî hêdî ber bi esrê ve diçû lê ji hundir hêja jî tiqa Xwedê dernediket.An na mebesta wî min bêgav bihêle û ji vir dûr bixista bû? Rewş di çi ehwali de seyr dikir, min tu fikr nîn bû. Lê ji Bedlîsê heta vir ligel baran û boranê min ewqas rê dabû ber xwe, ji niha pê ve nedibû ku ez li du xwe binêrim, na veger nin bû, bi çi awayî bûya minê ew munzewiyê bidita. Çawa be di tûra min de xwarinên têra çend rojeki bike hebû. Ka vêga li ser vê postê xwe, dirêj bikim, heta sibê jî Xwedê kerim e. Wisa dixwiye ku ji bo îro êdî tu hêvî nemabû, Xwedê bike bi şev baran maran nepeşkile, herçî hewa pir zelal û kesk dixwiya, dîsa jî kî dizane, ma barana biharê ê çi çax bibare, çi çax nebare, Xwedê dizane, dev jê berde, hema bibare ji bila bibare, ezê jî xwe bavejime mala gundiyan.
Ji ber ku şevê din xew bi çavê min neketibû, hema di wê kêliyê de raketibûm.

Berbanga şefeqê bû, ji nişka ve yekî ji milê min girt û min bi nermahî hejand, li xwe hişyar bûm, di navbera xewn û hişyariyê de perdeyeke sîmîn… Hema min çavê xwe firikand, li dora xwe nihert, gelo kî bu wisa milê min dipeland? Û hew min dit ku, ew munzewiyê ji do ve li bendê bûm li hember min disekine, pala xwe daye gopalê xwe û li ser çokan runiştiye. Rûyê wî, di nav rihên wî yên dirêj de winda bûbû. Bi awirên sar li min dinihêrt, tu ifadeyek ji rûyê wî xwe nedida der, dîsa ji pê dihisiyam ku bi van nêrinan li min pirsyaran dike. Ji ber ku çavê min hêj bi zelalî nedidîtin min xetên rûyê wî bi hêsanî hilnedibijart. Rûyeki hûrik murik dixwiya, xêzên suretê wî ber bi windabûnê ve çûbû. Rûyek di bin wî çermê tenik de bi hestiyên xwe yên sipî diyar dikir. Ew bedena ziravok ji min kiri tu car ji xwarin û vexwarinê nesibê xwe nestandiye; dîsa jî bi wê dimenê nepayi re dilê min geş bûbû, hêdî hêdî bi ser xwe ve hatibûm.
“Ka bêje biyanî, çi karê te li van deran heye?” heta vê pirsê nekir, bi min wisa hat ku, lêvên wî wek ê pîrekî temenborî hundir ve vekişiyabû û li wir hatibû qefaltin. Tevî vê, ji rûyê wî yê gewrîn dihat fêmkirin ku yekî ne ewqas pîr bû. Çavên xwe bi awirên pirsyar li ser min çik kiribû û li benda bersiveki bû. Ligel pêşniyara hevalê xwe min sedema hatina xwe jê re ravê kir, qanih nebû, bêgav mam, li xwe mikur hatim ku yekî li hember xwestekên laş têkçûyî me, li hember arezûyên laş, li hember şehwetê têkçûyî me min got. Serê ewil gawa li min guhdari dikir rengê xwe eşkere nedikir, lê dawiyê li xwe mikur hat ku serpêhatiya min tesir lê kiriye; belki jî di serpehatiya min

de gunehên xwe piçek sivik kiribû, rebeno xwe çawa dabû bawerkirin ku li ser rûyê vê erdê gunehkarê herî mezin ew bixwe ye!

Min vexwende mala xwe, roja ewil gengaz nebû ku tu peyv ji devê wî bistînim, min bi israr dubare dikir. “Bi sedema çi te xwe mehkumê jiyaneke wisa kiriye?” bi dubarekirina vê pirsê û li hember helwesta wî, qenaeteke ku wî gunehekî pir mezin kiriye bi min re hasil bûbû. Bes kenekî tehl li ser rûyê wî vedinişt. Min ji vê helwesta wî, beyxude hewl nede, tu nikari peyvek jî ji devê min bistini, derdixist; lê ez jî ji ê xwe nedimam û min di ber xwe de digot bila wisa be ka taliyê emê bibinin, ê ki bi serkeve. Hema wisa, ne ew dev ji huşbûna xwe berda û ne jî ez ji a xwe hatime xwarê, mixabin yek ji me inyada ê din nikaribû bişkênanda. Lê tiştê min bendemayî dikir, nermahiya wî bû; ew munzewiyê ji roja ewil ve tu reng ji helwesta xwe nedida der, sê roje ku ji ber pirsên min, tu acizî nîşan ne dida. Di wê navberê de min jiyînên wî çavdêrî dikir; wextê xwe exlebî bi tefkire derbas dikir, tenê carinan diçû bin wê dara maziyê û çavê xwe li asoyê vediçikand û demeke dirêj wisa noqî fikaran dibû, ev tevgerên wî bi min  wisa nîşan dida ku, di navbera wî û di jiyanê de têkiliyek qels jî be hebû. Tiştê herî zêde min dixwest çîroka wî munzewiye hin bibim bû, êdî ev ji mebesta hatina mina vir jî giringtir bûbû, diviya çi qewimîn vî camêrî ber bi jiyaneki wisa ve kaş kiribû hin bûbûma.

“Di heman robarî de du car nahête şûştin, gotiye Heraklitosê Yewnanî”
Ev peyvên wî yên nepayî weke gurmistekê di rûyê min de teqiya, qet ne li bendê bûm ku bi min re bi vê rengê biaxive. Van peyvê xwe bi şêweyeke wisa giran bikar anibû ku, mirov digot ji xwe ne çilekêşek, lê zanayekî mezin î xwedihikmet e.
“Her kêliyek wek aşekî, jiyanê di çerxa xwe de dihêre. Her tişt, her dem, bêrawest şûn de dimîne dibe raborî. Niha ev gava hanê bi xwe jî, peyvên ji devê min derdikevin, bi herikîna ser lêvan re di aloziya bêdawitiya hîçîtiye de vediguheze hîçîtiyekê, dibê qey ji xwe tu tişt nebûye û ji xwe hiç nebûbe, lê binihêre, ava ha çawa diherike, çawa ku qet ne bûbe bi rêyeke bêveger de dihere û diçe, kî dikare wê bisekinine, kî dikare rê lê bigire, kî dikare careke din wê şûn de vegerine?”
“Xwedayê mezin helbet!”
“Helbet!.”
Bi vê piçek aş bûbûm, lewra kêliyek bi min wisa hatibû ku, wê ber bi kufrê ve biçûya, ji xwe ji serê ewil ve tevgerê wî yên biçûkxistina bedenê, ne tiştekî ji qada Xwedayî dixwiya. “Şûn de bunewerê di cewhera eşqa abadîn de dihele û vediguheze dilopekê, ji zerreyê bigire heta kurreyê, her tişt dawiya dawî wê vegere esle xwe. Em ji bo paqijbûnê çiqas hewl bidin jî beyxûde ye, lewra însanê pak nin e; guneh mirateki ji bav û kalan e, ev çerx ji dema tehmkirina sêva qedexe ve wisa didome, qet çare jê re nin e. Ne ava Dicleyê û ne ji ava Nilê dikare pak bike nifşê beni adem. Bes bi cewhera xwe ya bingehin, ancax pê dikare pak bibe însan. Ew kesê ku di nav agirê xwe de disote û dişewite û dibe mistek xweli û bi hewayê ve berba dibe, ji goştên xwe û ji hestiyên xwe destê xwe dişo, ancax ew dikare xwe pak bike, wekî ku Hafiz dibeje: ‘Difirim, xweliyê min li hewa dikeve, ê veguheze min’ Heke mirovek ji xweliye xwe vegere xwe, ew êdî ji goşt û hestiyê pê ve tiştekî din e.”
“Mebesta jiyanê xwelibûn e, tûnebûn e yani.”

"Ji bo evîndarê rasteqîn, yan jî ji bo gunehkarê wekî min belê. Gûh bide ez axaftineke di navbera perwane û findê de neqlbikim ji te re. Perwane ji findê re dibêje, evîndar ez im, şewat li min tê, ê bi ax û nalina bi giriyê bikeve ez im, gelo tu çira digirî; find, wey evîna minê reben dibêje, ji perwane re, min ji hinguva minê şêrin veqetandin, ji gava şêrina min bi neheqî ji deste min hatiye sitandin ve wekî Ferhad girîn û nalin li min tê, bi vî awayî hem diaxive û hem ji rondikên agirîn ji hinarikên xwe bera jêr dike; tu li şewqa min a ronî geş dike nenihêre, li agirê wekî lehiyekê dibare û di hinava min de diherike û min dişewitîne binihêre, evîndariya te îdîayeki pûç e, ne sebr heye bi te re û ne tebat, hema ji ber şewqeki biçuçik ji direvî tu, lê ez heta tune dibim dişewitim û dihelim li ser piya diminim, wekî te ji ber şewqê narevim, agirê evînê bes perê te disotine, lê ez ser a pa pê dişewitim, find û perwane bi vî rengî diaxivin û dibe derengê şeve û di wê navê de dilbereki perisûret nêzik dibe û pif dike mumê vedimirine, findê reben ji aliyeki ve du ji seri wî davêje û ji aliyeki ji bi dilekî şewat dinale, va dawiya evînê ev e, dibêje û rûhê xwe dide. Evîn tiştekî wisa ye, bi mirinê xilasbuna ji vê dinyayê ye. Tiştê ku îro min xistiye vê halê jî, ji xwe ji evînê pê ve ne tu tişt e.
Mirov carek yeki peyda bike ji bo dilê xwe jê re veke, êdî tu tişt nikare xwe li ber bigire. Min wê munzewiyê li qêraxa Dicleyê, di hicra qulubeya xwe ya tê de dikete tekfîrê û pê re zewqa tenêtiyê ditehmijand, destê xwe ji nimetê dinyayê kişandibû, di çerxeki bê dawî de bi navberên demkurt de çil roj li rojiyê radiza û bi gelempêrî bi xurmeyek û zeytunek debar dikir, tevî bi pirçên xwe yên sitirî bi abayên li ser bedena xwe ya rût çile tije dikir, bi hesudî temaşe dikir, li ber çavê min çiqas xurt dixwiya, jiyaneke wisa tecritkiri ancax însaneki bixwaze zewqa tenêtiye heta dawiyê bijî, yan ji bixwaze berdêla kefareta gunehê xwe ye mezin bide, dikaribû bida ber xwe. Belê wekî gunehkareki dixwiya lê, gunehê wê çi be jî, wî ber bi rastiye ve kişandibû, bi rêya evîna rasteqîn ve. Rêya wî, ji rêya Mecnûnê bi eşqa Leylayê bi çolan ketibû, lê dawiyê bi mecrayeki din ve şax dabû, cuda nedixwiya. Mecnûn bi mehan ji Leyla dûr bû û wê nedidit, dosteki wî ku ji vê rewşa wî pir aciz bûbû jê pirs kir, "Çi bû ji te ey Mecnunê dilpak? Çende ku kêr devê te venake, ji Leylayê tu xeber nîne û tu ji bi ali semta wî ve naçi? An nexwe te dev jê berdaye." Gava Mecnûn van peyvan dibihise, dest bi giriyê dike, bi mehdeki tehl lê vedigere, "Tu çi dibeji Xwedêkî?" dostê wî, "Nizanim." dibêje û lê zêde dike, "Bi min wisa tê ku wekî xeyala te guherî be, xeyalek din bi çavê te ketibe." Li ser vê Mecnun bêtir çavê xwe sor dike û bi qêrîn, "Tevli min nebe." dibeje, "Ji xwe kul û derdê min mezin û dilê min şikestî ye, birîna dilê min bi xwînî ye, tu jî xwê lê neke. Kijan evîndar dixwaze veqete, ji evîndara xwe dûr bikeve, ki bi zanetî dilê xwe li kemenda êşê girê dide; veqetîn ancax bi mecburiyetê gengaz dibe." li ser vê "Ez" dibêje dostê wî, "Ber bi welatê Leylayê ve diçim, gotinekî te heye ku ez ragihinimê." Û Mecnun "Qet!" dibersivîne, "Nebî nebî tu li ber Leylayê navê min zikr biki, li cihê ku ew li wir e navê min bê manê û gotinê min pûç e. Ez bi hebûna wî bi nav û deng bûme, jê pê ve hebûna min û navê min bi kêri tu tiştî nahêt ji xwe."
Belê tu ferqa munzewiyê me jî, ji vê Mecnunê ha tunebû. Gava bi çîroka wî hîn bûm, têgihiştim ku hevalê min ji ber çi min şandiye vê derê. Ev camêrê ku rojên xwe bi tefkirê û bi rojî girtinê derbas dikir, her cure zewqê li bedena xwe qedexe kiribû, bi êşa ku dikişand re dixwest rûhê xwe yê ber bi avzêmê ve vedikişe rizgar bike. Ji vê

dinyaya madî bi tevahî destê xwe kişandibû û bi rûh û bedena xwe, xwe li qada Xwedayî girtibû. Wan rojên xwe yên hetiketiyê wekî rûreşiyeki mezin didit û vedigot.
"Ji malbateke rêzdar bûm, bav û kalên min ji pêşdeçûyiyên Diyarbekirê bûn.Tim bi ilmê mijûl bûm, wextê min bi fêrbûnê derbas dibû. Ji ber tiştê qedexe qet derbas jî nedibûm, lewra şecera malbata me digihişta heta Şex Evdilqadirê Geylanî. Bi terbiya İslamê perwerde bûbûm û ji zaroktiya xwe ve wekî însanên kemilî tevdigeriyam. Cihê em lê rudiniştin bûbû wek ziyaretgehek. Ji bo rûyê xwe li dergehê me bixînin, ji çar ali welêt dihatin seradanan. Min tu car mihebeta xwe ji ê nêziki xwe nedikir, min çi dizanibû ku ewê min ji rê derxînin, ber bi heriyê ve bajon! Tevî ku êşên ewqas min ji ber wan kişand jî min tu lomeyan li wan nekir, jehra ku ji destê dostan ji min re hatibû pêşkêş kirin min bi noşican qurtandibû. Min dilê xwe bi hezkirina evîndara xwe ewqas dagir kiribû ku, jê pê ve çavê min tu tiştî ne didit, ji peyvê wê pê ve guhên min tu peyvan nedibihistin. Carek noqî behrê bûbûm, carek min wê perisûretê ditibû û dilê xwe berdabûyê, êdî çi dikaribû xwe li ber min bigirta. Ew senemê ku min bi bengîtiyê şehwetê dîl xistibû, carek tevli xwîna min bûbû, bi bedewiya xwe min ji rê derxistibû… Min çi dizanibû ku hilweşina xwe bi destê xwe amade dikim, belê hilweşina xwe, ruxina xwe… Zewqên dinyaya fani min xistibû nav lepên xwe, jiyîna di nav sefehetekê de, wekî wateya jiyanê bi min dihat; helbuki ez çiqas nêzi qada Xwedayî bim, ewqas ji dûri qada madî bûm, lê tu car nedihat bîra min ku ezê rojek bibime qurbana hevalên xwe yên rûhên xwe radesti şeytên kirine. Ewil şerabê bi min dane vexwarin, piştre li meyxaneyeki serxweş ketim,  hêdî hêdî miptelayê jiyaneke şevrengîn dibûm, êdî nikaribûm jê xilas bibûyama, ne ilmê min û ne şecera malbata min dikaribû bigihişta hewara min. Nexasim şevek ji şevan birasthatina reqqaseyeki çavxezal re ji bo min destpêka dawiyê xwiya kiribû. Jiyana min a rûmet êdî ji destê min çûbû. Ew reqqaseyê ku xwe ji hembêza yekî, davêta hembêza yekî din gava li ser çoka min runişt, wekî ku agirek xwe bera hinava min bide bû, bi kelekela dilê xwe ez radesti wê bûm. Hêja bi ditina ewil re min dilê xwe pê girê dabû, min çi hay hebû ji bayê felekê. Arezuyên şehwetê min ber bi jiyaneke riswa ve kaş kiribû. Gava dest bi reqsa xwe dikir bi livandinên marqewî tim meyxanê dicoşand û ji min kirî bi her tevgerê xwe bi teybetî ji bo min pêşandanek  pêk tîne. Cara pêşi ku lêvên wî yên sotîner dilopên hinguvîn ji lêvên min nuqitandin û Xwedê dizane ew lêvên sotîner berê min çend evîndarên din dîl xistibûn. Her diçû ber bi avzêmeki ve vedikişiyam. Rastiyek xwe eşkere diyar dikir; êdî ez ne ez bûm, ber bi bobelateki ve diçûm.Carna bi rojan piyê min bi mala min nediket, êdî meskena min ew meyxane bû. Bi bengîtiyeke wisa xurt pê ve hatibûm girêdan ku, tu qewet nikaribû min jê bikira, hebe tunebe ew! Dilê min hêsirê wê bûbû, yek deqeyek beyî wê debara min nedihat û min çi he be li ber xerc dikir, heta tu tiştekî min nema ku ber kesî de bidim, ewil dostên min ji min dûr bûn, yek qiruşeki min jî nemabû; nema min dit ku herkes ji ber min wek ez bi cuzamê ketibim direviya. Meyxana ku tim bi min şên dibû hema ku ku bera min ne didan, dîsa jî çend rojek li qunceki min hewandin, lê ew şeytan bixwe êdî qet xwe li min danetanî, ha li wê masê û ha li ê din vedinişt, lê masa min qet nedihat bira wî û ez wekî pepukan li benda wê disekinîm. Nizanim çi bi min hatibû, tevî vê şeperzetiye, dîsa jî destê min ji wê nedibû, tim bi hêviyeki pê dihatim girêdan. Ji bo du qiruş peyda bikim her roj li deriyê yekî din

bûm, min tu şeref ji xwe re nehiştibû, bes herim wê meyxanê û li benda wê iblisê bim, hebe tune be ew. Dawiyê çi deri hebe ku min xwe diavêtê li rûyê min hate qefaltin.Tevî, min hay nîn bû ku, dê ji deriyê hezkiriyê xwe jî werim avêtin, feleka xayin carek min xistibû tora xwe. Min qet hay nîn bû, ji xwe ihtimala vê ji, min wekî Mecnûn ber bi çoleki dojehîn ve biavêta. Min didit ku roj bi roj tehemila kesî ji min re nedima, ê meyxanê êdî rûyê xwe ji min didan ali, lê mirov carek nekeve eşqê, hew pê ve ne ar dimine ne şerm… Min qet li xwe danetani; navê min, şerefa min, malbata min, çi li dest hebe min tevî winda kiribû, nedibû ku ji yara xwe ji bibim. Rojek ku min avetine derve nizanim çawa bû lê dîsa ew şeytan li min xwedi derket; ev yek bûbû sedema ji nû ve vejîna min jî; ewê ku min meftunê xwe kiribû li min xwedî derketibû, ma bextewariyeki ji vê wêdetir hebû gelo. Min çi zanibû ku berdêla vê yekê jî hebûya; ewê bi vê xwedi derketinê min wekî kuçikeki dera hanê li pey xwe bixista û bi şev û roj di xizmeta xwe de bikarbaniya! Bila be, ma ne dilê min bû, can feda ji bo wê, çi êş jê were min qebul e, bes bila dev ji min bernede. Çawa be tu cihekî min jî nemabû, bi vî awayî min her cure piçûkxistinê ji da ber xwe û di quncikeki de bidaqurtandina du sê qurtan idare kir; bi vê hale xwe ji qayil bûm, ma reziliyek wisa li ser rûyê dinyayê hatiye ditin gelo? Ew senem, ji maseyeki diçû maseyeki din û bi wê delaliya xwe ya ku min wisa rezil û riswa kiribû, pêşkêşi miştiriyan dikir û min ji bêgaviyê çavê xwe li her tiştî digirt. Herhal însan gava tune dibe bi tunebûna xwe jî hay namine, rewşa kirêt a ku ez ketibûmê de, ji vê pê ve ne tu tişt bû. Tiştê ku dizanim rewşa ez tê de bûm, ji rewşa Şêxê Sen'anê ku şivantiya berazan dikir xirabtir bû. Teqez wekî her tiştî ê dawiyek li vê ji bihata, lê Xwedê dizane bê çawa? Rojek, nizanim çawa bu wekî tu car ne adeti min be ber bi oda wê ve çûm, min xwe hêdîka ji deriyê wî bera hundir da û Xwedêyo çi bibînim, ew senema ku min ji ber evîna wê xwe xistibû vê halê, şilfitazi di paşila biyaniyeki de û nizanim çi bi min hat û ji wir çawa reviyam û çûm. Ji wê cîhê ku şeref û namûsa min daxistibû erdê bi bayê bezê reviyabûm û heta berbanga şefeqê li kuçe û kolanan geriyabûm. Bi çi awayî bû qet nahêt bira min, lê dotira rojê min çavê xwe di nav nivîn û dewşekan de vekirîbû. Kîjan xwerxwaz min nas kiribû û anibû malê nizanim, tiştê dizanim kesê ku di şeva tariya serma û seqemê de li kûçe û kolanên Amedê wekî awareyan li gerê bikeve, teqez ê bi wî halî biketa. Dayika min, bavê min û malbata min a ji ber min bi hetiketiyê ketibûn, qet tu pirsan nekiribûn û wekî zarokeke şirî li min xwedi derketibûn, nexwestibûn ez ji destên wan bişemitim û herim. Di wan rojên tagirtî de yek ji wan jî destê xwe ji min nekiribû. Gava hinek bi ser xwe ve hatim her tişt wekî xewneki tirsnak, wekî kabuseki li min vegeriyabû, min bawer nedikir ku ewqas qewimîn bi min pêk hatibûn, ez bi xwe bûbim sedemên ewqas rûreşiyan, Xwedêyo çi şermeki mezin bû, diviya ez bimirama, diviya ez tune bûyama, ma çi heqê min li wan hebû, ez çawa bûbûm sedemên ewqas rûreşiyan… Difikirîm, diponijîm lê qet tênedigihiştim. Çend rojek tê re derbas bû û hêdî hêdî bi ser xwe ve dihatim, min biryara xwe ji zû de dabû. Rojek şefeqek zû bi dizika ji mal derketim û ber bi qêraxa Dicleyê ve hêdî hêdî meşiyam. Gihiştime nêzikê Pira Dehderi, demek li ber avê bi valahiyê ve herikîm, piştre li dora xwe meyizîm, tiqa Xwedê tunebû, dora avê qeşa girtibû, wekî kevireki hişk ketibûm û hema di wê kêliyê de min xwe di avê re berda. Di sermaya zemheriyê de bi avê re diçûm, ji bo xwe xilas kim min hîç hewl nedida, tevî vê herikîna avê ewqas bi şid bû ku sobeberê herî jêhati jî nikaribû xwe xilas

bikira, ji xwe laşê minê ku bi avê ketibu hema bi lerizîneki ji xwe çûbû, ji min kirî di nav wî aloziyê de bi xwew ketibûm, Xwedêyo, çi xwewekî şêrin dixwiya, hema wekî gewda sipindareki hişk bi avê ve diçûm, bê rûh…Û şûn de çawa bû nizanim, dengek bi qêraxê ve bangî min dikir, "Zû xwe bavêje vî ali, çi diki tu, te aqilê xwe xwariye, zûka zûka xwe bi vî alî ve bilivîne, zû bi vî ali ve, destê xwe dirêji min bike!" ji nişka ve min berê xwe bi wî ali ve da û min ew dit, Rıza bû xizmetkarê sadiq, bi telaşekî mezin ji ali qêraxê ve min dişopand. Çawa wehyek ji min re hatibe bi wê bangê re min xwe nedit û ber bi qêraxê ve hilkişiyam, piştî hewldaneki awarte nêzikî qêraxê bûbûm, Rıza destê xwe direjî min kir û hew ji dil çûm. Demek li wê qêraxê ser piştoki direjkirî mam, ber bi asoya bêdawî ve xilmaşbûm, her tişt çiqas bê wate dixwiya… 'Min şermezar nekin, min şermezar nekin.' Bi vê pile pilê, ji dil çûbûm.
Dîsa li mala xwe li nav cihên xwe sitiribûm, piştî çend rojeki êdî bi tevahî ser xwe ve hatibûm, lê tu rûyê min tunebû ku li rûye kesî binihêrim, ji xwe xeyni vî jî, her tişt ji min re biyanî dixwiya, ez ji xwe re jî biyanî bûbûm, diviya min ji van deran bar bikira, ne dibû, ji vê pê ve tu rê tunebû, bes rêyek hebû ji bo xilas bûna min ew jî terkê welat bû, taliyê wekî tu jî dibini ji Amedê reviyam ji xwe re li vir bi cih bûm.
Vêga bi vê halê xwe, bi xwe re, bi tenêtiya xwe bextewar im û bi min baş dixwiya ku her gav piçek din nêzikî ronahiyê dibim ew ronahî bi çirûskên xwe, xwe nîşani min dide. Û tenê vê ji te re bêjim, ji bo faniyeki ewqas êş û êşkence min kişand, ji bo wê xaliqê ku min afirandiye û bi qudreta xwe can daye vê axê çawa nedime ber çav.
Û li ber vê serpehatiyê ez wisa bi sivikahiyekê ve ketim ku nahête gotin.
Têgeha "guneha mewrus" cara ewil bu ku di mêjiyê min de bi qenaeteke xurt cih digirt.

XII

Ji lêgerinên min ên ku bi mehan ajotibû çi bi destê min ketibû hay nin bûm. Ji aliyeki ve min bareki giran hilgirtibû û ji aliyeki ve jî min xwe wekî mûyeki sivik hîs dikir, evê jî nîşanî min dida ku, fêrbûn ji aliyeki ve bextewari dida mirov û ji aliyeki ve ji êş. Û ji tiştekî din ji baş serwext bûbûm ku, hêj ne li dawiyê bûm, ji min re hîn rê diviya.
Gava min bi xirqeyên ser xwe ji qêraxa Dicleyê bi xumexumekê ber bi Amedê ve rê distand, dengek ji hinava min pistepist dikir, ev ne rawestgeha te ya dawî ye!
Min tava şefeqê dabû pey xwe, ligel hizirinên bi dengê robarî de difetisîn re dimeşiyam ku, li ser avê perçeyeki qumaşê sor î ber bi qêraxê ve diçû bala min kişand, bi meraqeke li pey ketim, av bi lezalez diherikî, ji aliyeki ve dibeziyam û ji aliyeki ve ji nêzî avê dibûm, car carna min xwe daqulî avê dikir, destê xwe davêtê, lê bi destê min nediket; zehf neçû bi hewldaneki awarte min xwe ber bi avê ve tewand û wê bidestxist. Bê çima min li pey perçeyeki qumaşê ewqas zehmetî kişand, nizanim, dibe ku tenê min dabû dû meraqa xwe, lê bi rastî ew enînivîsa min bi xwe bû, enînivîsa min, min ber bi wê ve dikişand. Ji xwe ew tesaduf, ê jiyana min ji binî ve biguheranda, erê ew tesaduf ê di jiyana min de bibûya sedema xalvegerekê, lêgerina min êdî bi vê dawî bihata, pirsên ku li bersiva wan digeriyam ê li min vegeranda, wateya jiyanê ê bi vê bi destê min biketa. Herçî ê herî giring minê bi vê yekê cewhera xwe bi dest bixista, perçeyên min ên ku her yek bi aliyeki ve belav bûbûn bi vê awayê berhev bibûyana.

Ê li destê min, şalekî hevrişîmî î pir bi nirx bû. Kêliyek li berevajiya istiqameta xwe meyizîm, tu gundek yan çêwlikek nedixwiya, tenê bexçeyên li qêraxa çem wekî tereçeyan li pey hev hatibûn rêz kirin bala min kişand, hema di wê kêliyê de dengek ji hundirê min berz bû, ev ne xelateki robarê ye ji te re, here, digot, divê tu xwediyê şalê bibînî û wê radestî xwediyê wê biki, min gûhê xwe da vê dengê, qet nesikinim, li xwe civiyam û ber bi ali din ve meşiyam.
Bi eksa istiqameta xwe ve diçûm, tevî barana nîsanê, berfên diheliyan jî tevli robarê bûbûn, av pir bilind bûbû û bi xumemxuman ketibû. Demek dirêj wisa meşiyam lê wekî ku in û cin ji xwe re gogê dileyistin, tu mexluqatê Xwedê ber bi çav nediket, di wê bê pêjniyê de min beyxûde çavê xwe li nav bexçeyan digerand, ew dengê ku min bi rê xistibû, hêviyê xwe qut neke digot, çi bibe bila bibe tu yê teqez xwediyê wê şalê peyda biki, bimeş! Piştî demekê hinek westiyam û li ber bexçeyeki rawestiyam, ev bexçeyê ha bi gurzên sitiriya hatibû dorpêç kirin, deriyeki xwe yê qehîm hebû, ciheke ewqas ji çavan dûr, teqez ji bo parastinê bû, lê bi her çi awayî be ev der qet bi bexçeyê din re nedihat miqayase kirin, ewqas mintezem bû, ewqas bêhna mirov pê vedibû ku bi her teşeyê xwe wekî bexçeyeke İremê li ber çavan radixist. Demek wisa di cihê xwe de bi heyranî lê meyizîm, gava hinekî din bi baldarî meyizîm di nav dar û beran de wekî xaniyek bi çavê min ketibe bi min hat, kêliyek min di serê xwe de, di nav van wîçewîça çûkan de çi jiyaneki aram tê jiyîn, ê li vê derê dijîn çiqas bextewar in, derbas dikir ku, bi dengeki nermik li xwe hişyar bûm.
”We li çi dinihêrt?”
Gava min ew deng bihist li xwe heyirî mam; lewra ku li gundên van doran zêde kes ji Kurdî pê ve tu zimani nizanibû, bi Farisî deng li min hatibû kirin û ya dudo jî, ew dengê ku bi şêrinahiyeke hate guhe min aidê keçikekê bû. Belê bi vê yekê re delaliyeki wisa ber bi çavê min ket ku, nêrinên min ên li ser delaliyê tev bi xwe re pûç kir, lewra ewê li ber çavê min xwe li ba dikir, tiştekî ji peri û xoriyan wêdetir bû, hema wisa wekî peykereke bêliv mam, di vê navbera efsûnî de, heman deng gotina xwe dubare kir.
“We li çi dinihêrt?”
Heçî ez bûm deng ji min biliyabû, bêhna min wexte biçikiya, hema di nav wê şaşitiyê de taqeta min gihiştê ku, şalê destnîşan bikim. Bi vê yekê re min nedit, ew keçika bedew, çawa ber bi min ve çeng bû û bi alî min ve baz da, tevî çirûskên bextewariyê ji çavê wî dipekiya, mendelê deriyê hesin vekir û xwe gihande min. Bi vê dimenê ji aliyeki ve min ji aqlê xwe derbas dikir ku ev xelata robarê aidê wê ye, ji aliyeki ve jî, ji xwe çûyînekî min xwe ji delaliya wê nedistand; delaliyek, weke ku li qesideyên xwe digeriya. Bi şêriniya nêrinên xezaleki lerzok û ricfok li min dinihêrt, bi efsûn…Wekî li bexça cinnetê ji kirêtiyan bê hay, wekî kulilkeke bişkuviye û gihaştiye vê umrê; wisa ronî, wisa nazik wisa şêrîn dixwiya ku, însanek ji qaliba delaliyê ancax ewqas dikaribû bê qisur derketa.
Bi dengeki şa, “Moteşikkirem, por moteşekkirem!” got û bi nêzikahiyeki ji dil, destê xwe direjî min kir, şal ji destê min girt û da ber rûyê xwe, bi vê hali ez heyirî lê dimeyizîm, ax Xwedêyo, bişirineki wî ya asimanî kesk û ronî hebû.
Wisa demeke dirêj wekî kerr û lalan mit û mat mayina min, bi awayeki din şîrove kiribû, pê wisa hatibû ku, ez, ji zimanê wî fêm nakim.
“Hûn bi Erebî dizanin?”

Ax, Xwedêyo, ew deng, ew dengê robara ji ber min diherikî lal dikir, difetisand, bê çawa bû di hinava min de ji xwe re mecrayek vekir û wek sûlaveki herikî, ew serxweşî hêja ji wekî îro li bîra min e.
“Belê.” min got, “Belê, ne tenê Erebi, Farisî, lê bi Tirkî jî baş dizanim.”
Ew melayiket li pêşberi min li ba dibû û şalê di destê xwe de dibir ber bêvila xwe, têra xwe bêhn dikir, “Hûn dizanin we çi qenciyek bi min kir.” digot, “Ev şal yadigareki bêbuha, ji dayika min mabû ji min re.” û lê zêde dikir, “Ma gelo we çawa wê bi dest xist, çawa ku ber bi avê ve çû, min tu hêvî jê nemabû.”
Ji aliyeki ve min hewl dida ku ji tesira wê ya efsûnî xilas bibim û ji aliyeki ve jî bo pirsên wê bersiva peyda bikim diqirqilîm.
“Çawa ewqas bêtevdir tevgeriyam, nizanim, hema kêliyek tenê vala mam û ev hat serê min. Wekî her bihar gava tîrêjên rojê xwe bera şefeqa min dan, bi bayê sabayê re derketim derve ber bi qêraxa robarê ve meşiyam, min dil hebû li ser rûyê avê ji xwe re xeyalan bineqişînim, rûhê xwe aram bikim, ev yek ji berê ve wekî kurmeki li jiyana min cîh girtibû û vê care nizanim çawa bû min xwest  bêtir nêzi avê bim û xwe daqul bikim, biniherim ka di rûyê avê de çi aks dide, ji xwe bayeki sivik jî hebû û ligel bi tewîna min yadigara dayika min ji stuye min şemitî û ber bi avê ve çû, min çiqas da pey avê ku şalê bi dest xim lê mixabin, av ewqas xurt diherikî ku her diçû jê dûr diketim, dawiyê min fêm kir ku hewldana min bê fêde ye şûn de vegeriyam û va heta hûn derketin hatin jî, li bin vê dara hanê, min dayika xwe ya delal bibîr dianî. Bi rasti jî ev yek ez gelek xemgin kiribûm, spas ji we re gelek sipas.”
“Na na qet ne giring e, bi rastî tesadifek seyr bû, dibû ku min wê demê li robarê nenihêrta, yan tiştê bi avê ve diçû qet bala min nekişanda, lê çi tesadufeki li cîh bû ku ev tişt tev ji ber xwe ve qewimîn.”
“Çawa ne giring e, hûn ewqas rê hatin!”
“Ji xwe bi rojane ku dimeşim, ha du saet zêde ha du seet kêm…”
“Wisa li ser linga nesekinin, tu Xwedê em derbasi bexçeyê bibin, rica dikim.”
“Spas dikim, lê rêwî di riya xwe de, ez we nerehet nekim.”, min wisa digot lê heke di wê lehzeyê de bi teqînên dilê min î di qefesa singa min de olan dida bibihista, wê tebigihişta ku di bersiva xwe de çiqas ne ji dil im.”
“Rica dikim wisa nebêjin, heke hûn bes qehweyekî me jî venexwin ezê spasiya xwe çawa bikaribim nîşani we bidim.”
“Bila bi ya we be, lê bi rastî jî hewce nedikir.”
“Kerem kin derbas bin, em herin mal, tiştekî îkramî we bikim, ji xwe babê min jî niha hişyar bûye, ez we bi hev bidime nasîn, guman nîne ku, derweşeki wekî we pê re baş bi hev bike, ew jî tim di tefkiran de ye, bi şev û roj dişixule û tiştînan dinivîse.”
Ji aliyekî ve ev agahî pir li xweşa min çûbû, dibû ku min pê re ji tiştînan li xwe zêde bikira, lê ji aliyê din aqil û fikrê min bi tevahiya xwe bi melayiketa li pêşberî min re dagir bûbû.
“Dibe ku bi vê diruvê xwe wekî derwêşeki xwîya bikim, lê di esasê xwe de hûn min wekî derwêşek nehesibînin.”

Wekî ku tiştekî şaş bihistibe, “Çawa!” got bi şaşmayin li rûyê min nihêrt.
Wekî her carê ku bi çavên wî yên mişt biken, çokên min sist bûbûn, “Çîrokeke dirêj e.” min bersivand, “Mixabin ji bo vegotinê vext nîn e.”
Ji aliyeki em ber bi malê ve dimeşiyan û ji aliyeki ve jî min dora xwe raçav dikir, bi rastî ev bexçe ji texmina min jî xweştir bû. İrembexçeyekê bi çîmanen xwe yên bi gulên sor dagirkirî, rêz rêz lale, sosin, beybûn û her cure kulilk bi gustîlkeki qaşên xwe yên durr re xemilî… Xonceyên bişkuvî, tevli bêhna binefşên wek baskê tawisan xemilî, dibê qey tev bi hev re ji bo sirra vê bexçeyê têbigihêjim hewl didan; ji aliyeki, bayên biharê hawirdor bi henikahiyeki mişt dikir, nexmeyên çûkan wek pêjneki xweş ji kûrahiya bêdengiyê were, guhan mist dida û periyeki bi rûyên xwe yê wek durrên nav sedefan de veşartî, xonceyeki bi kirasên kesk alandî, ku neqqaşê Çînê tev li hev biciviyan nikaribûn ew bisêwirandana refeqetî min dikir û ew gav ez diqirqilim ku, wateya jiyanê di vê qozeyê de birêsim.
Gava em gihaştin ber avahiya du tebeq, di terasa fireh a jor de ixtiyareki rûpak li ser rûnişteka xwe ya textin de xwe wekî di hêlakeneki de be dihejand, bi hatina me rabû ser piya û bi deliken me peşwazî kir, ji aliyeki ve jî bi baldarî min raçav dikir, “Ji piya nesekinin.” got, runiştekên li dor masê cîh digirtin destnîşan kir, “Dê fermo, kerem bikin rûnên.”
Û ew melayiketa bi navê Gulbanû xwe bi min dabû nasîn, ji ser piya me bi hev da nasîn. Navekî balkêş a ixtiyar hebû; Sadiqê Soxrewerdî. Piştî demeke kurt masêya me bi taştêyeke mikellef hatibû tekûz kirin, tevî ısrara camêr jî, min tenê du sê luqme xwar.
Bi rastî serê ewil, ew ixtiyar bi min yekî ku kifşkirina wî qet ne gengaz be xwiya kiribû, bi min wisa dihat ku tevî koka xwe bi gewda xwe jî li hundir nixumandîbû. Belki ji bi saya yadigara ku min bi tesadufî ji goristana avê xilas kiribû, bibûya sedemên têkiliyên xurt, bi vê sedemê belki ixtiyar xezina xwe ya nixumandî bi min re par ve bikira… Min çi hebe sirr û razên xwe eşkere gotibû, li gor wî ev bi tena serê xwe hewceyê pesnandine bû, ji xwe vê yekê ji bi hevoka “Mirovê xas ew e ku tiştekî xwe yê veşartî nîn e.” li hev anibû
Lê divê zêde bikim ku evê di diruvê derwêşekî de ne tu bixwe yî. Sûretê xwe divê li devereke din bigeri, lewra her dar li ser koka xwe şîn dibe. Tu aide ax û hewayê wê Konstantiniyeyê ku te gihandiye van rojan î. Koka te bi axa ilmê ve girêdahî ye, gewda te bes li wê axê dikare pel û şax bide..”
Li ser vê min jî bi pirsekê lê vegerand,“Piştî ewqas nirxandinên li ser min, cenabê we rewşa xwe dê çawa rave bike, sedema koçkirina ji xaka bav û kalan çiye gelo, mirov bi çi sedemi xwe ji welatê xwe sirgun dike, ev ji cureyek munzewîtî nahête hesibandin?”
“Nexwe tu wisa difikirî!”
Di rewşa wî cenabî de tiştek eşkere xwe dabû der; li ser pirsa min xetên wî yên ku bi rihên wî yên sipi hatibû nixumandin ber bi qelsbûnê ve diçûn, qermiçokên eniya wî kûr bûn û çavên wî yê piçuçik mabûn, piçek din bi korta xwe ve vekişîbûn.
“Nizanim, ji min re piçek xerîb hat.”
“Nexwe li te xerîb hat, nexwe wisa?” Got, serê xwe kil kir, ji çaya xwe qurtek vexwar, piştre wekî her car kêlekên devê xwe bi destmala xwe malişt û di nav xuşûyeki de

gotina xwe domand. "Welatê min, Îran, hey Îran! Welatê min ha! Welatê ku koçerê Tirkmanan li seri govendê digirin, Îsmaîlê ku wekî mirata bavê xwe li ser rûdinê û ê wekî din. Ma hêja berê du sala hûnkarê we Sultan Selim Xan, ne ketiyê de, heta Tebrizê neda du şah û li serayên İsmail çi hebe li ser navê nirxên tarixa Îranê dest danani serî, çiqas berhemên binirx hebe talan nekir û bi xwe re nebir seraya xwe. İran, ax, bê xwediyo, bê keso! Îrana ji hezar mêrî bî, ki dikare bêje êdî welatê min e, ki dikare bêje welatê Îraniyan e? Îran, Persiyaya mezin…"

Ji gotinên wî min fêm dikir ku, barkirina xwe dispêrt vê sedemê, yan jî, ji bo rûhê xwe aş bike ji xwe re sedeman icad dikir. Wisa dixwiya ku birînên Soxrewerdiyê kal di kûr de bûn, ne ji Qizilbaştiyê lê ji Sasanîtiyê ji Persîtiyê dem lêdixist. Li gor wî netewa wî ber bi rêya şaş ve çûbû, bi rêya Ehrimenê ketibû, lewma Xwedayê Bozorg Hirmiz naleta xwe li ser wan barandibû, ji ber vê naletê Îran careke din qet tevahiya xwe, yekitiya xwe bi dest nedixist, dê her wisa perçe perçe di bin desthilatdariya biyaniyan de bimaya.

"Darayê çavê xwe bi desthilatdariya Ariyan destê xwe de berhev bike sor kiribû, ji xwe re li fersenda digeriya ku rahibên Maguyan ji hole rake…Û gava bi awayeki vê fersendê bidest xist, dest bi qira Maguyan kir, hem Dara û hem ji Xserkesê xelefê wî felaketên mezin bi ser Maguyan ve anîn, koka Zerdeştiyan qelandin û naleta Hirmiz ji wê çaxê ve destpêkir, pêşî Îskenderê Zilqernayn şande ser wan, Darayê dawî ku ji koka Exemenîşan dihat ji ber wî reviya heta Hindistanê, lê dîsa jî xwe xilas nekir û ji aliyê mihafizên xwe yên teybet ve hate kuştin. Milkê Îran li bin lingê Xwedênenasan de mabû, di bin lingan de… Lê çi dijraberiyeke xedar e ku Îskenderê Xwedênenas ji Dara û nifşên wî bêtir xwedi li nirx û çand û ola Îraniyan derket. Zerdeştiyan û rahibên wan xiste bin himaya xwe, wan bi eleqeyeki mezin peşwazî kir. Ev çi teceliyeki xerib bû. Piştre çend sed sal di nav de borî, Îranî vê carê jî di bin senceqa Sasaniyan de civiyan, careki din yekîtiya xwe danin û li welatê xwe, li ser erdên xwe bûn desthilatdar û wan rojên bi ihtîşam careki din bi dest xistin û şaristaniya xwe ya qedîm hêdî hêdî ji nû ve vejandin. Ev teybetiyeke Ariyan bû, heyameke wisa vebûbû ku çavan diqemişand û çiqas demeke dirêj di nav de derbas bûbû jî dîsa bi tu awayî hêrsa Hirmiz aş nebûbû, Xwedayê Bozorg naleta xwe ji ser wan venedikişand, vê carê bobelata xwe ji hêla başur ji çolê şand. Misilmanên Ereb welatê Îraniyan dagir kir û Îran bû wîlayeteki biyaniyan, piştre desthilatdariya Tirkan destpê kir û bi Mislimantiyê re, Îran hêdî hêdî çi nirxên xwe yên xwe kiribe Îran hebe, bi tevahî destê Mislimanan de winda dikir. Ereban di bin kisweyên Mislimantiyê de gelê Ariyan ji nasnameyên xwe dûr dixist û wan ber bi koletiyê ve diajot, bindestî û koletî, para Ariyan bes ev bû êdî."

Gava ev peyv ji devê wî derdiketin tinginiyekî lerzok dengê wî de xwe dabû der, ji bo gewriya xwe piçek şil bike, ji piyala ber xwe qurtek bir devê xwe. Bi rastî ev helwesta wî, ez gelek matmayî hiştim, lewra bi min yeki wek xwedifezilet û zanyar xwiya kiribû, lê ev vegotinên wî, tarixa Îranê û hilweşîn û rûxînên wî bi naleta Hirmiz ve girê dida, xwe bi batileke wisa ve digirt, tiştekî gelek seyr bû, bi vê helwesta xwe ez hêvîşikestî kiribûm. Lê di vê esnayê de dibe ku bi tesadifeki be li min nihêrt, dibê qey tiştê di mêjiyê min de derbas dibûn ji çavê min xwendibû, "Wisa dixwiye tu ji dilê xwe derbas diki ku, ev zat teqez ne Misilmane, na te bi vê şermezar nakim, çira, piştî vê axaftina min ki bûya dê wisa bifikiriya, ji xwe kî çi difikire jî ne

xema min e. Belê, em li ku mabûn, Mislimantî min digot, Mislimantî ji bo Îraniyên bi çand û baweriyên xwe yên cuda çavkaniyê êşên mezin bû. Lewma Parsiyên bi baweriyên xwe ve hişk girêdayibûn, biryar dan ku ji ber zilma Misilmanan koçî Hindistanê bikin. Lê divê vê jî teslîm bikim ku Mislimantiyê ku ji aliyeki Arîtiyê ji hundir dikurisand, ji aliyê din ve jî ji bo welatparêzê Îraniyan bûbû şaxeke xwe pê girtine!”
Wê demê bi min wisa hatibû ku wê li hember min ew Êzidiyê ji Hindistanê ba Parsiyan dihat bû. Tiştê ez matmayî hiştibûm ew bû ku çawa Mislimanti û Zerdeştiyê wisa bi rehetî li hev diani.
“Min fêm nekir, çawa yani, qet mumkin e ku baweriyek xwe bi anasirên dijraberî xwe bide jiyandin.”
Wekî ku ji van gotinên min hêvîşikestî bûbe, li min nihêrt, “Yani tu difikiri ku” got, “Zerdeştî bi pergalên xwe ji Mislimantiye pir cuda ye?”
“Li ser Zerdeştiyê fikreki min ê misoger hebûyana belê min dikaribû tiştên gelek cuda ber bi çav bianiya.”
“Vêga ez ji te re bêjim Xwedayê ku tu baweriya xwe pê tînî, Hirmiz bi xwe ye…”
“Tobe, haşa!”
Bişirenek ji rûyê wî derbas bû, “Heke te Zerdeştî baş nas bikira, ev pirs ê li te jî pêkenokî bihata.”
“Kerem bikin nexwe, ez li we guhdar im.”
“Ji te re wisa rave bikim; ji ber kitêba pîroz a Mislimantiyê giredayiyê Tewratê û Tewrat bixwe jî giredayiyê Zend Avestayê bû lewma Mislimantî ji Îraniyan re şêrîn xwiya kir.”
Ji matmayinê devê min ji hev bûbû, “Lê ev, ev çawa dibe ma qey we negotibû Zerdeşt piştî Hazreti Musa hatiye, ji ber vê ji be, tiştekî wisa çawa pêkan e?”
“Ax, tu hêj çiqas ciwani, hêj çiqas tişt heye ku hîn bibi, bes ez vê ji te re bêjim, ew lefzên ku Cihû bi pêxemberê xwe ve girê didin, Musa yekî ji wana jî nizanibû.”
Bi van gotinan yekser hejiyam, tiştê digot baweriya min ji binîve hildiweşand, dikir ku ji xwe û ji baweriya xwe bikevim şikê, “Ça, çawa, yani…”
“Ji te re bejim çawa; li ser şerê Hirmiz û Ehrimen, yani şerê abadîn a qencîtî û xirabî… Û tu bixwazi Hirmiz wekî Xwedê û Ehrimen ji wekî Şeytên bisêwirîne.”
“Bi rastî jî ev tiştên ku hûn dibejin gelek balkêş in.”
“Ku tu destûr bidî ezê dewam bikim!”
“Belê çawa…”
“Zerdeştî xwe dispêre baweriya du hêzên serdest ku têgehên dijraber pêk anine û bûnewerên di xwezayê de cîh digirin wekî qenc û xirab bi du beşî ve veqetandine, dinyaya ku heta hetayiyê namîne de dawiya dawî ê xirab têk biçe û piştî mirinê careki din jiyîn çebibe. Di esasê xwe de ev şerê di navbera dijraberan de diqewime bi xwe re kemilînê ji tîne û tekamula gerdunê ji vê şerê pêk tê. Tu vêga bi vê ji nizanî…”
“Bi çi?”
“Bi ezimandina Heraklietosê, bê Dara wê çawa dawetî seraya xwe kiriye û çawa wisa hay ji şerên bêdawî ya dijraberên hev bûye û bi vê awayî ji qewimînên di nava qenc u şer…”
Piştî bi minakên ji Avestayê gatha û yasnayan berdewamî da we’za xwe, bi qasi ku bîra min tê yasnayeki li ser min pir tesira xwe çebibû, wisa neqil kiribû.

"Her du rûh di serî de cêwî bûn
Di xewneki de wehiy bû
Di xewnê de, di axaftinê de û di kirinê de
Qenc û xirab
Ahengek hebû di neqeba wan de
Ehmeqi û bê aqiltî tunebû
Du rûh laqayî hev hatin û
Jiyîn û mirinê bexşandin
Û şûn de
Xirabî vegeriya derewî."

Bi van peyvan careke din Êzidiyê Cebel Sincariyê li Bedlise rastî wî bûbûm, hate bîra min. Bi van re, tiştê ku wî ji min re negotibû tev di mêjiyê min de li hev dihatin. Bi vî awayî min jê re qala wê rasthatinê û piştre ditina wê xewnê kir."
Bi beşişineki li rûyê min nihêrt, "Wê çaxê" got, "Tu qala sedema livirbûyina xwe, qala tiştê ku rasthatina me miqedder kiriye dikî. Di esasê xwe de tiştek bêjim ji te re, ji dema ku tu ji Konstantiniyeyê derketi û ji wê de, gav bi gav ber bi vir ve meşiyayî. Ev eşkere ye. Wisa dixwiye ku, ew kesê ku tu li Bedlîsê laqayi wî bûyî, Êzîdiyekî ji miridên Şêx Adi Bin Misafir e, ji Êzidiyên, xwe li Şingala Cebel Sincarê sipartine. Ji wan we ye ku bi Zerdeştiyan re giredahî yê heman baweriyê ne, ji heman çavkaniye zêne. Tu wisa zen diki ku li hember te pir ketum tevgeriyaye, ez bi xwe berevaji vê difikirim, lewra ji bo ku li Mislimanan ewle nebin, sedemên wan ên pir derbasdar hene. Tenê li xwe ewle ne."
"Çi sedem in ev gelo?"
"Ew şeytanê ku ji ali Mislimantiyê ve hatiye naletkirin, ji hêla wan ve tê pîrozkirin û bi navê Melekê Tawis tê rûmetkirin."
"Belê min bihistibû ku ji bo wan şeytanperest dihat gotin."
"Nexwe, tu fêm diki ku çima li hember Misilmana wisa bi tevdir û wisa ketum tevdigerin."

Soxrewerdiyê kal li dora heftê saliyên xwe de, weke demên berê Îrana ronî xwe bi ilmê mijul dikir û jiyana xwe li ber xebata "teoriya ronahiyê"dida. Di vê xebata xwe de umrê xwe wek Ariyekî derbas dikir, tevî vê bi sedeqetekê li koka xwe hatibû girêdan, li qedera Îranê re diqehirî, feyza xwe ji alim û zanayên Îrana qedîm gihandibû distand, ji aliyê din ve bi baweriya welatê xwe ya qedîm, di destê desthilatdarên biyaniyan de ber bi tunebûnê ve diçû xemgin bû, ji ber vê xwe ji welatê xwe sirgun kiribû, bi ya min lewma ew jî niv munzewiyek dihate hesibandin. Ji ber vê bi keça xwe ya tekane re terka welat kiribû û hatibû Amedê, bi pêşniyara hevaleki xwe li vê derê bi cîh bûbû. Soxrewerdiyê kal li vir bi hewladaneke awarte bi neynûken xwe vê bihuşta kesk ava kiribû. Bi salan e ku li ser berhema xwe ya bi tevahiya xwe diwanzde cild bigirta dixebitî, bê çawa mirov ji karekî wisa dûr û dirêj nakerixe bi rastî aqilê min nedistand. Gava yeki ji xwe ciwantir re zewicî bû ji xwe têra xwe kemili bû, lê bextreşiya wî ew bu ku zarokek ji wan re çenedibû, ji xwe piştî umreki dûr gava Xwedê Gulbanûyê dide wan, dayika reben bi zayînê re jiyana xwe ji dest dide û yara xwe ya tekane Gulbanûyê sêwî dihêle. Piştî ku li vê derê bi cih


**Îlhamî Sîdar**
**TEHMA XWELIYÊ**
**Roman**

dibin, Selman Efendiyê şêniyê van deran, wekî kehya ku li bexçeyên wan binihêre, can û malên wan û namûsa wan biparêze digirin ba xwe. Herçî hînê ezimandina derwêşên wekî min bûbûn, car carnan kesên ku dixwestin ji xêrxwaziya wan sûde bigirin jî, ji deriyê wan kêm nedibûn, heke ji bo min pirsgirêkek tune bûya dixwest min ji çend rojek li ba xwe mêvan bike, bi rastî, ji ber Gulbanûyê min jî pir naziyan nekir û vê peşniyara wî bi kêfxweşî qebûl kir.

Bê guman fikirîna jiyaneke ligel Gulbanûyê ji bo min bes xewneke şêrîn bû. Lê çend rojên peşîn em ewqas zêde pêrgî hev hatin û ewqas zêde çavê me li hev ket û germahiya wê heta hinava min sirayet kir… Li qunceki bihuştîn a cihana helbestane de, bi helbestan rabûn û runiştin… Her kêlî ji hestên şehewî safî buyî, bi dileki saf bêtir pê ve dihatim girêdan, lê vê carê hay ji xwe û ji hestên xwe hebûm, lewma gelek bi hişmendî tevdigeriyam. Peyvên ji devên wê derdiketin, di kûrahiya dilê min de neqiş neqiş dihatin hûnandin, min wisa hîs dikir ku roj bi roj dilê min birinên xwe bi xwe bi xwe dicebirine, wekî ku ji bo evîneke nu bixwaze û pê bi fire bikeve, lê ji aliyê din, ji xeyalşikestineke din ditirsiyam. Gulbanû ne tenê perisureteke di textê dilê min de cîh girtibû bû, tevî bi zerafeta xwe bi diltenikiya xwe û bi rûhê xwe ya dewlemend jî, giringiyekî xwe ya teybet hebû, wekî ku perçeyê min ê ku ez lê digeriyabûm bû û ev bawerî her diçû bi min re xurttir dibû. Çendîn ku awirê me li hev diketin, min fêm dikir ku wê jî bi hestên germ li min dinihêrt, lê tu caran qala hezkirinê, evînê ji mêjiyê yekî ji me jî derbas nedibû, herçî ez bûm ji ber çewtiyeke bi dawî hatina vê efsunê ditirsiyam, carna wê ji Hafiz xezelan dixwend, min jî bi helbestên wî yên li ser evînê bersiv didayê, herî zêde jî em bi çarînên Heyam li hev dihatin, cara dawî wê bi dengê xwe yê şêrin ev çarîn ji min re gotibû:

Ji umrê me rojek din hat û çû
Wek ava çeman, bayê deştan
Du roj heye ku çi heye çi tuneye
Roja ku nehat yek û roja çû didu

Li hember vê ez jî bi çarinekê bersivdar lê vegeriyabûm.

Divê Mecnûn bibe ê Leyla bixwaze
Ji xwe û ji dinyayê bibore
Gava hate bankirin bo sifra hezkiriyan
Kor im ez kerr û lal im bibêje,

Hestên min gava bêtir sotîner bû û xetereyeki evînî hundirand, êdî ji bo min dema xatirxwestinê hatibû, heke tiştek di nav me de biqewimiya û dawî lê nehatiba û encam êş û jan bibûya… Na ev qet nedibû! Li ser vê min biryar da ku ya herî baş demek berê ji vê de rê veqetim û ber bi Amedê ve bi rê bikevim, lewra bi rastî jî nêzikahiya di nav me de xetereyek cidî dihundirand. Soxreverdiyê kal gelek li ber min dida û digot tu neçe, qet nebe çend hefteyên din bimîne, lê min xwe nedida ber vê, malbateke min heye min digot, ev e bi mehan in ku li bendî min in. Lê ya rast ew bû ku, ez ditirsiyam zirarek bigihinime wan, piştî Zelixayê, min xwe yekî wek

naletkirî dihesiband û Gulbanû dilê min mişt bi evîne dagir kiribû, min nedixwest ji naleta min par werbigire.

Soxrewerdiyê kal israr dikir, digot qet nebe çend rojek din bimine, nizanim ji bo çi wisa israr dikir, gelo bi rasti jî xwîna wî zehf ji min re keliyabû, yan jî dixwest ku bi yekî jê fem dike re fikrên xwe parve bike, nizanim lê ev yek teqez dihat xwiyakirin ku ji sihbeta min pir hez dikir. Belê sihbeta me carna heta berbanga şefeqê didomiya û ya min jê fêm kiribû mebesta jiyana xwe bi xebata xwe ya “teoriya ronahiye” ve girê dabû, ji vê pê ve giringiya tu tiştî tunebû, ji xwe ê çawa bibûya? Umrê xwe li ser vê xebatê xerc kiribû, belê ji xeyni vê jî nêzî sî berhemên wî hebûn lê ev bi naveroka xwe, bi teşeya xwe encama tevan bû; berhevbûna hemû berhemên wî û hemi jiyana wî bi xwe bû, bi salane ku her tiştî xwe di vê rêyê de dabû, evê bibûya berhema wî ya sereke, kurtasiya jiyana wî bi xwe.
Tiştek hebû ku çiqas inkar bike jî bi girêdayina wî ya ronahiyê de bandora Zerdeştiyê eşkere xwe dida der.
“Tu teyisîn” digot “Bi teyisîna roj hiltê re xwe dide der nikare bikeve qayişê. Di esasê xwe de zuhura hebûnê bixwe ye ev, kifşkirina bûneweriyê û têgihîna hişmendiyê ancax bi vê pêkan e. Çi çax ku roj li ser rûhan niquti, şefeqa rûh vebû, ev destnîşana fetisîna tariyê ye, dema wasilbûna bûneweran bi xwe ye û gihandina cewhera xwe ya bingehîn e. Danizilina nûrên li ser rûhên kesên di inziwayê de ne, mizgîna wasilbûna bi xwe bi xwe ye, li xwe vegerin e, xwe kifşkirin e, li cewhera xwe venişîn e. Ê li kakilê xwe hay dibe, digihije hişmendiya cewhera xwe, li hebuna xwe diwerqile. Ev hişmendî bixwe bi rûh re hemhal e, bi teybetiyên kesayetî û bi teybetiyên heyînî re hemhal e. Jiyan tê wateya nûrê, tê wateya zuhurê, jiyan gihiştina hişmendiya cewherên xwe ye. Kakilê xwedi mitleq heqiqetê, sedema tekane cewhera hebûna me ye. Teyisîna xwe di şefeqa rûh de dide der, perdeya li ser zanistiyê vediçirine. Îhtişama vê şefeqê, me ber bi teyisîna ewilîn ve dehf dide. Heyîna hebûnê, agir û qedera jiyanê rêkûpêk dike û wana bi hev re hevaheng dike. Te divê ka ewil li xwe binihêre; tu ji xwe û ji hebûna xwe dûr, ber bi xurbeteki nediyar ve ketiyî, vêga li vê derê dema vegera welêt hatiye, lê çawa? Te vê bi pakbûna çileyeki bidest xist gelo, yan bi tefkîre? Pakbûn, ji xwe bi tena serê xwe kiryareke pîroz e, ki çi dikare bêje? Lê divê tu qet ji bîr neki tevî paqijiya hundir, zanistî ji bingeheke sereke ye, divê bi çi awayî be mirov zanistî bidest bixe, ji xwe pakbûn bi tena serê xwe bi kêrî tu tiştî nahêt? Lewra beyî gihandina zanistiyê, destxistina tecrubeyên rûhî û paqijbûna hûndirîn, xetereya şemitina delaletê jî bi xwe re tîne. Di têgihiştina manewî û rûhî ya bilind î heqiqetê de zanistî bi tesewifê re yek e. Tu çi bextewari ku te rêya heqiqetê bi hişmendî dabû ber xwe û di encamê de gihaşti rêya zanistiyê û safbûnê. Qet nebe te çirûskên wan bi dest xistiye û hêvî dikim ku kêmasiyên mane ji emê li vir bi hevre temam bikin.
Soxrewerdi bi kurtasî, hebûna şefeqa rûhê û tarixeke ku hişmendî pê teşe giritiye angaşt dikir. Pêşditinên wî bi awayeki, xwe li bingehên xurt dispart, lewra pûçkirina wan dijwar dixwiya û ji bo wekî minê ji zanistiyê re tî, pir vekêşîner dixwiya. Nema ku gotinên wî yên derbarê dema hatina vegera min a welêt ez lal kiribûm. Wekî ku nexşeyên rûhê min eşkere xwendibe, li ser van qewimînan ez bi rehetî dikarim bêjim

ku, bi nêrineki xurt li gerdûnê û li wateya jiyanê gihabû, lê îro hêja jî difikirim ku nêrinên wî li dijî baweriya Mislimantiye bû.
Hêdî hêdî pê dihisiyam ku êdî hatibûm dawiya rêya xwe; maceraya rûhê min ber bi ronahî bûnê ve diçû; perdeya reş a li ser nediyariyan, hinek jî bi şewqa kalê ronî veçiriyabû. Kalê ronî dahatûyê min bi rengeki zelal li ber min raxisti bû. Vêga bi hêsanî bi sedemên, ez ber bi rêyekê lêgerinê ve xistibûm têdigihiştim. Di esasê xwe de min baş fêm dikir ku dema tehmijandina xweliyê hatibû, agirê ku min veguhestibû mistek xweliyê, vê rastiyê bi min dabû fêmkirin. Erê, di nav ecêbek pizotên agirê de meşiyabûm û dawiya dawî li vê rastiyê hay bûbûm. Şitleki azade çawa bi bêhejmar derbên bayê re rûbirû dimine û bi vê awayê fêrî berxwedana xwe dibe, hêza berxwedanê bi dest dixe û li dawiyê bi kemilîna vê têkoşinê, ji ali bayê ve dawî bi gazinên xwe tîne, min jî wisa bi hêza ku bi xweliyê xwe dest xistibû li ber xwe dida û xwe ji  ba û bahozên ji her ali ve diweziyan diparast. Pijiyabûm, erê ev heqiqetekî ripîrût li ber çavan bû; ez êdî ne yê berê bûm.
Baş tegihiştibûm ku, em çiqas mezin dibûn, cihan jî ewqas biçûk û kirêt dibû. Li cihaneke wisa de bes rêya zanistiyê jiyana mirovan watedar dikir. Êdî kesê ku li pey wateyê ketibû, bixwesta perdeya tariyê li ser çavê xwe yê hundirîn rake û xwe kifş bike, dê teqez bi nependiya gerdûnê bigihişta û êdî ji bo wî şûn de vegerin gengaz nebûya.

Gihiştina bê wateyiya şîngirtina pêşciwantiyekî, ji vê şûn de karê min hêsantir bikira. Ê dişibîne hev li hev vedikişîn. Ez wekî navê xwe serwext bûm ku ez û Gulbanû, me anasirên ku xwe vedikişinine hev dihundirand, sedemên vê yekê tim li min eşkere bûbû. Ji aliyeki ve ji demboriyên min ên Konstantiniyeyê û Soxrewerdiyê kal di têkiliya me de wekî astengiyeki derketaya pêşiya me û li ber wusleta me wekî mişkileyeki rawestiyaya. Lê baweriya min bi vê yekê baş hebû ku, li ser vê cihanê tu astengiyek tunebû ku dilên lihevkirî ser de newe. Lê ji alî din, pêkhatina van peşdîtinan girêdahî yê Gulbanûyê bû, heke hestên min bêbersiv bûyana her tişt ê ji ber xwe ve hilbewişiyaya. Belê dibû ku ew jî ji bo min hestên germ his dikir; lê çi be jî, ev yek heta ji devê wê nehata bihîstin bi goşt û hestî nedibû. Diviya êdî dawî li bendewariyan bihata û evîndarên hestên li hember hev dijiyan bihata diyar kirin. Lê mixabin ez bi tu awayî li xwe ewle nedibûm, min wê wêrektiyê nîşan nedida. Lê Xwedê kir ku her tişt bi xwe bi xwe li hev hat. Dîsa sibeyeke wekî roja hatina min, li kûrahiyên bexçê de rastî Gulbanuyê hatibûm li bin dareki serwiyê wekî xwe biveşêre daniştibû, digiriya, bê pêjn û bê deng… Hêdîka nezikê wê bûm, çavê me bi hev ket, rûyê wê sor bû wekî tawanbareki stûyê xwe xwar kir, ew çax çi bi min hat nizanim … Ji nişka ve min bi serên pêçiyen xwe li erçena wê peland, bi vê tevgera min a nepayî ji nişka ve bizdiya, lê tevî li ber vê tevgera min bê bertek ma, çirûskên di çavê wê de dibişkuviyan, dilşabûna wê bi têra xwe diyar dikir. Ev jî baş bi min dabû fêmkirin ku li benda dawîanina min bû.
Em çiqas bixwazin ji bo biryardayînan hûr bihêrin û hişk birêsin û çiqas meyldarê hezar bifikirin û yek bikin ji bin, dîsa jî carna demên wisa tên ku ji bo ponijîne tu fersend nahêlin. Tiştê ku me dilivîne, dehfdaneke hundirîn e. Ez jî di demeke wisa de neziki wê bûm û tiştê di dilê min de derbas dibûn, ji devê min der diçûn.

“Ey wekî minê dilketi û dilşewat. Hey çiqlên gulên nazik a dilan geş dike. Hêstirên ji çavan dibare û sotina dilan ji bo çi ye gelo?”
“Agirê ku min disote te çi hay jê ye!”
“Heke agirê ku min disote gihiştibe te jî, divê em bi hev re rondikê çavan bibarînin.”
“Sebr û sebat nema bi min re, agirê di canê min de wekî çiyayekî…”
“Lê ez, eza rewşa dile xwe wekî Ferhedê bi çiyê re diaxivî; li mala xeman de dilê minê bi keder disoje, rondikên xwe tevli axa reş dikim û bi finda şevê re diaxivîm. Va tu jî, li bin vê dara biyê hêstirê çavên xwe tevli axê dikî û bi robarê re diaxivî?”
“Ê ku raza dilê min dizane, têbigihişta ku bi çi re û bi ki re diaxivîm, tê gunehê xwe bi min bianiya.”
“Bi vê tenagihêjim, lê te divê ez raza dilê xwe vekim.”
“Bi rastî, bi rastî jî tu vê dikari biki?”
“Belê çawa!”
“Nexwe?”
“Mirin.”
“Mirin?”
“Belê mirin, bi tihnayiya lêvên te mirin…”
“Ya Rebbi, ev tişte guhê min dibihîzin rast e, ev ne xewnek be?”
“Ê ku guhê te dibihîzin heqiqet bi xwe ne, heqiqeta min û heqiqeta te, bi vê baş bizanibe; heqiqet bes ev e, jiyana bêyî te dijîm her dema wê derd û xem e. Ji hesreta te şev û roj bi ax û fixanan dinalim. Hezkirina te di hinava min de agireki wisa gur vêxist ku… Ji ber evîna te min mêjiyê xwe helak kir. Bi dema dîtina te, çavên te ji min hêviya caneki kiribû, lê min tevî canê xwe aqilê xwe û dilê xwe jî da te. Ev canê min, dilê min û rûhê min tevde yê te ne.
“Ax ji bextewariyê di vê keliye de dikarim bimirim, ez çi bêjim, te ez ji bextewariyê ji dil birim, nexwe ewqas rondikên ji çavan bariyan…”
“Na na, her dilopên ku ji çavan niqutiye, di teşiya xwe de evîna me rêsiye, bûye robarek û di neqeba dilê me de herikiye.”
“Wa min hembeza xwe ji bo te vekiriye, were min bialine, were min hembêz bike, were min hişk hembêz bike!..